Arşîva Bîra Kurdan: Ji Christiane More gotarên "Ronesansa têkoşîna çekdarî" û "Li bin siya pevçûna Îraq û Îranê" (Cotmeh-1986) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Tîrmeh 2011 - Hejmar 20 www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

**Serge Halimi**
Gelo qedera gelên ewropî îro li parlamentoyan diyar dibe, an li bankeyên navendî, Komîsyona Ewropayê û IMFyê? Krîza deynan ya hin welatên ewropî çima kete werçerxeke nedîtî?
▶ R. 6

**Farhan Jahanpour**
Serokkomarê Îranê Mahmûd Ehmedînecad çima bi rêberê şoreşê Xameney û melayan re hate hember hev? Lihevnekirina van hêzan tesîrek çawa li ser pergala teokratîk ya îranî dike?
▶ R. 10

**Yuan, Yuhua, Jun, Liping**
Li Çînê geşedana aborî bi lez e û îstîqrara siyasî pêk hatiye; lê nakokîyên dijwar ên civakî jî hene. Gelo tengezarîyên vî welatî dê rê li ber teşqeleyên mezin ên civakî vekin?
▶ R. 14

**Alain Vicky**
Serokdewletê Ûgandayê Yowerî Mûsevenî li hember nerazîbûnên gel serî li zext û zorê dide. Gelo rejîma ûgandî dê bikaribe bi tepisandina gel û kontrola medyayê xwe biparêze?
▶ R. 16

**Mona Chollet**
Cerahîya estetîk berê tenê karê dewlemendan bû û pratîsyenên pêşî "pozê cihû an jî îrlandî" dixwestin… Gelo ev sektora ku krîzên aborî lê tesîr nake çima her ku diçe xurttir dibe?
▶ R. 22

## PIŞTÎ REFERANDÛMA 12Ê ÎLONÊ

# Encamên hilbijartinên 12ê hezîranê

ISMAIL BEŞIKÇI

Encamên hilbijartinên 12ê hezîrana 2011ê divê digel encamên referandûma 12ê îlonê werin nirxandin. Di wê pakêta guhertinan de, ku di referandûmê de hatibû pêşnîyar kirin, madeyeke gelek girîng hebû ku diyar dikir ka *Tirkiye* dê ji alîyê kê ve were bi rê ve birin. Gelo parlamentoyek, ku ji alîyê gel ve hatiye hilbijartin, û hikûmetek, ku ji parlamentoyê raya pêbawerîyê wergirtiye, dê welêt bi rê ve bibin yan jî burokratên bilind ên leşkerî û sivîl? Anku bi gotineke din, gelo ên hilbijartî yan ên tayînkirî dê Tirkiyeyê bi rê ve bibin? Di referandûmê de ji bo vê pirsê bersiveke gelek girîng hat dayîn. Piştî ku pêşnîyara hikûmetê hat qebûl kirin, êdî dîyar bû ku parlamentoyek, ku di encama hilbijartinan de pêk hatiye û hikûmet dê di birêvebirina *Tirkiye*yê de hewlê bidin ku diyarker û pêşeng bibin. Guhertinên di avabûna *Lijneya Bala ya Dadger û Dozgeran*; û ya *Dadgeha Destûra Bingehîn* dihatin vê wateyê.

Heta roja îro, anku ji 1945ê û vir ve, partîyên siyasî her tim hebûn. Hilbijartin jî dihatin li dar xistin. Lê belê, ji ber rewşa diyarker û pêşeng a tayînkirîyan, ne partîyên siyasî ne parlamento ne jî hikûmetê dikaribûn giranîya xwe deynin birêvebirina Tirkiyeyê. Di warê pirsên sereke de her tim dîtin û ramanên tayînkirîyan dihatin esas girtin. Dîrektîf bi riya *Lijneya Ewlekarîya Neteweyî* ji hikûmet û parlamentoyê re dihat dayîn. Daxwazên leşker û tayînkirîyan jî ji alîyê serokkomar ve ji hikûmetê re dihatin ragihandin. Dezgehên dadî, nemaze jî dadgehên bilind û zanîngehan bi xurtî piştgirîya vê îdeolojîya siyasî ya mîlîter dikir. Him zanîngeh û him jî dadgehên bilind di nav hewldaneke tund de bûn da ku vê îdeolojîya mîlîter di nav jîyana civakî û siyasî de bikin serdest. Ev yek dikare bi awayekî kurt wekî wesayeta leşkerî were bi nav kirin. Pêşniyara referandûmê ya *AKP* û hikûmetê û qebûlkirina van pêşnîyaran a di referandûmê de jî dikare wekî qelskirina wesayeta leşkerî were bi nav kirin. Operasyon û dozên li dij *Ergenekonê*, divê wekî hewldanên hikûmetê ji bo qelskirina wesayeta leşkerî werin têgihîştin. Aşkere ye ku di vî warî de hewldaneke xurt heye. Destgîrkirin, pirsîyar kirin, hefskirina wan generalan, ku weha dihatin dîtin ku kes nikare dest tê bide yan bigihîje wan, jî bûyerên girîng in. Ev operasyon, lêpirsîn û doz weha xuya dikin ku dê bi biryardarî werin berdewam kirin. Ev yek pêvajoyek e ku demokrasîya *Tirkiye*yê kûrtir û berbelavtir dike.

### Di van hilbijartinan de kesên ku bi demokrasî û hilbijartinan bawer dikin, bi ser ketin

Hilbijartinên 12ê hezîranê di atmosfereke weha de pêk hatin. Di van hilbijartinan de kesên ku bi demokrasî û hilbijartinan bawer dikin, bi ser ketin. Aşkere ye ku ev hilbijartin dê demokrasîya Tirkiyeyê kûrtir û berbelavtir bike. Ev ji bo demokrasîyê bidestxistineke girîng e ku *AKP*yê di hilbijartinan de dora 50 dersedî deng girtin. Beşdarbûna bilind a di hilbijartinan de, ku gihîşt 88 dersedê, divê di vê çaroveyê de were nirxandin. Hin kesên ku pir bi demokrasîyê bawer nakin û niha di girtîgeha ***Sîlîvrî***yê de ne, ew jî beşdarî van hilbijartinan bûn. Hêjayî balkişandinê ye ku ew kesên ku di hilbijartinan de wekî namzetên serbixwe beşdar bûn *-mebest jê ne bloka kurdan e [LMdK]-*, çiqas hindik deng wergirtin. Heger van kesan bikaribûna ku darbeyeke leşkerî pêk bînin û werin ser îqtîdarê wan dê Tirkiye bi rê ve bibiraya. Lê belê diyar e ka di hilbijartinên demokratîk de çiqas deng werdigirin. Di vê pêvajoyê de helbet nakokîyeke mezin heye. Çareserîya vê nakokîyê dê zanyarîyên me yên sebaret bi civaka tirk, pergala siyasî ya tirk zêde bike. Hin ji van kesan ku ji ***CHP*** û ***MHP***yê tev li hilbijartinan bûn, wekî endamên parlamentoyê hatin

▶ R. 3

**Almanya: 4,50 €**
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK, **Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

## PARLAMENTOYA "NÛ", DESTÛRA "NÛ", KRÎZA "NÛ"

# Hilbijartinên li Tirkiyeyê û piştî wan

RIZA DINÇ



Di 12ê hezîranê de li Tirkiyeyê hilbijartinên parlamentoyê pêk hatin. Di hilbijartinan de, ku tê de 24 partîyên siyasî û namzetên serbixwe beşdar bûbûn, bi tenê 3 partîyên siyasî, anku AKP, CHP û MHP karîn bi ser benda hilbijartinê ya %10 deng bistînin û bikevin parlamentoyê. AKPya ku nêzîkî 50 derseda dengan wergirt 326 endam, CHPya ku 26 dersed wergirt 135 endam û MHPya ku 13 dersed wergirt 53 endam derxistin. BDPya ku ji ber benda bilind a hilbijartinan nedikarî wekî partî bikeve hilbijartinan, mîna hilbijartinên sala 2007ê, dîsa bi namzetên serbixwe ket hilbijartinan. BDPyê digel KADEP, HAKPAR û hin partîyên çepgir ên tirkan 'Hevgirtina Ked, Demokrasî û Azadîyê' ava kir û piranîya wan ji Kurdistanê 36 namzetên ku wan piştgirî dida hatin hilbijartin. Lê belê endametîya Hatip Dicle, ku ji Dîyarbekirê bi rêjeyeke bilind hatibû hilbijartin, piştî hilbijartinan ji alîyê Lijneya Bala ya Hilbijartinan (YSK) ve hat betal kirin û di şûna wî de namzeda AKPyê, ku nehatibû hilbijartin, bû endama parlamentoyê.

Dema ku li encamên hilbijartinan were nihêrtin tê dîtin ku AKPyê, ku di hilbijartinên 2002 û 2007ê de bi ferqeke aşkere bi ser ketibû, dengên xwe bi rêjeya 3,5 dersed zêde kirin û gihîşt encamekê, ku dikare wekî rekor were bi nav kirin. Lê belê AKPyê vê carê 15 endam (piştî ku endametîya Hatip Dicle hat betal kirin û di şûna wî de namzeda AKPyê hat hilbijartin 14) hindiktir derxistin. Bi vî awayî, AKPyê, ku piranîya hewce ji xwe re kiribû armanc da ku bikaribe destûrê, wekî ku soz dabû, bi tena serê xwe biguherîne, nekarî piranîya herî kêm a 330 jî derxe da ku bikaribe guhertina destûrê bibe referandûmê.

Herçend BDPya ku li jêr navê 'Hevgirtina Ked, Demokrasî û Azadîyê' ketibû hilbijartinan dengên xwe li gor hilbijartinên 2007ê bi tenê puanek bilind kir, li gor a berê 14 kursî zêdetir bi dest xistin û pozîsyona xwe xurttir kir. Di vê zêdebûnê de, him bilindbûna dengên li Kurdistanê û him jî diyarkirina namzeda û xebatên serkeftî yên hilbijartinê bandorker bûn. Bi vî awayî, li 15 bajarên sereke yên li Kurdistanê rêjeya dengên BDPyê li gor hilbijartinên berê bi qasî 10 puanan zêde bû û gihîşt %44ê. BDPya ku di hilbijartinên 2007ê de li Kurdistanê 20 wekîl derxistibûn, di 12ê hezîranê de ev hejmar gihand 31ê. Lê belê, AKPya ku di 2007ê de li heman bajaran %48ê dengan wergirtibû û 47 wekîl derxistibûn, herçend li seranserî Tirkiyeyê dengên xwe bi rêja 3,5 dersed bilind kirin jî, rêjeya wê ya li herêmê 5 puan ketin û bû %43. Hejmara wekîlên AKPyê jî daket 38ê (ku 10 ji wan ji Ruhayê hatin hilbijartin.) Bi vî awayî AKP ji bilî bajarên Qers, Mûş, Ruha û Dêrsimê li 11 bajarên din paş de çû û di nav wan de li 9 bajaran hejmara wekîlên wî daket. AKPyê her weha li 4 bajaran, ku lê dengên xwe zêde kirin, bi tenê li Ruhayê wekîlekî zêde derxist. Lê belê BDPya ku li wan 11 bajaran, ku lê dengên xwe zêde kirin, bi tenê li 8 bajaran hejmara wekîlên xwe zêde kirin. Rêjeya dengên DTPyê li Ixdir, Mûş, Dêrsim û Mûşê daket û wekîlekî, ku berê ji Dêrsimê derxistibû, ji dest da. Di encamê de BDPya ku berê bi tenê li 5 bajarên Kurdistanê ji AKPyê zêdetir deng bi dest xistibûn, di 2011ê de li 9 bajaran ket pêşîya AKPyê. Dengên BDPyê li 6 bajaran nêzîkî yan jî bi ser %50yê bûn. (1) Vê encamê, berîya her tiştî gotinên AKPyê yên 'Partîya yekemîn li herêmên kurdan û bi vî awayî nûnera kurdan', ku ji 2002ê û vir ve dihat dubare kirin, têk bir.

Di zêdebûna dengên namzedên serbixwe de, ku ji alîyê BDPyê ve dihatin piştgirî kirin, mirov dikare ji bandora sînordar a hevgirtina KADEP û HAKPARê jî behs bike. Herçend di destpêkê de ji ber hevkarîyê di nav HAKPARê hin nakokî rû dabûn jî HAKPARê, li hember rêxneyên Kemal Burkay ê Sekreterê Giştî yê kevin ê PSKyê, dîsa vegeriya nav hevgirtinê. Di heman demê de, ne mimkûn e mirov bibêje ku hevgirtina digel hin çepgirên tirk bandor kir ku ji hilbijêrên tirk deng werin stendin. Sê namzetên tirk, ku di nav Hevgirtinê de cih digirt, li Stenbol û Mêrsînê di esasê de bi dengên hilbijêrên kurd ketin parlamentoyê. Hetta, li Dêrsîmê, ku çepa tirk lê xwedî girseyê ye û yek ji partîyên endama Hevgirtinê di nav bajarên kurdan de bi tenê li Dêrsimê xwedî hêz e, piranîyeke berbiçav a kurdên elewî piştgirî da CHPyê.

Dema ku li rêjeyên BDPyê ya 12 hezîranê were nihêrtin, tê dîtin ku herçend li gor hilbijartinên 2007ê dengên xwe bilind

▶ R. 4

www.arsivakurdi.org

# Piştî hilbijartinên Tirkiyeyê yên encam ne surprîz

WENDY KRISTIANASEN

**15 ê hezîranê** Roja yekşemê li Tirkiyeyê tu surprîz nebûn. Wekî ku dihat guman kirin, *Partîya Dad û Geşedanê* (AKP) ya **Recep Tayyîp Erdoğan** 326 kursîyên parlamentoya 550 kursîyî bi dest xistin û bi awayekî serkeftî ji hilbijartinan derket. Ji destpêkirina pergala pir-partîyî ya li Tirkiyeyê ya sala 1946ê vir ve, AKP tenha partî ye ku sê serdemên li dû hev yekem dertê û rêjeya dengên xwe bilindtir dike, ku niha gihîştiye % 50yê. (1)

**Erdoğan** di hilbijartinan de *'piranîya super'* a ku wî dixwest, bi dest nexist. Heger bi dest xistiba, Erdoğan wê demê dikaribû, bêyî ku li parlamentoyê bişêwire, destûrekê çêbike û pergala serokatîyê ava bike. Wî, her weha tirk têmîn kiribûn ku partîya wî dê 'dilnizm' be û di reforma destûrî de hewlê bide ku digel partîyên siyasî û rêxistinên sîvîl lihevkirinekê ava bike.

Sedema bidestnexistina piranîya super, anku 330 kursîyan, ew bû ku nikaribûn pêşî li partîya rastgir *Partîya Tevgera Neteweperest (MHP)* bigirin ku bi ser benda % 10 keve. Her çend derbarê serokên vê partîyê de skandala seksê derket jî, MHPyê ji % 13ê dengan wergirt û di parlamentoyê de **54** kursî bi dest xistin. Her weha **36** namzetên serbixwe, ku hevgirtina kurdan piştgirî dida wan, hatin hilbijartin. (2)

Partîya ku herî zêde hêvîyên wê şkeştin partîya sekuler, *Partîya Gel a Komarperwer* ***(CHP)*** bû ku partîya damezrênerê Tirkiyeyê **Mustafa Kemal Atatürk** e, lê belê bi dehan sal in ku li derveyî hikûmetê ye. Vê partîyê di bin serokatîya **Kemal Kılıçdaroğlu** de xwe guherand. Kılıçdaroğlu di şûna serokê berê yê partîyê **Deniz Baykal** de, ku îtîbara xwe wenda kiribû, hatibû hilbijartin û hewl dida ku valahîya ku di siyaseta Tirkiyeyê de heye dagire ku tirkên çepgir ên sekuler ên tebeqeya naverast ji temsîlîyeteke bi îtîbar bêpar nemînin.

CHP di hilbijartinan de hejmara kursîyên xwe 23 heb zêde kir û gihand **135**an û bidestxistina ji % 26ê dengan partîya duyemîn derket. ***CHP***yê di kampanyaya hilbijartinê de soza bêhtir azadîyên takekesî û demokrasîyê dan û ji tirkên sekuler û herwekî din ji derveyî welêt piştgirî wergirt. Edîtorîya ***The Economist*** di 2ê hezîranê de weha nivisîbû: *"Baştirîn rê ji bo tirkan ku demokrasîyê pêş de bixin ew e ku li dij partîya desthilatdar deng bidin."* Di vir de 60 rojnamegerên zindanîkirî û rexne û dijberîyên din dihatin binxêz kirin, ku piranîya wan şikên li ser sûcên sebaret bi ewlekarîyê bûn. (Pergala Dadî ya Tirkiyeyê, ku têrê nake, niha bi dozên ***Ergenekon***ê ve aliqîye, ku mebesta van dozan ew bû ku komployeke ji bo xistina hikûmetê derxin holê.)

**Kılıçdaroğlu**, ku ji ber dilnizmîya wî, navê **Ganhdi** lê hatiye kirin, karmendekî mutewazi ye ku dikare fikar û ramanên tirkên asayî fam bike. Mebesta nêzîkbûna wî ya ***CHP***yê ew bû ku wê bike partîyeke sosyal demokrat a rastîn. Ew herweha partîyê ji kokên wê yên kemalîst û têkilîyên wê yên digel generalan dûr dixe da ku azadîyên takekesî pêş bixe û rewşa hindikahîyên dezavantajî yên wekî kurd û elewîyan baştir bike. **Kılıçdaroğlu** bixwe jî elewî ye û li başûrê rojhilata welêt jî kampanyayên hilbijartinê meşandin.

Lê dîsa jî ***CHP***, ku ji ber dîroka xwe ya nêzîk perçe bûye, hevgirtineke berfireh e, lê belê nikare alîgirên nû cezb bike. Her çend hin siyasetên baş û nûperwer ên wê hebin jî **Kılıçdaroğlu** nikaribû balkêşîya xwe firehtir bike û girseya partîya xwe memnûn bike. Di mijarên sereke de ***CHP*** weha xuya dike ku kêm zêde digel ***AKP***yê hevbîr e: Endametîya *Yekîtîya Ewropî (YE)*, pêşdeçûnên di warê meseleya kurdî de (Hikûmeta AKPyê di 2009ê de dest bi vekirineke berbiçav a kurd kir), vegerandina leşkeran ji bo baregehên wan (serkeftina mezin a AKPyê) û reformên destûra bingehîn.

**Kiliçdaroğlu** dibêje: *"Ewropa di rojeva me de xala yekemîn e. –ev yek veguherînek e ji siyaseta berê ya CHPyê– Îro pêvajo hema bêje xitimî ye lê belê, em werin qebûl kirin yan neyên qebûl kirin, em biryardar in ku şertên endametîya YE bi cih bînin."* Der barê siyaseta derveyî welêt de alîkarê serokê CHP û stratejîstê sereke yê partîyê Profesor **Sencer Ayata** dibêje ku ew di warê *Osmanîyên Nû* de – anku di pêşdebirina têkilîyên Tirkiyeyê li Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê de–, ku AKPyê dest pê kiribû, hevbîr e û dixwaze ku *"Tirkiye li wan herêman, ku berê lê xwedî bandor bû, ji nû ve têkilîyan ava bike, lê belê têkilî- li gor fikra wî wekî ku AKP dike- divê ne li ser bawerîyê ne jî li ser etnîsîteyê bin."*AKP Osmanîzma Nû qebûl nake û bi awayekî mafdar dibêje ku wan têkilîyên xwe li herêmên berfirehtir ên wekî Qafqasya, Rûsya û Afrîkayê jî pêş de birine.

***CHP*** sebaret rewşa aborî rexnegir e û di warê lihevderneketina budçeyê de, ku her ku diçe zêde dibe, fikaran dike. Lê belê ev lihevderneketina budçeyê li gor standartên welatên deryaya spî ne gelek e. Ayata, plana rizgarkirina aborîyê ya sala 2002ê ya AKPyê bi bîr dixe û dibêje: "ne mucîze bû, lê şanşê baş ê pêşveçûnekê bû ku dihat guman kirin." Dîsa jî aborîya ku AKP bi rê ve dibe li hember krîza gerdûnî bi awayekî berbiçav li ber xwe dide. Par, aborîya Tirkiyeyê ji bilî *Çîn* û *Hindistanê* ji hemû aborîyên din ên mezin bi leztir mezin bû û niha di rêza 17emîn de mezintirîn aborîya cîhanê ye. Tirkiye ku yek ji serekên pêşîn ên ***G20***ê ye, sînorên karsazî û bazirganîyê berfirehtir kirine û ne bi tenê dibe hêzeke herêmî lê her weha dibe hêzeke cîhanî jî.

***AKP*** û ***CHP*** hevbîr in ku reformên destûrî ne bi tenê ji bo demokrasîyeke pêşketî û nûjenî hewce ne, lê belê ji bo çareserîyeke aştîyane ji bo rewşa kurdan. Kurd ji deleva Kurdistaneke yekgirtî ya navdewletan, di nav Tirkiyeyê de xweserîyeke berfirehtir dixwazin. Kurd ji bo çareserîyê daxwaz dikin ku destûr bi berfirehî were guhertin, referansên ji nasnameya tirkbûnê jê werin derxistin û di şûna wan de nirxên navneteweyî yên wekî demokrasî û hevwelatîbûn werin bi cih kirin. Kurd nîqaş dikin û dibêjin ku encax piştî guhertineke bi vî rengî *Partîya Karkerên Kurdistanê* ***(PKK)*** dikare çekan deyne.

Her çend ***AKP*** piranîya super bi dest nexist jî, Tirkiye jixwe dewleteke merkezî ye û hewcedarîya wê bi pergala serokatîyê nîne. (Di nav ***AKP***yê bixwe de jî gelek kes li dij vê guherîna bingehîn derdikevin, ku heger pêk were, ***Erdoğan*** dê şûna serokkomar ***Abdullah Gül*** bistîne.) Lê belê gelo ***Erdoğan***, ku bi zordestîyê tê tewanbar kirin, dixwaze digel endamên partîyên muxalefetê hevkarîyê bike da ku di destûrê de reforman çêbike, ku ji mebesta wî ya destpêkê kêmtir bin? Ev reform dê pêştirîya hikûmeta nû be: Destûra niha, ku gelek caran hat guhertin, piştî darbeya leşkerî ya 1980ê hatibû nivîsandin. Û helwêsteke lihevkirinê dê ji bo neteweyê baş be.

1 **Nîşeya wergêr:** *Partîya Demokrat* ku serokê wê ***Adnan Menderes*** bû di hilbijartinên ***1950ê de % 52.68***, di hilbijartinên ***1954ê de % 57.61*** û di hilbijartinên ***1957ê de % 47.88ê*** dengan wergirtibû. **Menderes** di navbera 1950 û 1960ê de 3 caran hikûmet ava kiribûn. Di hilbijartinên 12ê hezîrana 2011ê de AKP % 49.83yê dengan wergirt

2 **Nîşeya wergêr:** Lijneya Bala ya Hilbijartinan di 22ê hezîranê de wekîlbûna birêz **Hatip Dicle** betal kir û di şûna wî de namzeda AKPê bû wekîl

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya



## JI ÇAPEMENÎYÊ



### Bihara ereban, havîna kurdan

Di 17ê hezîranê de piştî hilbijartinên giştî yên li Tirkiyeyê rojnameya *The New York Times*ê gotareke endama parlamentoya Tirkiyeyê Sebahat Tuncel weşand. Birêz Tuncel di gotara xwe de dibêje herçend Tirkiye xwe wekî demokrasîyekê bi nav dike jî hebûna kurdên li vî welatî, ku ji % 20ê gelheyê pêk tînin, înkar dike û serokwezîr Erdoğan, ev heşt sal in welêt bi rê ve dibe, girîngtirîn pirsgirêka welêt anku kurdên bindest piştguh dike.

Parlamentara kurd wekî din dîbeje ku ji roja ku Erdoğan bûye serokwezîr wî hertim Îsraîl bi awayekî aşkere şermezar kiriye û dilêşîya xwe ya ji bo mirina zarokên filistînî ragihandiye, lê belê wî tu cara qala zarokên kurdan nekiriye, ku bi destê artêş û polîsên tirkan hatine kuştin. **Tuncel** herweha balê dikişîne ser şermezarkirina rejîma Sûriyeyê ya ji alîyê serokwezîrê tirk û dibêje *"hikûmeta tirk jî li dij xwepêşandarên kurd gaza rondikrêj û panzeran bi kar tîne û divê Erdoğan pêşî derzîyê di xwe re, dûre şûjinê jî di cîranê xwe re ke."*

Tuncel wekî din axaftina *Dîyarbekirê* ya serokwezîr Erdoğan a sala 2005ê, ku serokwezîr tê de xetayên berê yên sebaret bi pirsgirêka kurd, ku Enqereyê kiribûn, qebûl dikir, bi bîr dixe, lê dibêje gotinên wî yên dawî yên derbarê darvekirina serokê destgîrkirî yê *PKKyê* **Abdullah Öcalan** nîşan dide ku Erdoğan dê riya duyemîn hilbijêre.

Parlamenter Tuncel di dawîya gotarê de dibêje 36 parlamenterên kurd, ku hatine hilbijartin, dê li hember siyaseta îmhayê ya *AKP*yê rawestin.

### Erdogan dikare wekî Atatürk bibe dîrokî

Kovara **The Economist**, ku berîya hilbijartinan ji bo dengdana CHPyê bang kiribû û vê yekê jî serokwezîr Erdoğan bêzar kiribû, di sernivîsa hejmara xwe ya dawîyê de bal kişand ser serkeftina berbiçav a Erdoğan û nivîsand *"Heger Erdoğan bi helwêsteke lihevkirinê pirsgirêka kurd çareser bike, dê di dîrokê de li kêleka Atatürk cihê xwe bistîne."*

Kovara îngilîzî herweha nivîsand ku Erdoğan divê ne li 'pevçûnê', lê belê li dû 'lihevkirinê' bigere û bang li wî kir ku *'destûreke zexm a lîberal'* çêke û *digel kurdan li hev were.*

Sebaret bi aborîya welat kovara îngilîzî dinivîse ku aborîya Tirkiyeyê niha dikele, lihevderneketina budçeyê gihîştîye asteke bilind a ji % 8 û bêkarî hîna jî dora ji % 11 e. Lewma tedbîrên ku werin stendin nikarin populer bin, lê belê wê bikêrhatî bin.

Kovarê der barê destûra nû de jî weha şirove kir: *"Destûra nû dê bibe mezintirîn azmûna serokwezîr Erdoğan û divê du tiştan bike. Yek ji azwerîya xwe ya ji bo pergaleke serokatîyê ya Fransayê berde û hewlê bide ku pirsgirêka herî ciddî ya welêt anku pirsgirêka kurd çareser bike."* Kovar wekî din şirove dike ku pergala serokatîyê ji bo welatî gelek merkezîbûyî yê wekî Tirkiyeyê ne fikreke baş e û ji bilî **AKP**yê tu partîyên din vê yekê qebûl nakin. Kovar weha berdewam dike: *"Pêwîstîya Erdoğan bi destûreke nû heye û divê niha berê xwe bide* ***BDP****yê û wekî berdêga dawîleânîna şidetê bêhtir mafan bide hindikahîyan, birêvebirina ji cih de pêk bîne û heta digel serokê zindanîkirî yê* ***PKK****yê* ***Abdullah Öcalan*** *re jî rûne."*

Nivîs weha bi dawî tê: *"Diyar e ku Erdoğan ji bo cara çaremîn nabe namzet lewma çav berdaye serokkomarîyê. Lê di şûna wê de divê li cihê xwe yê di dîrokê de bifikire. Mîrata wekî destûreke lîberal û lihevhatina digel kurdan dê li cem şexsîyetên girîng ên Tirkiyeyê wekî Atatürk di dîrokê de ciheki baş bide wî."*

### PKK dê çawa çekan deyne?

Gotarnivîsê rojnameya ***Sabah***ê **Mahmut Övür** di nivîsa xwe ya 25ê hezîranê de cih daye rapora TESEVê ya bi serenavê *"Daketina ji çîyê- PKK dê çawa çekan deyne?"*, ku ji alîyê rojnameger **Cengîz Çandar** ve hatiye nivîsandin. **Övür** dinivîsîne ku **Çandar** rapora xwe piştî hevdîtinên xwe yên digel rayedarên dewlet û hikûmetê û karbidestên PKKê yên wekî **Murat Karayılan** û **Zübeyir Aydar** û herweha digel nûnerên civaka sîvîl nivîsandiye.

Di raporê de, ku nivîsandina wê 6 mehan ajotîye, ev xal derketine pêş:

*1- Divê atmosfereke ewlebûnê were pêk anîn. Ji bo vê yekê jî serê pêşîn girtîyên doza KCKê, ku hin şaredarên hilbijartî jî di nav de ne, werin serbest berdan.*

*2- Dive rewşa bêçalakîyê ya PKKê domdar be û artêşa tirk jî operasyonên xwe bide rawestandin.*

*3- Daku aştîya navxweyî ya Tirkiyeyê pêk were û PKK bibe tirkiyeyî divê benda hilbijartinê ya ji sedî deh were kêmtir kirin.*

*4- Destûreke nû were çêkirin û di vê destûra nû de tarîfa hevwelatîbûnê ji nû ve were kirin.*

Nivîskar balê dikişîne dîtinên **Çandar** ku dibêje heger kurd li Tirkiyeyê statuyekê bi dest bixin, rewşa zindanê ya **Öcalan** werin baştir kirin û ji bo aştîyeke civakî ragihandina efûyeke giştî dê rê li çareserîya pirsgirêkê vekin.

### Parlamentoyeke bê kurd nikare pirsgirêka kurdî çareser bike

Gotarnivîsê rojnameya ***Radikal***ê **Cengiz Çandar** di nivîsa xwe ya roja 25ê hezîranê biryara Lijneya Bala ya Hilbijartinê (YSK) a li dij **Hatip Dicle** û biryara BDPyê ji bo neçûna parlamentoyê nirxandin. **Çandar** di nivîsa xwe de dibêje heger rê li neyê vekirin û **Hatip Dicle** û 35 parlamenterên din ên BDPê nekevin meclîsê, ev yek dê bê wê wateyê ku hilbijartinên 12ê hezîranê têk çûne.

Gotarnivîs herweha dibêje parlamento dikare bêyî parlamenterên BDPyê kom bibe, qanûnan çêke heta destûreke nû çêke, lê belê *"parlamentoyeke bê BDP, parlamentoyek, ku tê de nêzîkî 3 milyon dengên kurd nayên temsîl kirin, nikare pirsgirêka kurd çareser bike. Heger destûrek jî were nivîsandin û hewlê bidin ku kêşeya kurd çareser bikin jî ev destûr dê ji alîyê kurdan neyê qebûl kirin."*

**Cengiz Çandar** herweha dibêje di madeya 76ê a destûrê de guhertin pêk were **Hatip Dicle** dikare bikeve meclîsê, lê belê divê **Erdoğan** digel BDP (yan jî **Öcalan**) li hev bike. *Û heger gotinên* ***Bekîr Bozdağ*** *wekî helwêsta AKPyê were nîşan dan û Öcalan bang li BDPyê bike ku neçin parlametoyê dê çi bibe? Şer û pevçûn dê dest pê bikin.*

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Alîkarên vê hejmarê**
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Luqman Guldivê
Simko Destan

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dijîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêvebere hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

# Encamên hilbijartinên 12ê hezîranê (Dewama rûpela 1)

hilbijartin. Ev yek nîşan dide ku ev her du partî ji wesayeta leşkerî bêzar nînin û berevajî ew alîgirên vê wesayetê ne. Çavdêrên siyasî ragihandin ku ev helwêsta CHPyê bûye sedem ku CHP dengan wenda bike.

## Di warê kurd û Kurdistanê de hikûmet hîna jî bi çandeke siyasî tev digere, ku ya ji tayînkirîyan e

Herweha, ji ber ku referandûmê di birêvebirina Tirkiyeyê de rê li hin guhertinên bingehîn vekir, ev yek nayê wê wateyê ku siyaseta tirk, wekî ku divê, bi rê ve diçe. Wekî mînak di warê kurd û Kurdistanê de hikûmet hîna jî bi çandeke siyasî tev digere, ku ya tayînkirîyan e. Gotina *"Pirsgirêka kurd nîne, pirsgirêka hevwelatîyên min ên kurd hene"* tê wateya berdewamkirina înkar û îmhayê. Helbet ew gavên girîng in ku hikûmetê di 2009ê de dest bi *'vebûna kurd'* kir û ***TRT Şeş*** vekir. Her çend vebûna kurd bi ser neket jî, aşkere ye ku wê atmosfera siyasî nermijand. Lê belê divê were nirxandin ka vebûna kurd çima bi ser neket û serokwezîr çima nikaribû xwe ji çanda siyasî, ku ji alîyê tayînkirîyan ve hatiye pêk anîn, dûr bixe.

Teorîya alavên bi hevdu ve girêdayî ya fîzîkê dikare di bûyerên civakî de jî were dîtin. Hikûmeta ku bi referandûma 12ê îlonê asêkirinên girîng ên ji pêşîya birêvebirin û demokrasîya Tirkiyeyê hilanî, diviyabû ku di warê meseleya kurdan û mafên wan ên komî de bikaribûya demokrattir bibe. Wekî mînak benda ji sedî deh dikaribû bihatana daxistin û bibe sê yan çar dersed. Û tê zanîn ku ev yek nehat kirin, daku pêşî li temsîlîyeteke bandorkar a kurdan a di parlamentoyê de were girtin. Kurdan, ***BDP***yê, ev yek bi namzetên serbixwe, bi ***Hevgirtina Ked, Demokrasî û Azadîyê*** bertaraf kir. Di eynî demê de, divê were binxêz kirin ku hilbijartinên bi benda sedî deh ne hilbijartinên demokratîk in. Amadekirina destûreke nû ya parlamentoya ku di encama hilbijartineke weha de pêk hatiye, dê hertim bi şaîbe be. Herweha ev yek kiryareke din a nedemokratîk jî ew e ku ***BDP*** ji alîkarîyên xezîneyê bêpar tê hiştin.

Hikûmet bi referandûma 12ê îlonê di warê têgihiştina civakî û siyasî de guhertinên girîng pêk tîne, lê belê di warê kurdan û pirsgirêka kurdî de hewlê dide ku têgihiştina berê wekî xwe bidomîne. Ev yek tê wateya tepisandin û bendewarîyên civaka kurd û ev têgihiştin pêşî li pevçûnên civakî û siyasî vedike. Dema ku pêşveçûna demokratîk, ku di encama referandûmê de derket, bi pirsgirêka kurd, bi pirsgirêka *Kurdistanê* were azmûn kirin, encamên erênî dernakevin.

## Ne AKP, ne hikûmet, ne jî kurd di warê pirsgirêka kurd de xwedî têgihiştineke bi rêkûpêk in

Ne AKP, ne hikûmet, ne jî kurd di warê pirsgirêka kurd de xwedî têgihiştineke bi rêkûpêk in. Hikûmet diyar dike ku ew kurdan û zimanê kurdî nas dike. Lê belê ji bilî mafên takekesî ji kurdan re tu mafên din nas nake. Hikûmet dixwaze ku kurd qîma xwe bi mafên takekesî bînin û doza mafên din nekin. Naxwaze ku kurd mafên kollektîf bînin bîra xwe. Lê belê pirsgirêka kurd, pirsgirêka Kurdistanê pirsgirêka mafên kollektîf in. Kurd xwedîyê hin mafan in. Ev maf ji ber ku ew kurd in, neteweya kurd in, peyda dibin. Mafê perwerdehîya bi zimanê dayîkê, perwerdehîya mecbûrî ya bi zimanê kurdî di nav van mafan de di serî de tên. Her weha bikaranîna zimanê kurdî di qada giştî de. Ev, mafên xwezayî ne û ji ber mirovbûnê peyda dibin. Ev yek xwezayî ye ku kurd ji bo mafên xwe, ku ji wan hatine dizîn, têdikoşin.

Ez bawer nakim ku ***AKP*** di vê çarçoveyê de destûreke nû difikire. Herweha bawer im ji ber ku AKPyê di hilbijartinan de kêmî 330 anku 327 wekîl derxistin, ev yek ji bo hikûmetê bû bêhnvedanek. Heger zêdeyî 330 derxistana, dikaribû xwe mecbûr hîs bikiraya ku sozên xwe, ku ji bo destûreke nû dabûn, bi cih bîne. Lê belê di vê rewşê de *AKP* dikare bi tenê bi hevkarîya digel partîyên din vê meseleyê çareser bike. Bêguman AKP dê ji partîyên din piştgirîyê bixwaze.

## Heger BDP baştirkirina rewşa zindanîbûna Öcalan wekî şerta pêşîn deyne, ew yek dê bi kêrî hikûmetê were

Îcar di vê çarçoveyê helwêsta *Partîya Aştî û Demokrasîyê* girîng e. ***BDP***, bêyî ku baştirkirina şert û mercên zindanîbûna **Öcalan** wekî pêş-şert deyne û di şûna wê de perwerdehîya bi zimanê dayîkê û *Kurdistana xweser* bîne rojevê, dikare bêhtir zorê bide hikûmetê. Yan na heger baştirkirina rewşa zindanîbûna **Öcalan** wekî şerta pêşîn deyne, ew yek dê bi kêrî hikûmetê were. *CHP* û *MHP* wisa xuya dike ku dê di warê guhertina destûrê de karên hikûmetê hêsantir nekin. MHP bi awayekî erênî nêzî destûra nû nabe. CHP jî di vê atmosferê de, ne di wê rewşê de ye ku digel AKPyê hevkarîyê bike û pirsgirêkên sereke çareser bike. Ji ber ku piştî hilbijartinan di nav CHPyê bixwe de li dij serokpartî **Kemal Kılıçdaroğlu** muxalefetek dest pê kiriye. Serê CHPyê dê bi van mijaran re meşxul be.

Tê dîtin ku di hilbijartinên 12ê hezîranê de BDPyê serkeftineke mezin bi dest xist. Bêguman dengdana ji bo BDPyê girîng e. Lê belê xwedî lê derketina dengan û şopandina jimartina dengan û pêşîlêgirtina dizîn û guhertina dengan jî bi qasî dengdanê girîng in. Di van hilbijartinan de kurd bi hişyarî xwedî li dengên xwe derketin. Ev yek di warê pêşdebirina çanda sîyasî ya kurdan de risteke girîng dilîze. Wekî mînak, di hilbijartina 2007ê de bawer dikim ku namzedên *Edene* û *Mersinê* bi têra xwe deng wergirtin daku bikaribin werin hilbijartin. Lê belê wê demê kurdan nikaribûn pêşî li dizîn û dek û dolaban bigirin. Di van hilbijartinan de kurdan di warê şopandina jimartina dengan û pêşîlêgirtina dizîna dengan de helwêsteke bi biryar nîşan da.

BDP di hilbijartinên 2007ê ji xwe li bajarên wekî *Dîyarbekir, Colemêrg* û *Şirnex*ê partîya yekemîn bû. Di hilbijartinên 2011ê de jî ***BDP*** li bajarên wekî *Êlih, Mêrdîn* û *Wanê* ket pêşîya ***AKP***yê. BDPyê li Wanê rêjeya dengên xwe ji % **30,21** derxist ji % **49,52** û dengên AKPyê jî ji % 53,22 ket % 40,18an. Li *Mêrdîn*ê jî BDPyê dengên xwe ji 37,77 rakirin 61,02 dersedê û yên AKPyê jî ji 44,06 ketin 32,40 dersedê. BDP cara pêşîn li bajarên wekî *Qers*, *Agirî* û *Çewlik*ê wekîl derxistin û li deverên wekî *Îxdir, Ruha, Mûş û Sêrtê* yan dengên xwe parastin, yan jî zêde kirin. Ev serkeftineke berbiçav e. Rewşa li *Edene, Mersin* û *Stenbolê* jî her weha ye. Serokwezîr nikare bibêje *"75 heb wekîlên min ên kurd hene..."* Ev jî ji bo kurdan pêşveçûnek e. Şkestina giranîya AKPyê li bajarên kurdan baş e.

Li Dêrsimê jî têkçûna BDPyê rewşeke gelek normal e. Di vir de hewldanên rêxistinên wekî ***Komeleyên Çandî yên Pîr Sultan Abdal*** (PSAKD), ***Komeleyên Çandî yên Elewîyan*** (AKD), ***Federasyona Elewî-Bektaşîyan*** (ABF) ji bo namzedên ***CHP***yê bandora xwe daye. Her çend birêveberên van rêxistinan ji CHPyê wekî namzed nehatin nîşandan jî, nîqaşên bi vî rengî bes bûn ku serê dengdaran şolî bibe.

## Siyaseta navend-Amed yan Sîyaseta navend-Enqere

Bêguman gelek girîng e ku di van hilbijartinan de *Hevgirtina Ked, Demokrasî û Azadîyê* 36 wekîl derxistin.**(1)** Di warê bandorkirina siyaseta Tirkiyeyê de 36 wekîl dikarin bibandortir bin ji 22 wekîlan. Lê belê heger kurdan ji deleva siyaseteke *navend-Enqere*, siyaseteke *navend-Amed* bimeşînin, ev yek dê watedartir be û bêhtir bi kêr were. Di vî warî hewce ye ku kurd girîngîyê bidin rêveberîyên herêmî anku hejmara şaredarîyan ji sedî rakin ser sed û pêncî yan sed û şêsan û bi riya rêvebirîyên herêmî bandorê li ser siyaseta tirk bikin.

Bi rastî pirsgirêka kurd pirsgirêka kurdistanê ye. Ev pirsgirêk ne tenê bi Tirkiyeyê re, lê her weha bi *Iraq, Îran, Sûriyeyê* têkildar e. Herweha bi *DYA, Federasyona Rûsyayê, Yekîtîya Ewropî, Rêxistina Konferansa Îslamî* re jî têkildar e. Lewma divê ev pirsgirêk di çarçoveya *Rojhilata Navîn* de were nirxandin.

## BDP ji bo çareserîyê modela Bask tîne rojevê, belê ne hewce ye ku ewqas dûr biçe

Diyar e ku hikûmet, AKP bi israr in ku ji kurdan re ji bilî mafên takekesî tu mafan nas nakin. Di vê xalê de divê BDP siyaseta Tirkiyeyê ya *Qibris* û *Filistînê* bi awayekî berfireh bînin ziman. BDP çareserîya ***modela Bask*** tîne rojevê, belê ne hewce ye ku ewqas dûr here. Ew dê bêhtir bi kêr were heger li siyaseta ku dewlet ji bo *Qibris* û *Filistînê* dimeşîne binihêre.

Tirkiye ji bo *Qibrisê* çi dixwaze? Tirkiye him li cem rêxistinên navneteweyî yên wekî *Neteweyên Yekgirtî, Konseya Ewropî, Yekîtîya Ewropî, Konferansa Îslamî, Rêxistina Ewropî ji bo Ewlekarî û Hevkarîyê* û her weha di têkilîyên xwe yên dualî yên digel dewletan, dixwaze ku *Komara Tirk a Qibrisa Bakur* wekî dewleteke serbixwe were nasîn. Jixwe ji 15ê sermaweza 1983yê û vir ve li bakurê Qibrisê dewlete tirk heye. Tirkiye dixwaze ev dewlet ji alîyê *DYA, Brîtanya, Fransa, Almanya, Îtalya, Rûsya, Misir, Îran û Pakistanê* ve û ji alîyê rêxistinên navneteweyî ve were nas kirin. Herweha dixwaze bi demê re *Yûnanistan* û *Qibrisa Rûm* jî vê dewletê nas bikin. Tirkiye îddîa dike ku yeksanîya navbera tirkan û rûman dikare bi tenê bi vî awayî pêk were.

Niha li *Qibrisa Bakur* dora 190 hezar kes dijîn. Di dema ***'Hereketa Aştîyê'*** ya 1974ê de gelheya vê deverê 150 hezar bû, lê niha digel wan muhaciran ku ji Tirkiyê hatin şandin bûye 190-200 hezar. Tirkiye ji bo *Qibrisa Bakur* doza serxwebûnê dike. Qibris yek ji mijarên sereke yên siyaseta derve ya Tirkiyeyê ye. Lê belê heman Tirkiye ji bo kurdan, ku gelheye wan bi ser 20 mîlyonan e, bi israr e ku ji bilî mafên takekesî tu mafan nede. Çareserîya vê nakokîyê dê di warê kurdan û pirsgirêka kurd û Kurdistanê de agahîyên gelek hêja bide me.

## Divê were nirxandin û lêkolîn ka li Kurdistana Başûr çareserî çawa pêk hat, Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê çawa hat damezirandin û pêşmerge çawa bûn hêzên ewlekarîyê yên Herêma Kurdistanê

Dîsa gelek girîng e ku were nirxandin ka Tirkiye ji bo erebên *Filistînê* çi dixwaze. Tirkiye dixwaze ku erebên Filistînê dewleteke xwe ya serbixwe damezirînin. Him li cem rêxistinên navneteweyî, him jî di têkilîyên xwe yên dualî de vê fikra xwe diparêze. Rizgarkirina erebên filistînî yên ji desthilatdarîya îsraîlî, yek ji mijar û mebestên siyaseta derve ya Tirkiyeyê pêk tîne. Tirkiyeya ku ji bo *erebên filistînî* doza dewleteke serbixwe dike, mafên komî yên kurdan, ku ji gelbûna wan peyda dibin, nas nake. Ev yek jî mijareke girîng e ku divê were nirxandin.

Herweha tê dîtin ku rewşa kurdan û ya erebên Filistînê ji hev gelek cihê ye. Bi tenê neyareke erebên *Filistînê* heye, anku *Îsraîl*. Hin dewletên ereb jî *Îsraîlê* wekî neyara xwe dibînin. Wekî din, ne xem e heger digel filistînîyan hevdil bin yan jî li dij wan bin, hemû dewletên ereban alîkarîya maddî û manewî didin wan. Lê belê, ***kurd û Kurdistan***, ku li naverasta Rojhilata Navîn e û hatiye parçe kirin û par ve kirin, hejmara neyarên wan gelek zêdetir e.

Li derveyî van, divê were nirxandin û lêkolîn ka li *Kurdistana Başûr* çareserî çawa pêk hat, *Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê* çawa hat damezirandin û *pêşmerge* çawa bûn hêzên ewlekarîyê yên Herêma Kurdistanê.

1 Di dema nivîsandina vê gotarê de hejmara wekîlên BDPyê 36 bûn. Lê belê di 22ê hezîranê de *Lijneya Bala ya Hilbijartina* wekîlbûna birêz **Hatip Dicle** ji ber cezayê ku lê hatibû birîn betal kir û di şûna wî de namzeteke AKPyê hat hilbijartin. (Nîşeya wergêr)

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya



Havîn Dinç (4 Salî)

www.diplomatiquekurdi.org

# Hilbijartinên li Tirkiyeyê û piştî wan (Dewama rûpela 1)

kiribin jî, li gor hilbijartinên 2002ê, ku tê de wekî partî anku Partîya Demokrat a Gel (DEHAP) beşdar bûbû, dengên BDP pir hindik bi ser 6,2 dersî ya DEHAPê ketine. Li vê derê dema ku dengên partîyekê û dengên namzetên serbixwe werin dan ber hev, wendabûna dengan, a ji ber wan hilbijêran, ku bi tirkî nizanin, jî divê bê hesab kirin. Jixwe berîya hilbijartinên 2007ê di qanûnên hilbijartinê de hin guhertin pêk hatibûn û namzedên serbixwe êdî nikarin pusulayên xwe bi kar bînin û navên wan digel partî û namzedên din ên serbixwe di pusulayên hilbijartinê de tê hilbijartin. Bi vî awayî mebest ew bû ku hilbijêr di pusulayên dirêj ên hilbijartinan de xwe şaş bikin û nikaribin namzedên xwe ji yên din cihê bikin.

Ji alîyê din de jî, nemaze li metropolên Tirkiyeyê yên wekî Stenbol, İzmîr, Mêrsîn û Edeneyê, ku gelek kurd lê dijîn, tabloyeke weha derdikeve holê. Di hilbijartinên 2007ê de bi tenê li Stenbolê 2 wekîl derketibûn, lê belê di 12ê hezîranê li Edene û Mêrsînê yek li Stenbolê jî 3 namzedên serbixwe hatin hilbijartin. Li van bajaran hejmara dengên namzedên serbixwe li gor hilbijartinên 2007ê zêde bûn jî dîsa di asta rêjeya DEHAPê de ma, ku di hilbijartinên 2002ê wergirtibûn.

Wekî encam, digel van hemûyan hilbijêrên ku di 2007ê de ji BDPyê bi dûr ketibûn dîsa deng dan wê, lê dîsa jî dikare bê gotin ku li hin bajarên Kurdistanê, ku lê eşîr, tarîqat û cema'etên elewî xwedî bandor in, serkeftinek nehat bi dest xistin. Dîsa heger li encamên hilbijartinan, ku 2002 û vir hatine li dar xistin, were nihêrtin, tê dîtin ku bi rewşa xwe ya niha dengên BDPyê di navbera 5.5 û 6.5 dersedê de diçe û tê û heger ne bi namazedên serbixwe, lê belê wekî partî biketaya hilbijartinan, ev rêje dê herî zêde bigihîşta % 7ê.

## Soza Sereke: "Destûra Nû"

Sedema ku hilbijartinên 12ê hezîranê girîng dikir ew bû; hatibû ragihandin meclîsa ku dê bihata hilbijartin wê destûreke nû çêbike. AKPya ku car caran mijara 'Destûra Nû' dianî rojevê, piştî referandûma guhertina destûrê, ku par hatibû encam dan, soz dabû ku ji bo destûreke nû dest bi xebatan bike. Herçend hema hema di her serdemê de sozên ji bo guhertina destûra 82yê, ku digel çendîn guhertinan hîna jî meşrûîyeta wê tê nîqaş kirin, di vî warî de pêngava berbiçav di sala 2007ê de ji alîyê AKPyê ve hat avêtin. Di dema 'krîza hilbijartina serokkomarîyê' de AKPyê bi komîsyoneke akademîsyenan, ku Prof. Ergun Özbudun serokatîya wê dikir, 'pêşniyareke destûra nû' da nivîsandin. Di payîza heman salê de pêşniyar ji raya giştî re hat aşkere kirin, lê belê ji ber nerazîbûnên tund ên neteweperestan, pêşniyar rakirin ser refan.

AKPya ku di 2010ê de çêkirina destûreke nû dîsa anî rojevê, lê berevajîya hewldana xwe ya 2007ê ji raya giştî re tu pêşniyara destûrê aşkere nekir. Ji bilî gotinên razber ên wekî 'destûra nû dê demokratîk, azadî û beşdarîxwaz be û dê Tirkiyeyê ji wesayetê, ji mudaxeleyan rizgar bike' pê ve tu gotinên şênber derneketin holê. Bi tenê qala hin pêşniyarên destûrê hat kirin, ku di rabihurîyê de ji alîyê hin rêxistinên sîvîl ve hatibûn amade kirin. (2)Tenê gotin, ku dikare wekî berbiçav were nirxandin, fikra pergala serokatîyê ya wekî Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bû, ku di hin hevpeyvînan de serokwezîrê tirk Recep Tayyîp Erdoğan anî zimên.

Herçend AKPyê bi soza destûreke nû ji dengdaran deng xwest jî, ji raya giştî re ne tu pêşniyar aşkere kirin ne jî agahîyên şênber dan. Sedema vê yekê dikare ew fikar be ku destûra nû ku AKP amade dike di şûna wê de ku dengên wê zêde bike, dikaribû dengên wê kêmtir bike. Jixwe, li gor wê fikrê ku ji alîyê gelek derdoran ve dihat gotin AKPyê dixwest piranîya hewce bi dest bixe, da ku bikaribe bi tena serê xwe destûrê biguherîne û lewma jî stratejîya xwe li ser wê esasê ava kir ku MHP nikaribe bi ser benda 10 dersedî bikeve. Hin bûyerên wekî ku AKPyê berîya hilbijartinan şêwazeke neteweperest a nêzî MHPyê bi kar anî, polîtîkayên xwe yên ji bo vekirina kurdî da rawestandin û hin wekîlên kurd, ku di raya giştî de tên nasîn, li derveyî lîsteyan hiştin, weha hatin nîşan dan ku vê bawerîyê piştrast dikin. Piştî ku di referandûma 2010ê de parçeyekî gelek girîng a girseya MHP got erê û bi giştî 58 dersed dengên erê derketin, mimkun e AKP fikirîbe ku dengên MHPyê bi alîyê xwe ve bikşîne û MHP nikaribe bi ser benda 10 dersedê bike û bi vî awayî AKP bikaribe bêhtir wekîlan derxe. Lê belê divê were binxêz kirin ev yek ne tenê hesabeke ji bo hilbijartinan bû, lê belê di serî de Erdoğan gelek kesên nav AKPyê van gotinên neteweperest xistine serê xwe.

Ji alîyê din de jî CHP û MHP, ku ne bi tena serê xwe ne jî bi koalîsyonê re dikarin hikûmetekê ava bikin û bi tundî li dij guhertinên destûrî yên 2010ê derketibûn, jê kêm neman û wan jî soza destûreke nû da. Lê belê dikare bê gotin ku ev partî, ku wan jî wekî AKPyê gotinên razber û gelemperî bi kar anîn, da ku AKP piranîya hewce bi dest nexe ku bikaribe bi tena serê xwe destûrê biguherîne û bi qasî ku bikaribin rihê destûra heyî bê parastin. Wan bi vî awayî xwest ku di destê wan de hêza bazarkirinê hebe.

Di warê destûra nû de pêşniyarên herî berbiçav û berfireh ji alîyê BDPyê û Hevgirtina Ked, Demokrasî û Azadîyê ve hat kirin. Hevgirtinê di daxuyanîya xwe ya hilbijartinan de di warê meseleya kurdî de cih da mijarên wekî xweserîya demokratîk û mafê perwerdehîya bi zimanê dayîkê, ku berê ji alîyê BDPyê ve hatibûn ragihandin. Wekî din hat binxêz kirin ku divê destûra nû xwe nespêre tu îdeolojîyan, yan jî grupeke etnîk. Di modêla Xweserîya Demokratîk de hat pêşniyar kirin ku seranserî Tirkiye dora 20- 25 herêmên xweser werin ava kirin, karên derve, darayî û berevanîyê li jêr desthilata hikûmeta navendî be, xizmetên wekî dadwerî û ewlekarîyê digel hikûmeta navendî bi awayekî hevbeş bên meşandin û xizmetên din di destê birêvebirîya xweser de bin, herçend tirkî wekî zimanê fermî bimîne jî herêmên xweser dikarin zimanekî yan jî du zimanên din ên fermî jî hilbijêrin. (3) Stratejîya sereke ya hilbijartinê ya BDPyê, ku di çavdêrîya dewletê de rasterast AKP ji xwe re hedef girtibû, bi kurtasî ew bû ku li bajarên sereke yên Kurdistanê ji AKPyê bêhtir deng bistîne, bi qasî ku ji destê wan tê gelek wekîlan derxe û di parlamentoyê de komeke hêzdar damezirîne û di bazara ji bo destûra nû de bibe xwedîya rista kilîd.

## Ji hilbijartinan ber bi krîzê ve

Di encama hilbijartinan de MHP li jêr bendê nema, AKPyê herçend dengên xwe zêde kirin jî negihîşt piranîya lazim û planên wê yên guhertina destûrê ya bi tena serê xwe serûbino bûn. BDPyê bi komeke hêzdar maf bi dest xist ku bikeve parlamentoyê. Ji ber ku YSKyê berîya hilbijartinan bi hinceta aktuelîzekirina daneyên serjimarî û dengdaran hejmara wekîlên bajaran guherandin. AKPyê, herçend dengên xwe zêde kirin jî, kêmtir wekîl derxistin. Piştî guhertinên destûrî yên 2010ê YSK wekî yek ji kelehên nav burokrasîya dadwerîya statukoyê ma û vê kiryara YSKyê bandora xwe herî zêde li ser AKPyê kir. Heman YSKyê bi redkirina namzedîya hin namzetên serbixwe yên BDPyê rê li kirîzeke cidî vekir, lê belê piştî xwepêşandan û nerazîbûnan biryara xwe bi dengê piranîyê guherand.

Îcar hema piştî hilbijartinan YSKyê wekîlîya Hatip Dicle, ku li Dîyarbekirê bi rêjeyeke bilind a dengan hatibû hilbijartin, ji ber cezayê ku lê hatibû birîn, betal kir û di şûna wî de namzeda AKPyê kir wekîl. Vê yekê jî rê li ber krîzeke nû vekir. BDPyê ku ji ber vê rewşê AKP berpirsîyar girt û biryar da 'heta ku parlamento û hikûmet vê neheqîyê ji holê raneke, pêşîya siyaseta demokratîk veneke û ji bo çareserîyê pêngavên berbiçav neavêje' neçe parlamentoyê.

Ji alîyê din de jî di van hilbijartinan de ji bilî Hatip Dicle 5 girtîyên doza KCKyê jî hatin hilbijartin. Wekî din 2 namzedên CHPyê û namzedekî MHPyê, ku bersûcên doza Ergenekonê ne, hatin hilbijartin. Lê belê dadgehan daxwazên berdana van kesan qebûl nekir. Paşê, CHP jî, di demeke weha de ku biryara YSKyê û rewşa Hatip Dicle pir dihat nîqaş kirin, biryar stend 'heta ku rê li sondxwarina wekîlên girtî neyê vekirin' ew dê li parlamentoyê sond nexwin. Vê kirina CHPyê, aktuelbûna gotûbêjên li ser biryara YSK û rewşa Hatip Dicle û boykotkirina BDPyê kêmtir kir.

## Krîza sondxwarinê yan bazara ji bo destûra nû?

Van hemû rûdanan rê lê vekir ku parlamentoya nû, ku di serî de ji bo meseleya destûra nû wezîfeya çareserîyê jê re dayîn, bêyî ku dest bi xebatên xwe bike, bi krîzekê re rû bi rû bimîne.

Divê ev krîz ji îadekirina wekîlîya Hatip Dicle an jî serbestberdana wekîlên girtî wêdetir di çarçoveya destûra nû û têkoşîn û bazara domdar a navbera dewlet û hikûmeta tirk were nirxandin.

Wekî ku tê zanîn, cirkî AKP di 2002ê de hat ser hikum, di hevkêşî û struktura sereke ya îqtîdarê ya dewleta tirk de hin hejîn pêk hatin. Rewşa burokrasîya sivîl û leşkerî, ku di nav realîteyên dema piştî şerê sar de girîngî û piştgirîya xwe ya navneteweyî wenda kirin, digel hemû hewldanên restorayonê li nav welêt de jî qels bû. Di esasê xwe de, AKP ku bi piştgirîya xizanên muhafazakar, ku ji alîyê elîtên kemalîst ve dihatin li derve hiştin û kêm dîtin, û bi piştgirîya hin derdorên nû yên sermîyanê, ku pêşî li wan dihat girtin, hat ser hikum, demeke dirêj hewl da ku ji alîyê burokrasîya leşkerî ve bê qebûl kirin û bi riya lihevkirinê îqtîdarê digel wê par ve bike. Di serî de di meseleya kurdî de, di gelek meseleyên sereke de AKPyê hewl da ku di nav çarçoveya siyaseta serfermandarîya artêşa tirk de bimîne. Lê belê burokrasîya mîlîtarîst, ku wesayet û îmtîyazên xwe li ser notirvanîya sekulerîzm û feraseta dewleta unîter a li ser esasa neteweperestîya tirk a Kemalîzmê ava kiriye, teqsîr nekir ku ji ser meseleya sekulerîzmê re AKPyê tasfîye bike. Di encamê, di nav 'planên darbeyê', 'muxtira', 'pêşîlêgirtina serokkomarîya Abdullah Gül', 'doza girtinê' û hwd. de, dema ku hewce veguherî man û nemanê, AKP ket nav liv û tevgeran. AKPyê bi dij-hemleyên wekî 'dozên Ergenekonê', 'guhertinên destûrî' gav avêtin ku îmtîyazên burokrasîya sîvîl û leşkerî sînordar bike, qada xwe ya desthilatdarîyê fireh bike.

Parêzvanên nîzama berê ya muesses da ku ji girseyên berfirehtir piştgirîyê bistînin, xwest ku CHP û MHPyê ji nû dîzayn bikin û heza wan zêde bikin. Hewldanên ji bo avakirina enîya li dij AKPyê hat xurttir kirin. Jixwe, bi weşandina dîmenên Baykal, birêvebirîya berê ya CHPyê, ku di çavê raya giştî de rizîyabû, hat tasfîye kirin. Vîtrîneke tevlihev hat ava kirin ku tê de ji siyasetmedarên navdar ên kurd ên wekî ji serokê berê yê Baroya Amedê Sezgin Tanrıkulu heta bersûcên doza Ergenekonê jî hebûn. Her çend di bernameya partîyê de guhertinek pêk nehat jî, li gor serdema Baykal di warê mijarên wekî meseleya kurd, demokratîkbûn û Yekîtîya Ewropî de zimanekî din û nermtir hat bi kar anîn. Di xebatên hilbijartinê û di mîtîngên Kurdistanê de CHP hewl da ku peyaman bide gel û BDPyê ku CHP xwe nû kiriye, guhertiye.

Skandaleke din a kasetê, demeke kin berîya hilbijartinan li cem MHPyê derket. 10 birêvebirên payebilind ên MHPyê, yan bi weşandin yan jî bi gefxwarina weşandina kasetên wan neçar man ku dest ji kar bikişînin. Bûyera kasetê bû sedem ku dengên MHPyê, ku ji ber benda deh dersedî tengezar bû, bilind bibin.

Serkeftina projeya CHP-MHP ya li hember AKPyê tu car wekî pêkan nehat dîtin. Lê belê, mebest ew bû ku AKP piranîya hewce bi dest nexe û hewceyî piştgirîya ji muxalefetê be û bi vî awayî ji bo parastina feraseta bingehîn a destûrê bazarek bê kirin. Jixwe, him CHP û him jî MHP di her derfetê de 'neguherbarîya' her sê madeyên destûra heyî binxêz kir.

Ji ber CHP û MHP ne xwedî wê hêzê ne ku guhertinên destûrî bloke bikin, lewma rewşa BDPyê girîngtir bû, hêza wê ya bazarê xurt bû. BDP vê carê derfeteke weha bi dest xist ku zorê bide AKPyê, ku heta niha guh nedida BDPyê, ku li gor daxwazên xwe bazarê bike û daxwazên xwe di destûra nû de, di asta herî bilind de bide qebûl kirin.

Dîsa di nav arîtmetîka heyî ya parlamentoyê de AKP dikare digel partîyekê li hev bike ku ev yek jî dê naverok û pergala destûra nû diyar bike. Di lihevkirineke digel MHP û CHPyê de xuya ye ku her sê madeyên pêşîn ên destûrê dê nayên guhertin. Îdeolojîya fermî dê gotinên xwe yên bingehîn dubare bike û destûra nû di serî de ji bo meseleya kurd, ji meseleyên bingehîn re tu tiştekî nû neyne. Lê belê di lihevkirineke digel BDPyê de mimkun e ku hin guhertinên destûrî pêk bên ku daxwazên kurdan ên ji bo mafên wan ên bingehîn, herçend sînordar be jî, dê bên nas kirin.

Mumkin e ku mebesta boykota sondxwarinê ya CHPyê ne tenê ew e ku zorê bide AKPyê da ku digel wê li hev bê, lê belê pêkanîna wesayeta xwe ya li BDPyê ye, ku parlamentoyê boykot dike, û wê ji AKPyê dûr bigire. MHPyê ku wekî CHPyê nekir û çû parlamentoyê, xuya ye ku hewlê dide ku ji hundir de dora AKPyê bigire.

Hêz û rewşa wê ya li nav hevkêşîyên îqtîdarê û ka ew çiqas girîngîyê dide vîzyona ku bi xwe ragihandibû, wê diyar bikin ka AKP dê kîjan alternatîfê hilbijêre. Di rewşa heyî de AKP hewlê dide ku li Rojhilata Navîn bibe hêzeke herêmî, wekî hamîya welatên misilman tev bigere, qada bandora xwe ya siyasî û aborî firehtir bike. Li nav welêt jî AKP hewlê dide burokrasîya sivîl-leşkerî qels bike û qada desthilatdarîya xwe bihêz bike, xwe bixe navendê û bibe partîya dewletê. Pergala serokatîyê, ku berîya hilbijartina hatibû rojevê, her di çarçoveya van mebestan de ye. Bêguman, çaresernebûna meseleyên kronîk, ku di serî de meseleya kurdî tê, dê bibin handîkapên mezin ên vê vîzyonê.

Di vê çarçoveyê de, her çend ji ber dama xwe ya neteweperestîyê dilê wê pir naxwaze jî, vîzyona ku danîye ber xwe û şert û mercên ku ew tê de ye, zorê dide AKPyê ku di warê meseleya kurdî de hin gavan biavêje. Ji ber ku di pratîka xwe ya heta îro de AKPyê guhertinên erênî ne ji paceya demokrasî û azadîyan, lê belê ji bo parastin û bihêztir kirina desthilatdarîya xwe, pêk anî. Anku bi qasî ku bi kêrî wê dihat, pêk anîn. Di meseleya kurd de jî mumkin e ku AKP ne ji ber ku rêzê li mafên kurdan digire hin gavan diavêje, lê belê ji ber ku meseleya kurd li pêş pêşketina xwe de wekî astengekê dibîne û dîsa mumkin e ku hewlê bide ku maf di asta herî jêr de bimînin. Di encamê de dikare bê gotin ku destûra nû dê ji bo meseleya kurdî jî hin rêkûpêkîyan bihewîne. Jixwe, berîya referandûma destûrî ya 2010ê cara pêşîn vekirina kurd û hevdîtinên digel Abdullah Öcalan di çapemenîyê de cih girt. Herçend, hikûmetê piştrast nekir jî, di çapemenîyê de hevdîtinên digel Qendîl û rayedarên PKK yên li Ewropayê jî derketin. Dosyaya vekirinê paşê hat hilanîn jî, hevdîtinên Öcalan bi awayekî berdewam kirin. Di van hevdîtinan de, ku ji alîyê dewletê ve nehatin înkar kirin, lê belê sebaret bi naveroka wan tu agahî nehat dayîn, çavkanîya tenê ya agahîyan nîşeyên hevdîtina Öcalan a digel parêzerên wî bûn. Peyamên ku ji van hevdîtinan derdiketin herçend derbarê atmosfera wan de fikir dida jî, pir caran agahîyên şênber nedidan. Lê belê di notên hevdîtina dawîyê de Öcalan ragihand ku 'di encama hevdîtinên digel rayedaran de ew gihaştine lihevkirinekê ku Konseya Aştîyê bê ava kirin.'

Ji alîyê din de jî, balkêş e ku hevdîtinên eslî ne digel BDP, ji ber hilbijartinan xwedî hêza nûnerîyê ye, lê belê rasterast digel Abdullah Öcalan û birêvebirîya PKKyê re tên encam dan. Birêvebirên BDPyê, herçend partîyeke vekirî ya siyasî ne jî, di her derfetê Îmrali yan jî Qendîlê wekî navnîşana çareserîyê nîşan didin. Ev yek tê wê wateyê ku Öcalan û PKK naxwazin însîyatîfê bidin BDPyê û dixwazin pêvajoyê rasterast û bixwe kontrol bikin. Her bi vî awayî, dema ku him li daxuyanîyên Öcalan û him jî modêla birêvebirîyên herêmî ya Kongreya Civaka Demokratîk, ku di mehên çûyî de hatibû aşkere kirin, were nihêrtin tê dîtin ku mebest ew e ku di rewşeke pêkan a xweserîyê de orxanên sîyasî û îdarî jî bixin bin kontrola xwe.

Herçend naveroka muzakereyên digel PKK yan jî naveroka şênber a pakêta 'Vekirina Kurdî' ya hikûmetê nayên zanîn jî di çapemenîyê mijarên wekî 'çekdanîna PKKyê û dahatîya hêzên çekdar', 'efûyeke giştî', 'mafên zimanî û çandî', 'birêvebirîyên herêmî' tên nivîsandin. Li cem BDP û PKKyê daxwazên berbiçav ên wekî 'perwerdehîya bi zimanê dayîkê', 'baştirkirina rewşa zindanîbûna Öcalan' derdikevin pêş jî karbidestên hikûmeta AKPyê, ku di navenda dewletê de bi cih bûne, heta vê gavê jî bi awayekî neyînî li van daxwazan dinihêrin. Hikûmet, bi gelemperî 'ummetbûnê' anku biratîya olî binxêz dike û di dora dirûşmeya 'yek netewe, yek al, yek welat' têgiheke şolî ya 'hevwelatîya destûrî' bi lêv dike lê belê jê pêvtir dîyar nake ku ka kîjan mafan/daxwazan dê nas bike yan jî dê kîjan red bike. Hevdem AKP, BDPyê wekî muxattab nas nake û carna jî tengezarîyê bilindtir dike û bi vî awayî ji destpêkê ve li ser alîyê kurd pêkutîyê pêk tîne.

Wekî encam, çêkirin, dem, naverok û berfirehîya destûra nû dê bi encamên hevdîtinan û avantajên deshilatdarîya AKPyê re girêdayî be. Hevdîtin herweha dîyar bikin ka mesafeya daxwazên asgarî, ku PKK û BDP tînin ziman, û helwêsta AKP û bi giştî ya dewleta tirk jî dê çawa were ji holê rakirin.Her bi vî awayî, nêzîkbûna partîyên din ên parlamentoyê ji bo destûrê û asta erêkirina van muzakerayan a ji alîyê dewletê ve jî rasterast têkildar in.

Heger ji hevdîtinên digel PKKyê encamek neyê bi dest xistin, mumkin e ku AKP digel CHP û MHPyê re dest bi xebata destûrekê bike ku tê de feraseta heyî kêm zêde were parastin û meseleya kurdî jî li derve were hiştin. Lê belê bi her awayî, destûreke nû, ku tê de avabûneke xweser ji bo Kurdistanê û mafê perwerdehîya zimanê dayîkê cih negirin, dê ji gavên pêwîst ên ji bo çareserîyeke adilane û demokratîk a meseleya kurd gelekî dûr bimîne.

1 Şahin Artan, "Dengên tevgera kurd du beraber zêde bûn", Bianet, 15 hezîran 2011. Herçend di nivîsê de hin daneyên xelet hebin jî berhevdayîneke berfireh tê kirin.://bianet.org/bianet/siyaset/130751-kurt-politik-hareketinin-oyu-iki-katina-cikti

2 Daxuyanîya hilbijartinê ya AKPyê ku di 16 nîsan 2011 de hat aşkere kirin. http://www.akparti.org.tr/basbakan-erdoganin-2011-genel-secimleri-secim-beyannamesi-a_8075.html

3 Daxuyanîya hilbijartinê ya Hevgirtina Ked, Demokrasî û Azadîyê, http://www.bdp.org.tr/duyurular/secim2011/blk-secim-bildirgesi/blk-secim-bildirgesi.pdf

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

### FIROTINA SERHILDANAN LI EWROPAYÊ

# Gelo divê em pareyê deynan bidin?

DAMIEN MILLET Û ERIC TOUSSAINT *

Ji bo tesewirkirina deqîqeya diyarker, kêlîya ku nakokî diherikin navhev û îhtîmala "piştreyê" peyda dibe, konsepteke yewnanîyên berê hebû: Kayros. Ji dema ku xirecira darayî û malî derketiye holê, ya ku welatên ewropî yekî li pey yê din dide ber xwe, kêlîya serûbinîhevbûnê nêz dibe. Ji Atînayê heta bi Madrîdê hêrsa civakî zêde dibe: xwepêşandêrên ku meydanên bajaran dagîr dikin desthilatdarîya bankeyan û deynekî nerewa lê eşkere dikin. Li hemberî wan, lîberal cesaretê didin desthilatdarîyên rewabûna wan cihê nîqaşê ye da ku zûtir bikevin ser riya siyaseta hişk a malî, ango riya herî kurt a ber bi civaka ku ew xeyala wê dikin.

Berê, cîhana yekem hebû, "Bakur" ê ku weke blokeke dewlemend dihat nîşan kirin; cîhana duyem a welatên sovyetî û dawîyê, cîhana sêyem a ji welatên xizan ên başûr pêkhatî, welatên ku ji salên 1980yê ve jixwe di bin zordestîya *Fona Darayî ya Navneteweyî* (FDN) de bûn. Cîhana duyem li destpêka salên 1990ê li gel YKSSê ji hev bû. Krîza fînansî ya 2008ê rewşa cîhana yekem jî serobin kir; aniha, tu dabeşîya coxrafyayî ya minasib nemaye. Xelkê dinyayê tenê li du alîyan bi lêva dibe: Desteya kesên ku ji kapîtalîzma hevdem sûdê werdigirin û pirranîya ku ji ber wê êşê dikişîne - nemase ji ber mekanîzma deyn.

Di ber sî salên dawîn re, xelekên zirav ên zincîra aborîya dinyayî li *Amerîkaya Latînî*, li *Asyayê* an jî li cem welatên "di guherînê de" ên bloka Sovyeta berê peyda dibûn. Ji 2008ê ve, *Yekîtîya Ewropî* jî di bin şik û gumanan de ye. Li dawîya 2009ê, deynê derve yê welatên Amerîkaya Latînî % 23 yê Hasilaya Hundirîn a Xeyrîsafî (HHX) bû, lê li Almanyayê % 155, li Spanyayê % 187, li Yûnanîstanê % 191, li Fransayê % 205, li Portekîzê % 245 û li Îrlandayê % 1137 bû. (1) Diyardeyeke nedîtî ye.

Ne weke Dewletên Yekbûyî, ku dikarin li cem *Rezerva Federal*, nemaze bi riya derxistina diravê, pareyê nakît bistînin, welatên endam ên devera ***euroyî*** xwe ji aletekî bi vî rengî bê par hiştin: Statûyên *Banka Navendî ya Ewropayî* (BNE) fînansekirina rasterast a welatan li wan qedexe dikin. Lewre jî, li navbera 2007 û 2009ê de, dema ku ji bo "xilaskirina bankayan" dikevin tevgerê -bi mîktareke teva ya 1 200 mîlyar euroyên taahhut û misogerîyên cihê-, fînansmana wan girêdayî veberhênerên sazûmanî ye: Bi giranî fonên teqawidîyê, firmayên sîgorta û... bankayên ferdî.

Yek ji encamên nepayî yên krîzê jî jixwe ev bû ku bankavanên Ewropaya rojavayî, di serî de yên fransî û almanî, fonên ji hêla *Rezerva Federal* û BNEyê ve peydakirî bi kar anîn da ku li nav 2007 û 2009ê pêşkêşîya xwe li çend welatan (*Yûnanîstan, Îrlanda, Portekîz, Spanya*) zêde bikin û qezencên mezin li wir çêbikin. Ji xezîrana 2007ê (destpêka krîza subprîman) û îlona 2008ê (*iflasa* ***Lehman Brothers***), peydayên bankayên ferdî yên Ewropaya rojavayî ji Yûnanîstanê re % 33 zêde bûn, ji 120 mîlyar bo 160 mîlyar euroyan.

Li bihara 2010ê, di gel ku devera euroyî di heyameke bêistiqrarîya mezin de ye, BNE pereyan ji bo bankayên ferdî peyda dike, bi rêjeya nizim a % 1. Lê belê, heman banke ji welatên wekî Yûnanîstanê, heqeke pir bilindtir dixwazin: Di navbera % 4 û % 5 ji bo peydayîyên sêmehî û li derdora % 12 ji bo senedên dehsalî. Çawa jî daxwazên bi vî rengî rewa dikirin? "Rîska îflasê" ya li ser senedên vî welatî heye. Xeterek weha mezin e ku rêje pir bilind dibin: Gulana 2011ê, rêjeyên dehsalî derbasî % 16,5 bûn. Wekî din, ji bo ku bazara deynê xweser bêhtir "biherike", BNE aniha deynên bankeyên ferdî misoger dike û senedên dewletên ku, di prensîbê de, BNE rasterast parê peydayî wan nake, ji van bankeyan distîne.

Tevneke weha neewle gelo divê bê domandin û mayînde bibe? Eger banka heqekî ku "rîska îflasê" di xwe de vedihewîne, ji welatan dixwazin, sekinandina paredayînê û heta li dij derketina deynên nerewa gelo ne bi mentiqê ye? (2) Pirî caran, dema ku terciheke weha pêşniyar dibe, encama wê weke kaoseke mezin tê teswîrkirin: *"senaryoyeke bobelatê"*, li gor **Christian Noyerê** hikumdarê *Bankaya Fransayê*. (3) Lê ji bo xelkê, "senaryoya bobelatê" gelo ne bicihanîna bernameyên kemerşidandinê yên berê hatin xuya kirinê ne *(li hember bixwînin)*?

Heta tehlîlvanekî weke **Henry Kissinger**, kevnewezîrê karên derve yê amerîkî û gumanên hestyarîya ji bo cîhana sêyem li ser wî tunene, li 1989ê behsa planên dûzkirina tevnî yên li ser welatên latînî-amerîkî ferzkirî dikir û digot: *"Hikûmeteke demokratîk nîne ku dikare sertîya domdar û şidandina budceya xizmetên civakî yên sazîyên navneteweyî dixwazin ragre"*. (4) Bi taybetî ji ber ku beşeke peydayên berê bi xêra peydayên nû tê dayîn, bilindbûna deyn jî tevî paredayînê dewam dike: li 2009ê, ixtidarên dewletî yên welatên di pêşketinê de deynê xwe yê 1970yê bi qasî 98 caran dabûn, lê belê di vê navberê de, deynê wan 32 qat bilind bûbû.

Hikûmetên ewropî naxwazin qerarên siyasî yên ji bo guherîna vê rewşê pêwîst bidin û lewre jî nifûsên xwe bi heman riyê ve dibin. Lê belê, hem ji bo bakur û hem ji bo başûr jî, alternatîvek heye. Di deh salên dawîn de, hin welatan biryara sekinandina paredayînê û betalkirina beşeke deyn jî girt: *Arjentîna* li 2001ê *(bi xêra cemidandina sê salan a paredayînê, wê li 2005ê kêmkirineke ji nîvê bêhtir a deynê xwe li ser deyndarên xwe yên ferdî ferz kir)* û demeke berê, *Ekwadorê* jî weha kir *(çarçoveyê bixwînin)*. Kaos jî çênebû: *"Teorî jî û pratîk jî nîşan didin ku xetera girtina henefîya kredîyê hat mezin kirin"*, **Joseph Stîglîtz** ê seraborînasê Bankaya Cîhanê ji 1997ê heta 2000ê encam derxist. (5) Li nav 2003ê û 2010ê, rêjeya mezinbûna salane ya naverast a *Arjantînayê* % 8 zêdetir bû. Weha dixuye ku cemidandina paredayînê tofana *Kasandrayên* deynan pêş dîtibû bi xwe re nayîne. Gelo ev cemidandin jî rewa ye?

Ji bo ku bi peymaneke peydayîyê ve girêdayî bibe, dive dewletek destûra xwe bi azadî bide. Pêwîstîya paredayîna deynan jî vê destûrê tê. Lê belê, ev prensîpeke teva nîne: Ew di bin şertên hiqûqa navneteweyî de dixebite. Maddeya 103yê a Qanûna NYê jî weha dibêje: *"Eger li navbera pêwîstîyên endamên Neteweyên Yekbûyî yên li gor vê qanûnê û pêwîstîyên wan ên li gor her çi peymaneke navneteweyî ya din nakokî hebe, pêwîstîyên pêşî serdest in"*. Hinek ji van pêwîstîyan jî di maddeya 55ê a qanûnê de hene: *"Bilindkirina astên jîyanê, xebitandina tevahî û şertên pêşketin û pêşxistina aborî û civakî"*.
Gelo "planên alîkarîyê" yên *Komîsyona Ewropî*, BNE û FDNê ji bo welatên di zehmetîyê de saz kirin (bi mebesta ku bikaribin pareyê deynderên xwe bidin) li gor van pêwîstîyan in? Li 2009ê, kêmkirineke mesrefên dewletî ya bi qasî % 15 HHXê, nizmbûneke meaşa memûran a %20, kêmkirineke mîkdara meaşên malnişînîyê ya % 10 (ku jixwe çend meh bi şûn ve bi dijdestûrî hat mehkûmkirin), her weke girtina dibistan û nexweşxaneyan li ser *Letonya* hat ferz kirin. (6) Lê belê, li 1980yê, Komîsyona Hiqûqa Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî weha îlan dikir: *"Nabe ku dewletek dibistan, zanîngeh û mahkemeyên xwe bigre, polêsê xwe betal bike û girîngîya pêwîst nede xizmetên dewletî, heta ku nifûsa wê bi bêîtaadî û anarşîyê re rû bi rû bimîne, bi tenê da ku fonên muhtac ên ji bo pêwîstîyên deyndarên biyan ji xwe re peyda bike"*. (7)

Qewla Wiyanayê ya 1986ê, ku qewla 1969ê ya li ser hiqûqîbûna peymanan (8) temam dike, xirabîyên destûrdayînê yên cihê ku dikarin peymaneke peydayîyê bidin îptal kirin rêz dike. Maddeya 49ê li ser "xapandinê" ye: *"Dewletek an rêxistineke navneteweyî ku bi riya sextekarîya dewletek an rêxistineke xwedî para muzakereyê peymaneke îmze kiribe, dikare xapandinê weke sedema xirabîya destûrdayîna wê ya ji bo girêdana bi peymanê ve nîşan bide"*. Gelo ji ber cudahîya mezin a li nav axaftina wê û rastîya wê, mirov nikare helwesta FDNê weke xapînok û sextekar nîşan bike? Maddeya 1em a statûyên Fonê armanceke wê weke *"hêsankirina belavbûn û mezinbûna bi aheng a bazirganîya navneteweyî û bi vî awayî, ji bo bicihkirin û parastina astên bilind ên xebatê û dahatên rastîn kar kirin, her weke ji bo pêşdexistina kanîyên berhemdar ên hemû dewletên endam, armancên sereke yên siyaseta aborî"*. Bilindbûna bêkarîyê, daketina dahatan û ferdîkirin: Biryarên ku ev sazî li ser welatan ferz dike, pir caran rewşeke tam cuda derdixîne holê. Gelo mirov jî dikare behsa destûrdayîna azad a dewletekê, dema ku spekulatorên bazarên fînansî, Komîsyona Ewropî û FDN bi hev re êrîş dibin ser wê?

Rêza sedemên ku dikarin qefilandina paredanê û heta şermezarkirina tevahîya deynên nerewa jî meşru bikin, pir dirêj e. (9) Ev jixwe çend meh in ku terciheke bi vî rengî berbiçav bû, heta li nav spekulatoran jî. Li gor bankayên ticarî **Morgan Stanley** û **JP Morgan**, bazar ihtîmala parenedayîna deyn ya Yûnanîstanê % 70 dihesibînin (du meh berê, % 50 bû).

Pareder jî bi vê diyardeyê hesiyan. Bankeyên fransî ku ji ber fikira hûrkirina paredayînê an jî kêmkirina nirxa deynên wan (di çarçoveya muzakereyeke nû ya îro ji hêla Berlînê ve tê parastin) meraqdar in, li 2010ê pêşkêşîya xwe ya li hemberî deynê xweser a yûnanî kêm kir: Ev ji 19 derbasî 10 mîlyar euroyan bû. Bankeyên alman jî bi heman rengî tev geriyan : angajmanên wan li nav gulana 2010ê û sibata 2011ê, ji 16 kêmî 10 mîlyar euroyan bûn. Bi hêdîka, sazîyên giştî yên weke FDN, BNE û hikûmetên ewropî cihê bankevan û veberhênerên ferdî digrin. BNE xwedîya 66 mîlyar euroyên senedên xweser ên yûnanî (yanî % 20 deyna dewletî ya welêt); FDN û hikûmetên ewropî heta niha 33,3 mîlyar euroyan jî peydayî wê kirin. Heman pêvajo ji bo Îrlanda û Portekîzê jî dest pê kir. *"Ev tê wê maneyê ku eger vesazkirin çêbibe, bacder -û ne veberhênerên ferdî- ê parê mesrefan bidin* (10)*"*, *New York Times* bi kurtasî şirove kir. Gelo em bi rastî dixwazin bi vê riyê de herin?

* Berdevkên CADTM Fransa û serokên Komîteya ji bo betalkirina deynê cîhana sêyem (CADTM Belçîka). Ev nivîs ji pirtûka ku wan nivîsand hat derxistin, La dette ou la vie [Deyn an Jîyan], Aden/CADTM, Brûksel, 2011.

1 Hêjayî derbirînê ye ku tevî istîqrarbûna wezna relatîv a deynê derveyî yê dewletî li welatên di pêşketinê de, wezna deynê dewletî ya hundirîn pir bilind bû. Bixwînin Renaud Lambert, "Dette d'hier et dette d'aujourd'hui" ["Deynê dohî û ya îroyîn"], *Manière de voir* hjm. 113, cotmeh-mijdar 2010

2 Bixwînin Laurent Cordonnier, "Un pays peut-il faire faillite?" ["Gelo welatek îflas dike?"], *Le Monde diplomatique*, adar 2010

3 Ji hêla Ingrid Melander û Paul Taylor, "Mises en garde sur un possible reprofilage de la dette grecque" ["Hişyarî li ser veşikkirineke pêkan a deynê yûnanî"], Reuters, 24 gulan 2011

4 Ji "Bush y la deuda latinoamericana" ["Bush û deynê latînî-amerîkî"], *Clarín*, Buenos Aires, 8 sibat 1989 Vegotî ji hêla Miguel Angel Espeche Gil, *La Doctrina Espeche. Ilicitud del Alza Unilateral de los Intereses de la Deuda Externa*, Instituto Hispano-Luso-Americano de Derecho Internacional, Kongreya 15emîn, 23-29 nîsan 1989, San Domîngo (Komara Domînîkî)

5 Barry Herman, José Antonio Campos û Shari Spiegel, *Overcoming developing country debt crises [Derbaskirina krîzên deynan yên li welatên di pêşketinê de]*, Oxford university press, Oxford, 2010

6 Bixwînin Philippe Rekacewicz û Ieva Rucevska, "Aucun vent de panique, mais… " ["Panîk nîne, lê... "], *Le Monde diplomatique*, îlon 2009

7 Salaneya Komîsyona hiqûqa navneteweyî ya RNY (ACDI), 1980, Cild I, A/CN.4/SER.A/1980, r. 148

8 Qewla 1969ê li 1980î bi cih bû û ya 1986ê aniha di pesindkirinê de ye

9 Ji bo lîsteyeke teva, bixwînin Cecile Larmaque û Renaud Vivien, "Comment suspendre le paiement des dettes publiques sur une base légale" ["Bingeha zagonî ya ji bo qefilandina paredayîna deynên giştî çi ye?"], di *La dette ou la vie [Deyn an jîyan]*, şapître 20 û 21, Aden/CADTM, 2011

10 Landon Thomas Jr., "In Greece, Some See a New Lehman" ["Hin kes Yûnanîstanê weke Lehmaneke nû dibînin"], *The New York Times*, 12 xezîran 2011

Wergera ji fransî: Simko Destan



AJIYAN RODER DENGIZ (10 SALÎ)

Krîza deynî ya ku hin welatên ewropî da ber xwe, kete werçerxeke berê nedîtî: weke encama tercîha welatên deyndar a xilaskirina bankeyan, ev krîz desthilatdariya dewletê bi awayekî ji taqetê ketî dixe bin wesayeta dezgehên bi dengdana gerdûnî peyda bûne. Qedera gelên ji Yewnanîstanê, Portugalê û Îrlandayê êdî li parlemanan diyar nabe, lê belê li buroyên bankeya navendî, Komîsyona Ewropayê û Fona Darayî ya Navneteweyî IMFyê tê diyar kirin. Li benda hevgirtineke tevgerên civakî?

## Tirsa gelên Ewropayê

# "Bi xwestina hîvê bila rûyê we sor nebe: Ew e ya ji me re pêwist"

Serge Halimi

Ekonomîk lê herwiha demokratîk, buhrana ewropî çar pirsên bingehîn ji bo bersivdanê datîne ber me. Ev siyasetên ku têkçûna wan hatibû misoger kirin, çima dîsa jî li çar welatan *(Îrlanda, Spanya, Portugal, Yûnanîstan)* bi dirindeyîyeke berbiçav hatin bi kar anîn û meşandin? Gelo mîmarên van tercîhan pir xeyalperest in ji bo ku di her têkçûna –texmînkirî– wan a dermankirinê de dîsa jî wan teşwîq dike da ku dozaja derman deh caran zêdetir bikin? Di pergalên demokratîk de, gelo mirov çawa dikare îzah bike ku gelên bûne şeperzeyên van reçeteyan weke ku ti tercîha wan tinebe, ji bilî bicihkirina hukûmeteke nû ya ji alîyê îdeolojîk ve cêwîya hukûmeta berî xwe û dîsa bi biryardarî dikeve nav hewldana meşandina "terapîya şokê" ya biserneketî ya ji alîyê hukûmeta daxistî ve dihat pêk anîn? Pirsa dawî jî… gelo mumkun e tiştekî din bê kirin?

Bersiva du pirsên pêşî li ser me ferz dike ku li ser *"berjewendîyên giştî", "nirxên ji alîyê Ewropayê ve parvekirî",* û dîsa li ser *"jîyana bi hev re"* em xwe ji vegotineke reklamwarî rizgar bikin. Siyasetên tên pêk anîn, ne yên dînane, berevajî ne, têra xwe aqilane ne. Û bi piranî, ew digihîjin armanca xwe. Lê belê, divê bê zanîn ku armanca wan ne dawîlêanîna buhrana aborî û diravî, lê komkirina fêkîyên pir bi av ên buhranê ye. Buhraneke ku wê bi sedan hezar kesan ji karên wan bêpar bihêle *(li Yûnanîstanê, şûna ji her deh teqewidîyan neh wê vala bimîne),* heqdest û pereyên tatîla wan kêm bike, bi berdêleke pir erzan wê tevahîya aborîyê pêşkêşî berjewendîyên şirketên taybet bike, mafê kar wê bike mijara guftûgoyê, bacên nerasterast wê zêde bike, (yên herî neadil), fiyetên xizmeta dewletê wê zêde bike, pereyên ji bo fînanskirina dermankirinê kêm bike û di encamê de ew ê xeyala pêkanîna civakeke bazara serbest bi cih bîne. Ango ev buhran wê bibe firseteke zêrîn ji bo lîberalan; di rewş û demên asayî de, yek ji van tedbîrên tên gotin bi tenê jî, wê bibûya sedemê şer û pevçûneke bêhempa û şîlo; niha hertişt wê bi carekê de rû bide. Baş e, gelo wan wê çima bixwesta ku bigihîjin jêdereke ji tunelê ya ku ji bo wan dişibe otobaneke ber bi ***Xaka Waadkirî*** ve?

15ê hezîrana bihurî, rêveberên ***Irish Business and Employers Confederation*** (IBEC), rêxistina karsazên îrlandî, ji bo li gel nûnerên *Komîsyona Ewropî* hevdîtinan pêk bîne, diçûn *Brukselê.* Wan ji *Yekîtîya Ewropayê* (YE) xwest ku zextê bide ser *Dublinê* da ku beşek ji rêziknameya kar a îrlandî derhal were guherandin. Di dawîya civînê de, gerînendeyê têkilîyên pîşesazîyê û çavkanîyên mirovî yên *IBEC*ê, **Brendan McGinty**, ev daxuyanî da: *"Çavdêrên bîyanî dibînin ku rêzikên me yên têkildarî heqdestan li pêşîya afirandina îstîxdam, mezinbûna kar û kardanê asteng in. Halbû ku reformeke di radeyeke mezin de dikare bibe hêmaneke navendî ya bernameya ku kefîlîya YE û IMFê wergirt. Ne wext e ku hukûmet li pêşberî biryarên dijwar dudil bimînin û paş de gav bavêjin".* (1) Biryarên dijwar wê ne ji bo herkesî bin, madem ku ew ê bergeheke gelemperî bidin meyleke ku di nav sektorên bêserûber de ji mêj ve xwe daye xuya kirin: *Sînorê heqdestên kedkarên nû di van salên dawîyê de serê sedî 25 daket. Ev jî nîşan dide ku bazara kar bersivê dide* [heman nivîs] *buhraneke aborî û bêkarîyê".* (2) Bi vî awayî, levyeya deynê giran derfetan dide ***YE*** û ***IMF***ê ji bo ku bikaribin li *Dublîn*ê nîzama ku ji alîyê karsazên mezin ên îrlandî ve tê xeyal kirin, ferz bikin û bidin pêk anîn.

Ev rêzik weke ku li devereke din tê pêk anîn, ji ber ku çend rojan berî vê seredanê, 11ê hezîranê, yek ji edîtorên *The Economist*ê ev agahî dida zanîn: *"Yûnanîyên ji reforman ketine şik û gumanê difikirin ku ew ê bikaribin di nav buhranê de berê welatê xwe bidin ser riyeke rast. Ew bi bedengîya xwe heyranîya xwe nîşan didin ji bo bîyanîyên ku vîdayên hilbijartîyên wan dişidînin".* (3) Di heman hejmara kovara lîberal de, analîzeke plana kemberşidandinê ya ku ***YE*** û ***IMF*** li ser Portugalê ferz dikin hebû. *"Karsaz bi zimanekî pir vebirî û vekirî dibêjin divê ev welat bi tenê neyê hiştin. Perdro Ferraz da Costa, ê ku think-tankekê bi rê ve dibe, texmîn dike ku ti partîya portugalî wê di sî salên dawîyê de bernameyeke reforman a ewçend kokdar pêşnîyar nekira. Ew wekî din lê zêde dike ku divê Portugal nehêle firseteke wisa di ber re derbas bibe*." (4) Bi kurtî, bijî buhran.

### "Nexwendeyên" aborî heqê wê didin, ji ber ku difikirin ev berdêlek e ku diviya bidin çarenûsê

Ji bo karsazan Noela di havînê de. *"Hişmend an jî na, rêveberên siyasî hema hema bi temamî ketine bin xizmeta berjwendîyên rantxwuran*

Sî sal, kêm zêde temenê demokrasîya portugalî ye, li gel kaptanên xwe yên ciwan ên ku gel ew bi qerenfîlan dixemilandin ji bo spasîya xwe pêşkêşî wan bike, ji ber ku wan dîktatorîyeke bêdawî hilweşandibû, dawî li şerên kolonyal ên li Afrîkayê anîbû, soz dabû ku ew ê reformeke çandinîyê pêk bînin, seferberîya xwendin û nivîsandinê bidin dest pê kirin û di karistanan de deshilatîyê radestî karkeran bikin. Lê belê li miqabilê vê yekê, arizîkirina avê û posteyê ketin dewrê, dûre "reformên" lîberal ên malnişînîyê, tenduristîyê, perwerdê, û kêmkirina tezmînatên jikaravêtinê ketin dewrê û bi carekê bi paş de gav hatin avêtin; ev ji bo karsazan ***Noela*** di havînê de bû. Û şaxên dara çamê di bin giranîya diyarî û xelatan de wê hê xwe bitewîne, ji ber ku serokwezîr **Passos Coelho** soz da ku ew ê gav bavêje wêdetirî şertên ku YE û IMF li ser wî ferz dikin. Ew dixwaze *"surprîzê"* li muteşebîsan bike.

Aborîzanê amerîkî **Paul Krugman** vê rewşê wiha analîz dike: *"Hişmend an jî na, rêveberên siyasî hema hema bi temamî ketine bin xizmeta berjwendîyên rantxwuran – ango ketine bin xizmeta berjewendîyên kesên ku ji sermayeya xwe hatineke pir mezin bi dest dixin, ketine bin xizmeta berjewendîyên kesên ku berê gelek pere bi deyn dane, û niha bi li pêşîya hemûyên din girtina wan, di berdêla zirarekê de ew têne parastin".* Li gor **Krugman,** tercîhên kesên ku sermayeyê di destê xwe de digirin, xwe ferz dikin, eynî çawa ku *"ew di dema kampanyaya hilbijartinê de pereyan radizînin û dibin mafê têkilîdanîna li gel siyasîyên biryaran didin, li gel siyasetvanên ku wê dawîya dawî li ba xwe bixebitînin, kêlîya ku êdî berpirsîyarîya wan a siyasî ya têkildarî karûbarên gelemperî nemîne".* (5) Li dema gufûgoya ewropî ya têkildarî pere-terxankirina ji bo Yûnanîstanê, wezîrê awûsturyayî yê malîyê **Mark Fekter** texmînek kir û got: *"Hûn nikarin rê bidin ku banka feydeyan bi dest bixin; li demekê ku deynên mukelefan tên xira kirin".* (6) Kawikîyeke ku tesîrê li mirovan dike: Piştî dudilîyeke ku çil û heşt saetan dewam kir, Ewropayê hişt ku careke din "berjewendîyên rantkaran" xwe ferz bikin.

Bi qasî xuya dike, buhrana deynê zêde ji ber çerxên "kompleks" rû dide. Ji têgihîştina van çerxan re hêza nûkirinên berdewam ên mihendizîya malî divê: Berhemên zêdebûyî, prîmên îflasê *(CDSyên navdar an jî "credit default swaps"),* û hwd. Ev vegotina zêde zirav hewayekî giran dide analîzê an jî bêhtir dibe awayekî vegotinê yê ji bo derdora teng a "têkildarên", bêhtir ji feydekaran pêk tê. Ew dema bi zanebûn kaseyên xwe tije dikin, "nezanên" aborîyê ji berîka xwe didin, û bawer dikin ev çarenûs û qederek e. Niha em bi zimanekî hêsan bibêjin, ango em serî li vegotina siyasî bidin.

Di serdemên berê de, monarkên ewropî ji dukên *Venedîk*ê, ji bazirganên *Floransa*yê, ji bankavanên *Jenev*ê deyn distandin. Ti kesî nikaribû zorê li wan bike ku deynê xwe bidin; carna wan xwe jê muaf dikir û vê yekê jî pirsgirêka deynê gelemperî çareser dikir.… Pir pir paşê, desthilata ciwan a Sovyetê da zanîn ku ew ê deynên ku Çaran stendine û xwarine li xwedîyên wan venegerîne: Wê demê nifşên xwedî teserûf ên fransî hew dîtin ku *"deynên wan ên li rûsan"* ên bêqîmet di kewara wan de ne.

Lê belê navgînên din ên bêhtir karê zîrekîyê, bi kêrî sistkirina çerxa şidandî ya deyndêr hat. (7) Bi vî awayî, deynê gelemperî yê brîtanî di navbera 1945 û 1955ê de ji sedî 216ê hilberîna hundir a brut daket ji sedî 138ê, yê *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê*, ji sedî 116ê daket rêjeya ji sedî 66ê. Bêyî planake kember-şidandinê, berevajî. Helbet, geşedana aborî ya mezin ya piştî şer xweber beşa deynê di nav



Ciwancan Marasli (4 Salî)



MÎNA KADEM (10 Salî)

dewlemendîya neteweyî de daqurtand û ziwa kir. Lê belê hertişt ne ew bû. Lewre dewletan hingê nirxa binavkirî ya ku her sal kêm dibû, di asta eflasyonê de hesap dikir û berdêla wan dida. Gava deynekî bi rêjeya faîza ji sedî 5 a salane qeyidkîrî, bi berdêleke ji sedî 10 ji alîyê dewletê ve tê dayîn, ev tiştê ku weke *"rêjeya faîza reel"* tê bi nav kirin, dikeve bin sifirê –û li vir yê deyndar qezenc dike. Bi rastî jî, ji 1945ê heta 1980yê hema hema her sal li piranîya welatên rojavayî rêjeya faîza reel daket bin sifirê. Encam: *"Sermayedaran pereyên xwe radizandin bankayên ku pere bi rêjeyeke li binê ya enflasyonê bi deyn didan dewletan"*. (8) Deynê gelemperî hingê bêyî zehmetîyeke mezin ji holê radibû. Li *Dewletên Yekbûyî*, rêjeyên faîzê yên reel ên li bin sifrê bi wî awayî di deh salên navbera 1945-55ê de her sal feydeyeke diravî ya bi berdêla ji sedî 6.3yê hatina salane ya nateweyî li xezîneya amerîkî zêde dikir. (9)

Baş e, çima *"kesên pere radizandin"* ev şelandina li dijî xwe qebûl dikirin? Ji ber ku li ber wan rêyeke din tinebû. Ji ber kontrola pereyan û herwiha neteweyîkirina bankayan, ti rêyeke din li ber wan nedima ji bilî ku pereyên xwe radestî dewletê bikin, ji ber ku dewletê jî xwe bi wî awayî fînanse dikir. (10) Hingê ji bo dewlemendên taybet kirîna cihên spekulatîf ên brezîlyayê li derveyî îmkanan bû; cihên ku li ser veguherîna siyasetên soyayê ji bo sê salên dahatû endekskirî... Tiştên ji bilî vê weke rê du tişt li ber wan diman, yek jê di berbanga devaulasyonekê de, bi valêzan revandina pere û zêran ji *Fransayê* ber bi *Swîsreyê*, an jî li nêzî serdemeke hilbijartinê ya ku mumkun bû çep tê de bi ser keve. Lê belê tehlûke hebû ku sextekar biketana zîndanê jî.

## Gelî fêm kir ku ew ê tu carî têra ku dilê sîstemê pê bişewite, xizan nebe

Bi salên 1980yê re, dekor serûbin bû. Dema ku nebûna azadîya livûtevgerên sermayeyê, sermayedar neçar dihiştin ku rêjeyên faîzên reel ên neyînî bilind bikin, sînorê guhêrbar a heqdestan piranîya xebatkar ji encamên enflasyonê diparastin. Ji niha û şûn ve rewşeke berevajîyê hingê wê derkeve holê.

Sînorê guhêrbar a heqdestan hema hema li her derê ji holê radibe –li Fransayê, aborîzan **Alain Cotta** ev biryara girîng a ku di 1982yê de hat wergirtin, weke *"Dana Delors"* bi nav bike (ji bo karsazan). Li alîyê din, di navbera 1981 û 2007ê de, cinawirê heft serî yê enflasyonê perê baskên wî dadikevin û rêjeyên faîzên reel hema hema hertim dibin erênî. Bi sûdwergirtina ji lîberalîzasyona geryana sermayeyê, "xwedîyên danhevan" (em dest nîşan bikin ku li vir ne teqewidîya Lîzbonê ne jî karmendê Selanîkê mijara gotinê ne …) dewletan dixin nav pêşbazîyê û, li gor gotina navdar a **François Mitterrand**, *"ew ji xwe re radizên û pereyan qezenc dikin"*. Xelata xeter ya bêyî ketina nav xeterê! Gelo bi rastî jî lazim e ku em bibêjin, ji sînorê guhêrbar a heqdestan bi rêjeyên faîzê yên reel ên li bin sifrê derbasbûna ber bi daketineke bileztir ya hêza kirînê bi tezmînkirineke sermayeyê ku difire, dibe sedemê bi tevahî hilweşîna nîzama civakî?

Lê belê, bi qasî ku xuya dike, ev ne bes e. Li nav çerxên ku êdî li dijî xebatê sermayeyê teşwîq dikin, ***"troïkayê"*** (Komîsyona Ewropayê, BCE, IMF) biryar da zext, gef û ultîmatom jî lê zêde bike. Dewletên ji ber ku bi comerdî çûn bi hewara bankayan, jarketî, niha lave dikin ji bo kredîyekê da ku xwe bigihînin dawîya mehê; di navbera xelîl û celîl de ne, ewê an reçeteya lîberal qebûl bikin, an jî îflasê. Tevahîya Ewropayê ku heta doh jî li dijî dîktatorîyên **Salazar**, **Franko**, kolonelên yûnanî şerekî dijwar dimeşand, niha dibîne ku li nav refê wesayeteke hatiye daqurtandin û winda bûye ku ji alîyê Bruksel, Frankfûrt û Waşîngtonê ve tê bi rê ve birin. Wezîfeya bingehî: Dana deynên bankayan.

Hukûmetên van dewletan li cihê xwe dimînin, lê belê tenê ji bo çavdêrîkirina li pêkanîna fermanan û wergirtina xezeba gengaz a gelên xwe yên ku êdî têgihîştine ku ew ê ti caran têr xizan nebin bi qasî ku pergal gunehê xwe bi wan bîne û li wan xwedî derkeve. Rojnameya ***Le Figaro*** wiha dinivîsîne: *"Piranîya yûnanan wesayeta butçeyî ya navneteweyî dişibînin dîktatorîyeke nû ya piştî ya kolonelan ku ji 1967ê heta 1974ê bû bela serê vî welatî"*. (11) Çawa mirov dikare xeyal bike ku ramaneke ewropî wê bi hevkarîya kesekî kirasê dînan li xwe kiriye, mezin bibe; li gel mubaşîrekî ku bi ser girav û peravên wê de girtiye ji bo ku wan bifiroşe şirketên taybet? Ji sala 1919ê û ***Peymana Versaillesê*** û vir ve gelo kî nizane ku hesteke wisa ya piçûkxistina gelekî dikare zîncîrên nasyonalîzma hilweşîner bişkîne?




ROZÎN DÎJLE (6 Salî)

Bi taybetî jî ji dema ku provokasyon her diçe zêdetir dibin. Gerînendeyê bê yê BCE, **M. Mario Draghi**, yê ku weke selefê xwe wê talîmatên "kember-şidandinê" bide Atînayê, alîkarê serokê **Goldman Sachs** bû dema ku vê bankayê alîkarî dida rasta yûnanî ji bo ku pê re hesabên wê yên gelemperî ji raya giştî veşêre. (12) ÎMF ya ku ew jî li ser destûra bingehîn a fransî xwedî awirek e, ji Parîsê dixwaze *"rêzikeke dengeyê ya malîyeyên dewletan"* bixe dewrê; **Nicolas Sarkozy** wê rêzikê bi kar tîne. Ji alîyê xwe ve, Fransa dide zanîn ku ew ê kêfxweş bibe, eger mîna hevalbendên xwe yên portugalî, partîyên yewnan jî *"bibin yek û hevgirtinekê pêk bînin"*; serokwezîr **François Fillon**, weke **José Barroso**, serokê *Komîsyona Ewropî*, jixwe hewl dane der barê mijarê de pêşengê rasta yûnan **Antonis Samaras** îqna bike. Ji mêj ve serokê BCEyê **Jean-Claude Trichet** xeyal dike ku *"rêveberên ewropî bibin xwedî mafê vetokirina hin biryarên siyasî-aborî yên neteweyî"*.

*Honduras*ê herêmên azad ên ku serwerîya neteweyî lê nayê pêk anîn, afirandin. (13) Ewropa jî niha *"mijarên azad"* (aborî, civakî) pêk tîne û der barê wan de guftûgoya navbera partîyên siyasî de jî ji holê radibe, ji ber ku qadên serwerî li wan sînorkirî ye an jî qet lê nîne mewzû behs in. Guftûgoya navbera partîyan êdî li ser "mijarên civakî" hûrûkûr dibe: Burqa, qanûnîkirina heşîşê, radarên li ser rêyên bingehîn, polemîka rojê ya têkildarî hevoka tengezarker, jesta ecêb, sixêfa siyasetvanê qebe an jî hunermendekî serxweş. Ev rezîlîya bihevrebûnê rengekî fermî dide meyleke ku ev ji du deh salan û vir ve xwe dide hîs kirin: Veguhestina deshilata siyasî ya reel ber bi deverên ku ti giranîya demokrasîyê lê tune. Heta roja ku hêrs û nerazîbûn difûre. Em niha gihîştine qonaxeke wisa.

## Daxwazkirina "nemumkin" di wê demê de ku lîberal di ber xwe de bi dilxirabî dikenin û ya ku mirov hew karibe hilgire pêk tînin.

Lê belê hêrs û nerazîbûn bêyî serwextîya ji çerxên ku wan difûrînin, nagihin ti encamê. Halbû ku çareserî –berê xwe bizîvirînin ji siyasetên diravkarî û dij-eflasyonîst ên ku "buhranê" kûrtir û xirabtir dikin, beşeke deynan ji holê rakin, dest deynin ser bankayan, pereyan hefsar bikin, dev ji globalbûnê berdin, bi sedan milyar ewroyên ku dewletê ji ber daxistina bacên neadil winda kirine, paş de bistînin *(di deh salên dawîyê de 70 mîllyar bi tenê li Fransayê)* – tên zanîn ka çi ne. Û mirovên ku hostetîya wan a di warê aborîyê de qet jî ne kêmî ya **Trichet** e, lê xizmeta berjewendîyên ew xizmeta wan dike nakin, ji her alîyî ve çareserî bi kitekit îzah kirine. (14)

Îca, ya li vir ne guftûgoyeke "teknîk" û diravî ye, lê belê pevçûneke siyasî û civakî ye. Bêguman, lîberal wê di ber xwe de bigirnijin û kenê xwe bi wan bikin gava ku kesên pêşverû dikevin pey tiştên ne mumkun. Lê belê, wekî din, ew dikarin ji bilî têkbirin û çareserkirina rewşa kambax çi bikin? Bi her halî niha êdî wext e ku em şîreta navdar a ku **Jean-Paul Sartre** ji **Paul Nizan** re digot, bînin bîra xwe: *"Bi xwestina hîvê bila rûyê we sor nebe: Ew e ya ji me re pêwist"*. (15)

1 "IBEC in Brussels on concerns about reform of wage rules (IBEC li Brukselê der bare mijarên li ser reformên qaîdeyên mûçe de)", IBEC, 15 hezîran 2011

2 *Ibid.*

3 Charlemagne, "It's all Greek to them" (Çarlê Mezin, "Ji bo wan hemû yewnan in"), *The Economist*, London, 11 hezîran 2011

4 "A grim inheritance (Mîrateyeke xeddar)", *The Economist*, London, 11 hezîran 2011

5 Paul Krugman, "Rule by rentiers (hukmê rantxwuran)", *The New York Times*, 10 hezîran 2011

6 *International Herald Tribune*, Neuilly-sur-Seine, 15 hezîran 2011

7 Binêrin: "The Great Repression (Represyona mezin)", *The Economist*, London, 18 hezîran 2011, dîroka vê çerxê hûr û kûr vedibêje

9 Ibid.

10 Binêrin: Pierre Rimbert, "Nous avons eu le pouvoir, maintenant il nous faut l'argent" ("Em bûn xwedî desthilatî, niha jî me pêdivî bi pereyan heye"), *Le Monde diplomatique*, nîsan 2009

11 *Le Figaro*, 16 hezîran 2011

12 *Li ber bigire:* "Qezenca hertim neheq hertim bi kêrî (Goldman Sachs) tê", *Le Monde diplomatique*, adar 2010

13 Bixwînin: Maurice Lemoine, "Bajarên taybet ên li nava dahl û devîyan", *Le Monde diplomatique*, hezîran 2011

14 Li ser her yek ji van mijaran, *Le Monde diplomatique* ev du sal in, gelek pêşniyar weşandin. Hûn ê herwiha vê nivîsê bixwînin: "Manîfestoya aborîzanên ecêbmayî", http://atterres.org/?q=node/1

15 Pêşgotina Jean-Paul Sartre ji bo *Aden Arabie*, Maspero, Paris, 1971

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Ji meydana Tehrîrê heta Puerta del Solê, tevgerên civakî yên van mehên dawîn fermana likar a dadgehê ku xisleta bajarê neoliberal e, têk bir.

# Tevgera bêtevgeran

MAX ROUSSEAU *

Nakokîya efsanewî ya di navbera ***Wall Street*** û ***Main Street*** de, ku li Amerîkayê, li "kolana ereb" ji bo tevgerên protestoyê yên li Rojhilata Navîn û welatên *Mexrebê* li pey hev pêk hatin, dest nîşan bike, ku jê re "desthilata kolanê" jî tê gotin, ji bo kortejên pir ên xwepêşanderan li Fransayê bi bîr bîne, ji nû ve geş û gur bû: Metafora kolanê ji bo behskirina gelê li hember bêdadîya nû ya civakî seferber bûye, di qada navneteweyî de deng vedide. Herwiha, kolektifa spanyolê! ***Democracia Real Ya!*** *(Ji bo demokrasîyeke rastîn aniha!)* ferman dide yên ku xwe weke mexdûrên bindest ên desthilat û dewlemendîyên olîgarşîyeke bisînor, lê ji bo *"kolanê bigire" (Toma la calle)* bûye yek.

Bi sloganên ***"Acampa da Sol"*** *(Li Solê kom bibin),* ***"Toma la plaza"*** *(Cih bigre)* yan jî ***"No nos moveran"*** *(Em ê xwe tev nedin),* tevgera spanyolê ya 15ê gulanê tevî vê jî kolan weke cîyekî fizîkî bikar nanî (kolan weke qadeke kombûnê ya berî tevgera hevbeş) an jî cîyekî sembolîk ("kolan" weke cîyê lêhebûna bindestan) bi kar anî. Ew wê li hemberî rîskê radike. Ev bajarîbûna pirsên siyasî û aborî ji alî tevgera spanyolî ve alîyekî berbiçav ê din dide wan, ku herkes di cîh de li wan xwedî derkeve. Ew di heman demê de fikra tesbîteke siyasî ya hêsan, lê ronîker dide: Amadebûna kolektîf, aştîyane, lê dûvdirêj li ser cîyekî giştî, bi serê xwe weke kiryareke berxwedanê diyar dibe.

Têgihîştina vê têkilîya qada bajêr di tevgerên civakî de ji nû ve şikildana bajarê rojavayî ji alî du hêzên dîrokî yên ji hev nexweş, ango demokrasî û kapîtalîzmê ferz dike. Ya pêşî qebulkirina gerdûnî ya domdar a qada giştî dixwaze; ji ber ku ew ji alî meyla ya diduyê ya maksîmîzekirina herikînê li ser navê lêgerîna berdewam a tevgerê ve tê tehdîd kirin.

Tevgera ***haussmannî*** ya ji bo lihevanîna paytexta fransayê bi "*kêmkirina qad û demê* (1)" re, ku rêbaza rejimeke zordest û lîberal nîşan dide û kapîtalîzm xwe pê xwedî dike, di dîroka bajarvanîya rojavayî de weke werçerxekê xuya dike. **Baron Georges Eugène Haussmann** bi rastî jî, di nîveka sedsala XIXê de, têgeheke nû ya bajarî ku dê bi awayekî pir berfireh belav bibe û ku mirov dikare wê weke *"makîneya bitevger"* bi nav bike, xiste rojevê. Di nav du dehsalan de, ew kolanên lihevgerîyayî yên heyama navîn hemî hilweşandin, ew kirin navenda aborî û civakeke pir nêzîkî hev û bulvarên fireh ji bo lezandina herikînê di çarçoveya bajarekî de; ji alîyê din ve bi riya pêşxistina tora riyên hesinî rê li ber girêdana wan bi kevîyên bajarên mezin ên fransî ve vedike. Hîn ku bankgêrên mezin nû bilind dibûn û bajarvanî bi awayekî pir bikar fînanse dikirin, tayeke spekulatîf bi parîsîyan girt. Bihayê firotina xanîyan ji yê bikaranîne zêdetir bû. Di dawîya *"dema barîkadan"* de, karkir bigirseyî veguhestin kevîyên paytextê, lê burjuwazî li navendê bû xwedîya avayîyên nû û herwiha ya bulvarên ku êdî weke cîyê mezaxtinê yê zengînan e jî. Komuna ku di 1871ê de, di nav xwînê de hate pelixandin, dikare hinekî jî weke taktîkeke serîhildanê ya mebesta wê -bêyî ku bi ser keve-, guherandina berê pêşketineke wiha ya maneya bajêr jî were analîz kirin.

## "Bajarê ku qezenc dike" qadeke herikînê ya berdewam e

Di destpêkê de, ev têgeha bajarvanîyê bi awayekî giştî berfireh nebû. Pêşketina skeleta bajarvanîya ewropî wê gavê li ser pêşketina senaîyê bilind dibû. Sermîyanên senaîyê kêmtevger in û sûdjêwergirtina kargehekê, ji bikaranîna wê ya ji bo demeke dirêj tê. Pêkanîna sermîyanê senaîyê wê gavê pêdivîya xwe bi xizmetên berdewam ên renca destê karker a pir heye. Kapîtalîst bajarê senaîyê weke cûre *"kuneke reş"* ava dikin ku tê de renceke destî ya her ku diçe dûr dibe, dibîne ku bi rêze teşwiqinan tê kişandin, paşê tê sabît kirin. ***Les Company Towns***, weke ***Le Creusot*** li Fransayê yan ***Colònia Güell*** li Spanyayê, weke nimûneyên serekî yên vê bajarvanîya bêtevger xwiya dikin. Başbûn û pêşketina lojmanan, avakirina navgînên hevbeş, pêşkêşkirina xizmetên nû: Karkerê nêzîkî kargeha "xwe" bicîbûyî, divê neçe cîyekî din nebîne. Li hember vê, zext li serserîtîyê tê kirin, lewra ew cureyê mînak e ku nayê kontrol kirin û weke potansîyel jê tê vegirtin, û hêza dewletê jî bi qendê patronan jê dipelikêne.

Tevî vê jî, di nîveka sedsala XXê de, pêşketina bi digel tirimbêla girseyê û bajarvanîya hevdem ku pêk hat, tevger zêde bû. Lê ev tevgereke di bin kontrolê de, rûtînî, di navbera malê (li derdorê) û kar (li navenda bajêr) de bû. Berfirehbûna wê di salên 1950yê de, ji alî tevgerên dij-çandî yên weke ***"beat generation*** / *cîlê bextewer"* li Amerîkayê yan jî ***"les situationnistes"*** li Fransayê derket holê, ku serserîtî diparastin yan jî *"jirêderketin"* teşwîq dikirin.

## Ji salên 1970yê vir de, kapîtalîzma rojavayî ji nû ve kiras guhert

Ji salên 1970yê vir de, kapîtalîzma rojavayî ji nû ve kiras guhert; vê carê bi tesîra zêdebûna herikîna di asta cîhanê de û ji nû ve parvekirina navneteweyî ya karê ew dike. Bi pîvana ku sermîyan û karên senaîyê karibin cîh biguherin, têgeha bajarvanîyê jî weke *"kuna reş"* êdî bêmane bû. Li hember guherankarîyan derketin bi tevgerên dij-çandî yên bisînor û rûtîn ji alî medyayan ve ji armanca xwe tên bi dûr xistin û mezin kirin, ku êdî pesnê ferd didin "*ku bixwe muteşebis e"* û ew jî bê teredut astengên mekanî derbas dike ku jîyana xwe ya şexsî û pîşeyî ava bike. Ev biryar zerûrîyeta sistemeke nû, bihêzkirin herwiha jî tekrara çarçoveya –êdî cîhanî– cîguhastina wê nîşan dide. Makîna tevgerî, bajarê neolîberal ji bo mezinkirina berjewendîyan ku êdî ne di nav sînorên cografî de, ne jî li ser başkirina mercên jîyana tebeqeyên gelerî ne, radiweste.

## Termînalên balafirgehan, garên trênan, cîyên serekî yên têkilîyê, heta bi riyên dorûberê, bûlwar û galerîyên bazirganîyê, nav û nîşanên "bajarekî ku qezenc dike" ne

Bi pilankirina ***Defansê*** (Défense), sîteya senaîyê û karkeran a ku ji salên 1960ê vir de bi mebesta pêşwazîkirina navendên şîrketên herî globalbûyî bikin ji nû ve bi pêş ketiye, Parîs careke din xwe dike qereqola pêşî. Bi berfirehbûna mistewaya herikîna pir ku di *Defansê* (Défense) re derbas dibe, weke ku li hemberî bajarvanîyeke hatiye fikirîn ku wê bihêztir bike, tê. Weke ku fîlozof ***Zygmunt Bauman*** di gotara xwe ya *"mekanên giştî yên nesîvîl"* de şirove dike, li hewşa neserî, nebinî ku dilê taxê pêk tîne tu nîşaneke ku destûra lê sekinî li cîyên giştî bide kesên ku di wir re derbas dibin, tuneye (2): Awayê bitenê yê kirina wê ew e ku mirov awayê bikaranîna nêrdewana ***Grande Archeyê*** biguhere, çawa ku karker û tûrîst, rojên ku dinya xweş e, li ser pêlikên wê rûdinên û firavîna xwe dixwin. Cîyên bingehîn ên çûnûhatinê yên berdewam yên weke vê hewşê, herwiha jî termînalên balafirgehan, garên trênan, cîyên serekî yên têkilîyê, heta bi riyên dorûberê, bûlwar û galerîyên bazirganîyê, nav û nîşanên *"bajarekî ku qezenc dike"* ne. Birêveberên bajarên mezin ên ewropî vê fikrê parve dikin ku êdî bi mahna gurbûna rikeberîya navneteweyî li şarevanîyên navîncî jî belav dibe. (3)

Bi vê bîr û bawerîyê, xwedêgiravî radeya kêm a tevgera nifûsa bajaran a hejar, li hember mezinbûna bajarvanîyê weke asteng û li hemberî sazûmana giştî jî weke tehdîdekê tê dîtin. *"Kuna reş",* bajarê piştî senaîyê, ku êdî di navbera şarevanîyên metropolî de integre bûye, weke "jenîn"eke tevgera rojane ya niştecîyên xwe yên herdem û katî – turîstên ku herikîneke pirtir pêk tînin û hîn bêtir tên xwestin– zûtir bike, tê dîtin. Heta bi sêwirîna cîyên giştî yên bajêr ji binî ve hatiyê guhertin. Bi mahneya *"ewleyîya giştî"* û kêmkirina *"fersendên tawanî",* cîyên rûniştinê yên bajêr ku bi bicîhkirina *"dijminên bêtevger"* (*parsek, fahîşe, bêmal...*) tên tawanbarkirin, yên weke sekoyên giştî yên ji ber çavan wendabûyî, hatin hilweşandin. Firoşkarên kolanan, ku aborîyeke ne fermî di himêza herikînê de berfireh dikin, dibin armanca tacîzên polîs. Li Fransayê, qanûna ewleyîya navxweyî, ku di 2003yê de derket, li dijî girtina bi mişterîyan, civînên li holên avahîyan, dagirkirina avahîyan û parsekîyê tawan û cezayên nû afirandin. Ev pratîk heman taybetmendîya fizîkî, laşî dihewîne: Di navenda bajêr de bêtevgerîya mekanî pêk tîne.

## Bajar weke cîyê afirandina demokrasîyê

Bajar weke mekîneya bitevger ne wek hev e, heta dualî ye. Ji bo îqnabuna di vî warî de jî, bi tenê divê mirov li pirbûna avayîyên rûniştin û bazirganîyê yên navenda piranîya bajaran a di bîst salên dawîn de binêre: bûrjûwabûn, ku "biserketî" dibe sedemê yekdestîya wan, berî hertiştî bi bicîhbûna xwe ya di navenda herikînên bajarî de û her wiha soza wan a xwe gîhandina zû û bi awayên cihê ya kar, ya berxwerî û ya şayîyê tê ravekirin. Lê, ji bo yên "bibinketî", li pey balonên avayîyan çûn û xwe sirgûn kirina hin bihin dûrî girêbendên herikînan, tevgerîyan hin bi hin zelaltir weke astengekî, heta êşekê xuya dike. (4)

Gelo, bajar weke cîyê afirandina demokrasîyê dê çawa bibe? Ji agoraya atînayî vir de, qada bazarê û sîteya gotûbêjê, qada giştî weke cîyekî – sembolîk, lê herwiha jî, berîya her tiştî, fizîkî –ji nêzîk bi likarbûna baş a demokrasîyê ve girêdayî xuya dike. Ji ber vê jî, divê bi awayekî ku derfetê bide guhastin, parvekirin û hevdîtinê bê sêwirandin. Veguherîna wê ya weke qadeke tevgerên berdewam, bi rengekî pir darîçav karên civakgêrîyê, bi taybetî jî yên gelerî, û herwiha jî fikirîna gerdûnî ya berjewendîyan aloz dike.

Gotûbêjkirina bajêr weke makîneyeke bi tevger êdî weke mijareke nû derdikeve holê. Taktîkên nû yên pir ji hev cuda, armanca wan hêdîkirina kolanê ye û herweha elaqeya wê hem bi rizgarkirina kolanan ji tevgera ***Reclaim the Streetsê*** re heye ku îlhamê ji herêmên otonom ên katî yên anarşîst werdigire (5), hem jî bi awayekî bêhtir dezgehî, peywendîya wê bi şebekeya bajarên hêdî ***Città Slow*** re jî heye. Bixwe bêtevgerkirina di qada giştî de û bi xwedîlêderketina ji bo guhastin û afirandina pratîkên nû, kampgerên 15ê gulanê pêlikeke din a gîhaştinê di warê liberrabûna gelêrî ya bajarê neoliberal de li pey xwe hiştin. Ji krîza ji ber teqiyana baloneke xeyrîmenqulên neteweyî ya ku ev qederê sîh salan e ji alî siyaseta giştî ve tê nepixandin û ku ji xeynî biqende tilîyên destekî bank û grûbên mezin jê îstifade nekirin, derbeke mezin xwarî, ciwanên *"bê-tevgerkirî"* ji ***Bîlbao*** heta bi ***Málagayê*** nîşan da, ku ji sînorên spanî hîn wêdetir, maneya bajarî, îro ji her gav bêtir, ji bo siberoja demokrasîyê mijareke pir girîng û diyarker e.

* Doktorê zanyarîya siyasî, postdoktorantê bajarvanîyê li Ecole nationale des travaux publics de l'Etat (Vaulx-en-Velin).

1 **David Harvey**, The Condition of Postmodernity, Blackwell, London, 1989

2 **Zygmunt Bauman**, La Vie liquide / *Jîyana Şilavî*, wergera ji ingilîzî Christophe Rosson, Editions du Rouergue, Arles, 2006

3 **Vincent Doumayrou**, "Veut-on singapouriser la Flandre / *Em dixwazin Flandrê sîngapûrîze bikin?*" bixwîne, Le Monde diplomatique, nîsana 2010ê

4 **Gatien Elie**, **Allan Popelard û PaulVannier**, "Exode urbain, exil rural / *Koça Bajarî, Sirgûna Gundî*", Le Monde diplomatique, tebaxa 2010ê

5 **Hakim Bey, TAZ**. Zone autonome temporaire / *Herêma Otonom a Katî*, L'Eclat, Paris, 1997

Werger ji fransi: Yaqûb Karademîr

## Îrlanda

### Karmendîya giştî

-Kêmkirina mehaneyan heta ji % 15yê (bitaybetî di nav mamosteyan û hêzên polîsî de).

-Jêbirina 25 000 kadroyan (ji 250 000 kadroyan)

-Cemidandina girtina kar

-Kêmkirinên ji budceyê yên digihêjin heta 10 mîlyar euroyan, ji niha û heta 2014ê

Di 2010ê de, dahata dewletê weke 31 milyaran hatiye texmîn kirin.

### Xanenişînî

-Ji % 4 kêmkirina alîkarîya ji bo sektora giştî a salê di ser 12 000 euroyan re

-Temenê xanenişînîyê, di 2010ê de ji 65ê derket 66ê û di 2018yê de dê derkeve 68ê

### Parastina civatî

-Kêmkirina ji % 25ê budceya tenduristîyê û xizmetên civatî ji niha û heta 2014ê.

### Sîstema bacê

-Zêdekirina bacê ya hatinîyê

-Cîbicîkirina baceke ji bo karbonê, herwiha tiştên weke av û xwedîtîya mal û milk

-Bilindkirina BBZ (Baca bihayê zêde), di 2013ê de ji % 19,6ê heta ji % 21ê, paşê di 2014yê de heta ji % 23yê.

Mafê xebatê

-Kêmkirina mehaneya herî kêm ji % 11,6ê

Jêder:
Damien Millet û EricToussaint (birêveber), La Dette ou la Vie / Deyn an Jîyan, Aden-CADTM, Bruksel, 2011

## Portekîz

### Karmendîya giştî

-Cemidandina mehaneyan

-Li şûna du kesên xanenişînbûyî girtina kar a kesekî

-Kêmkirina mehaneyê li dor ji % 5ê ya 500 000 karmendên ku mehê mehaneyeke ji 1 550 euroyan zêdetir digrin û ya birêveberên sektora giştî

-Jinavbirina ji % 1ê meqamên birêveberîya navendî, ji % 2ê, birêveberîya xwecîh û herêmî

-Zêdekirina temenê qanûnî yê xanenişînê ji 62 salîyê bo 65ê

-Kêmkirina mehaneya xanenişînîyê ya mehê 1 500 euroyan (li ser hev dike 445 milyon €)

### Parastina civatî

-Kêmkirina hatiniya herî kêm a bêkarîyê

-Kêmkirina dem û mîqdara alîkarîyên bêkarîyê.

### Xizmetên giştî

-Di warê perwerdeya netewî û tenduristîyê de kêmkirna ji budceyê.

### Sîstema bacê

-Zêdekirina bacê ya li ser dahatê (ji % 1,5)

-Bilindkirina BBZ ji % 21ê heta ji % 23yê

-Zêdekirina baca şirketên ku hatiniya wan 2 milyon euroyî derbas dike (li ser hev dike 300 milyon €)

-Bilindkirina baca li ser malên xeyrî menqûl (300 milyon €)

-Bacbirîna ji alîkarîyên civatî (300 milyon €)

-Bacbirîna cixare, erebeyan û elektrîkê (400 milyon €)

Taybetîkirin

-Firotina gelek teşebusên neteweyî ji sektora vejen, guhaztin, ragîhandinê, heta ewlehîyê li ser hev 5,5 milyar €



CAN LAŞER ÇETINDAG (7 Salî)

# Hunera erebî a hemdem: Ji Charybdeya parêzvanîya dewletî ber bi Scyllaya bazarê ve

YVES GONZALEZ-QUIJANO *

Di gotarekê de ku di hezîrana 2010ê de di rojnameya lubnanî *Al-Safir* de hat weşandin, nitarê sûriyeyî Youssef Abdelki, rûyekî naskirî yê hunera erebî a hemdem, bi gotinên êrîşkar bela xwe di Khaled Samawi, xwediyê galerîya pêşangehan a Damasê Al-Ayyam, dida -tevî ku wî pê re kar jî kiribû**.** Hunermend, rexnegir û rojnamevan bi dorê gelek caran ketin nav guftûgoyê, bi giştî ji bo parastina wî yê ku bi saya peymanên bijarte bûye alîkarê veguhertina rewşa afirînerên ciwan. Bi wan peymanan, ciwanên afirîner dikarin xwe bi temamî bidin berhema xwe û ji bo cara yekê an diduyê, bibînin ku berhema wan li derveyî sînorên welatê wan tê pêşandan.

Digel alîyê wê yê bivênevê şexsî, vê polemîkê heq kir ku mîna li cihên din ên herêmê, li ser xwemalîkirina bilez a bazara hunerê ya li Suriyeyê, bi awayekî aşkere pirs bên kirin. Bi saya peydabûna tîpekî nû yê navbeynkaran, gelek hunermendan karî xwe berdin nav cazîbeya feydeyan. Feydeyên aborî jî tê de, wan di qada navneteweyî de teqdîreke mezin jî bi dest dixist. Lê yên din, di mînaka Youssef Abdelki de, bi qasî ku ji rexneyan xuya dibe, di nav demê de bêhtir pirsan ji xwe dikin û dibêjin gelo êdî pêşangehên weha, komserên pêşangehan û bi taybetî jî sazîyên mezin ên biyanî yên mezadê çi îfade dikin. Îcar, aniha ku di pergala fireh a spekulatîf a bazara cîhanê de jê re beşek hatiye veqetandin, gelo hunera erebî nakeve wê talûkeya ku dev ji kokên xwe berde û taybetmendîya xwe, ango nasnameya xwe winda bike?

Resimandina li ser sêpêyê ya "bi terzê ewropî", ku bi *Nahda* re derketiye holê, her tim cihekî cuda di cîhana hilberandina çandî de girtiye. *Nahda* tê hemwateya Ronesansa ereb a sedsala 19ê. Wextê ku mirovên wêjeyê di warekî pir teqdîrkirî de, ango di warê ziman de kar dikir, wextê ku mirovên dîmenê an jî muzîsyenan xîtabî girseyeke pir fireh dikir, hunermendên şêwekar jî, ku pir caran hilgirên formên estetîk ên kevneşopî bûn, li cem bijarteyên bajarî yên ku herî hesas bûn ji bandorên biyanî re, hema hema qet deng venedidan. Ji ber nebûna bazarekê ku karibe xweserîyeke biçûk di xebata wan de dabîn bike, îcar ew bi temamî bûn mecbûrî alîkariyan. Alîkarî jî bi giştî pir hindik bûn û ji alîyê sazîyên gel ve dihatin belav kirin. Ha ji ber vê yekê, an ew ê di nav terzê klasîk ê qure yê xeta fermî de bimana, ku bi saya wê, piçek be jî, karibin debara xwe bikin, an jî ew ê li gor pêdivîya herî mezin a artîstîk tevbigeriyana, ku ev jî dihat wateya marjînalîyê an jî sirgûna ber bi asoyên din ve. Ji xeynî van, li ber wan tu rê tunebûn. Heta van çaxan jî, di derdorên artîstîk ên dinyaya ereb de, mirov dikaribû rastî fîgurên dijber – lê di encamê de temamkerên hev – bihatana; fîgurên resamê karmend û yên hunermendê naletkirî. Li cem hunermendê naletkirî, yanî *sou'louk*, xetên bohem ên parnasî û bîranînên dûr ên êşqiyan -helbestvanê marjînal ku her tim çolên berê yên Erebistanê bi bîr tîne, têkilî hev dibûn.

Xwemalîkirina çandê, eger rê li ber mudaxaleyeke biçûk a desthilata gel negire –ku ev jî tê wateyeke pir cuda ji ber ku ew ê êdî ne di rewşa yekdestîyê de be–, di encamê de bi guhêrîn û demdemîtiyên li gor rewş û mercan parvekirineke nû afirand. Wek mînak, veguherînên sehneya çandî ya li Misira *infitahê* gelek sal beriya veguherînên li Sûriyeya Beşar El-Esed pêk tên. *Infitah*, ango "derîyê vekirî" ji veberhênana şexsî re, bi daxwaza Sedat di nîvçeya salên 1970yê de pêk hatibû. Hatina El-Esed a ser desthilatê, çarêk sedsal pişt re û ligel lezandineke mezin a teşebusên vebûna aborî, pêk hat. Di 1989ê de li Qehîreyê, rêxistina "Salona yekê ya ciwantîyê" ji bo pisporên mijarê heyameke artîstîk dest nîşan dikir, lê olanên sûriyeyî bi awayekî fermî di 2008ê de, bi saya pêşangeha "nifşê nû yê resamên sûriyeyî" bersiva xwe dît. Ev pêşangeh di nav çarçoveya "Damas, paytextê çanda ereb" de hatibû li dar xistin.

Tevî vê yekê jî, ev cudatîyên rîtmê bi tu awayî nihêrîna giştî naguherînin: Derketina holê ya pratîkên nû yên artîstîk bû sedema şkestineke misoger. Bi vî rengî, guftûgoyên li ser "huner ji bo hunerê ye?" an "huner ji bo gel e?" ji dema bihurî re hatin terikandin, bêyî ku sazîyên fermî yên ji dabînkirina qada çandê berpirs karibin gotinekê jî bibêjin. Guftûgoyên li ser van pirsan ji salên 1950yê ve her tim piştgirên razberîyê û piştgirên realîzmeke kêm zêde angaje û kêm zêde mîratgira kevneşopên cîgayî hejandibûn. Herweha li Misirê jî, ku Faruq Husnî ji 1987ê ve berpirsê wezareta çandê ye û herweha resam e, bi saya bandora pêkhênerên nedewletî, îfadeyeke nû ya plastîk xwe da der. Ev îfadeya nû bi awayekî wêrek zimanekî hemdem pejirandibû (hunera rêmanî, bikeyskirin, hunera vîdeo...). Bi pêşangehên nû wek El-Eyyam û Art House, li Sûriyeyê rewş bi heman awayî ye, heta hê zêdetir aşkere ye. Ev herdu pêşangeh di 2006ê de bi dildarî û navgînên heta niha nedîtî ji bo welêt hatibûn ava kirin.

Di nav salan de, nifşekî nû yê hunermend hem xwe, hem jî tevî xwe, lûgateke estetîk a durehî, melez jî bi zorê da pejirandin. Ev lûgat, li gor modela gelek formên cur bi cur ên artîstîk û hemdem, bi taybetî di warê muzîkê de, ji hemû çandên dinyayê peyvan digire, bêyî ku ji nasnameya xwe ya ereb zêde tawîzê bide –tenê dijraber ne di wê nihêrînê de ne–.

Hindik mabû ku em, ji ber marjînalkirina nihêrîna "azadker" a ku di wextê *Nahdayê* de hatiye pêş xistin, bawer bikin ku însiyatîva gel êdî bi temamî ji holê rabûye, lê qet ne wisa ye. Berevajî, ew her ku awayê sekna xwe ya herêmî û armancên xwe tecrûbe dike, ango her ku guherîneke dualî pêk tîne, pê re jî ji nû ve dizê û balê dikişîne ser dînamîka guherînê ya di warê artîstîk de. Mîrnişînên Kendavê alê ji destên ciwanên komarparêz ên di serxwebûnan de hilberandî, digirin û êdî şûna polîtîkayên çandî yên berê planên pêşvexistinê bi cih dikin. Ev planên pêşxistinê xwedî armanceke civakî û perwerdeyî ne, lê ev bi armancên din jî -belkî yên sereke- tên kirin: amadekirina aborîyên xwecih ji bo piştî-petrolê, di riya pêşxistina xebatên girêdayî tûrîzm û bazara luksê de ji bo curbicurîyeke pêwist a çavkanîyên xwe.

Emîrata "biçûk" Sharjah a ku di warê çandî de bi wêrekîya xwe, qet nebe li herêmê, tê naskirin, di 1993ê de bi çêkirina pêşangeha xwe ya dusalane ya hunera hemdem, di vî warî de rê vekir. Lê belê du cîranên wê, Abu Dhabî û Dubaî ne, yên ku ev bûyer berfireh kir. Van bi dehan salan pişt re, bi serfkirina bi sedan milyaran dolar, projeyên muhteşem ên çandî dan dest pê kirin. Di wan projeyan de, huner hem bi formên bavûkalan hem jî bi formên hemdem cihekî bingehîn digre.

Bes li ser girava Saadiyatê, li Abu Dhabîyê, tevî parkeke pêşanê û salonek ji bo hunerên xwepêşanê, ji mîmarên hemdem ên herî binavûdeng pênc muze hatin sparîş kirin. Îcar Dubaî, ya ku di 2007ê de yekemîn Fûara xwe ya Hunerê ya Kendavê (Gulf Art Fair) vekir, di bin vê de nema û alîyê bingehîn ê vê dînamîka nû ya çandî aşkere kir: dawetkirina dezgehên mezin ên şexsî yên bazara hunerê ya navneteweyî. Li gor armancên xwe, paytextê aborî yê Emîratan ji bo gavên teşwîqkirina milkfiroşên mezin ên navneteweyî, di serî de dezgeha Christie's qebûl kir ser axa xwe û vê dezgehê jî di 2005ê de şaxekî xwecih li wê derê vekir. Ev armanca Dubaîyê ji ya reqîba wê Abu Dhabî hê zêdetir darayî û siyasî bû. Salek bi dû ketina wê ya nav xebatan, vê dezgeha mezadê ya ku navenda wê li Londrayê ye, cîroyeke nelibendê pêk anî: 138 milyon euro. Ev reqam çar-pênc qat zêdetirî texmînan bû.

Piştî vê, Emîratan komek bispor, bazirgan, pêşangehvan, berpirsên hunerê, rojnamevanên ku ji bo kovarên mîna *Bidoun* an jî *Canvas* dixebitîn, ber bi xwe ve kişandin (di 2005ê de ji dema sîteya medyayan a Dubaîyê) û bûn pireke bazara navneteweyî ya hunerê. Di gava yekê de, ev tevger bi kêrî hunermendên hindî û îranî û hêjayên hoste yên wênesazîya erebî a hemdem hat: Di nîsana 2010ê de, di dema mezadeke Christies de, tabloyeke Mahmoud Saîd, hunermendê misirî yê di 1964ê de rehmetî bûyî, nêzîkî bi 2,5 milyon dolaran hat firotin. Ev meblaxeke rekor bû.

Lê helbet ji Maxrebê heta Maşriqê, tevahîya afirînerên ereb ên hemdem ji elaqeya berhevkar, bisporên bijartinê û veberdêrên mezin îstifade dikin. Wek pêşangeha bi navê "Unveiled: New Art from the Middle East" jî şahidîya wê dike, ku di sibata 2009ê de li pêşangeha bi navûdeng Saatchi ya li Londrayê hatibû li dar xistin, "berhemeke" nû ya di bin etîketên bi têkildarîya îslam û çanda erebî de tê firotin, êdî hem bala muşteriyên xwecih hem jî yên navneteweyî (herî zêde jî bikirên asyayî) ber bi xwe ve dikişîne. Îcar navbeynkarên xwecih bi hosteyî dest avêt vê modeyê û ev jî bû sedema ku fiyata berheman hilfire. Mesela li Sûriyeyê, bazareke ku demeke dirêj dûrî guherînên sehneya artîstîk a herêmî mabû, di van salên dawîn de, fiyatên berheman %300 heta %400 bilind bûn: berhemên ku berê çend sed dolar fiyat di wan dihatin dayîn, îro bi giştî di navbera 5 000 û 10 000 dolaran de tên firotin.

Ji bo hunermendan, bi taybetî ji bo yên ku wext û tecrûbeyên din dîtine, guherînên weha endîşeyeke mezin li ser siberoja pratîkekê peyda dikin ku, ji ber şertûmercên tertîpkirina wê ya di çaxa hemdem de, li dor sazîyên serbixwe yên wek dibistan an jî muzeyan pir kêm hatiye plan kirin. Esas encamên vê rewşê ji niha ve xwe didin hîs kirin. Berhemên zêde curetkar –wek mînak, berhemên tazî– hêdî hêdî di dîwarên pêşangehan de dimirin. Pêşangeh bi fikar in ku zêde muşteriyên dewlemend ên xwecih şok nekin. Lê esas divê mirov bikeve nav fikaran ku di nav bazara dinyaya ku ji aliyê dewlemendên Emîratên Kendavê ve hat fetih kirin, ketina bihayê, li ser hunera erebî a hemdem zêde nebe mal. Bi guncîna rihê cihên ku jê re îmkan dane, derkeve ser sehneya navneteweyî, belkî hunera erebî a hemdem, bi devjêberdana hemû erkên rexneyî, wê mecbûr bimîne destê xwe ji polîtîkayê bişo da ku bibe tiştekî ji rêzê yê luksê. Piştî Charybdeya parêzvanîya siyasî, bi awayekî, Scyllaya bazarê jî...

* Mamosteyê wêjeya erebî a nûjen li zanîngeha Lyon 2, lêkolîner di Koma Lêgerîn û Lêkolînên li ser Behra Spî û Rojhilata Navîn (Gremmo) de, nivîskarê bloga Çand û Polîtîkaya Erebî (http://cpa.hypotheses.org).

Wergera ji fransî: Aynur Bozkurt

## Li ser "wênesazên" vê hejmarê:

Wênesazên vê hejmara LMd-kurdî zarok in. Piranî ev wêne dema zarok 4-9 salî bûne hatine çêkirin, hin ji wan zarokan niha bûne 11 heta 14 salî. Zarok, piştî 4 salîya xwe hîn çalaktir dibin û li hember derûdora xwe hêdî hêdî fêrî tevgerandineke serbixwe dibin.


Di wan de têgeha estetîk û hişyarîya çandî xwe dide der. Helbet ev taybetmendî ji bo pêşveçûna zarokan girîng e. Ew hîn ji biçûkatîyê ve kreatîv in. Huner, ji bo wan ne berhem lê belê pêvajoyek e. Zarokên ku wêne çêdikin, hîn afirînêr û xeyalên wan dewlemendtir in.

Ango huner, girêdayî temen nîne. Zarok, hunermend û fîlozofên mezin in; ew zêde, ne di bin tesîra mirovan de ne, ji hunerê û ramanên çêkirî û fêrbûyî dûr in, tewanên wan hîn xwezayî ne.


Ew çavdêrên xwezayî ne; beşekî wênesazîyê heye jê re dibêjin "naîv" yanî "saf-arî-bêtesîrên zanyariyê": Zarok hemû wênesaz in, çi dibînin, çi di serê wan de diberiqe, wê yekê çêdikin, "arî ne, xwezayî ne". Me xwest em di vê hejmarê de cî bidin hunermendên xwediyên kevneşopiyên dîroka mirovahiyê, hunermendên "xwezayî".

Bi vê perspektîvê me hewl daku di hejmara xwe ya bîstan de em zarokan bikin mêvan. Em hêvî dikin ku ev yek wan hîn teşwîk û motîvetir bike.






BERFIN SILAN KEVIRBIRI (10 Salî)



DIJWAR SATIK (7 Salî)

www.arsivakurd.org

Axaftina wî ya ji bo salvegera mirina Ayetullah Xumeynî, 4ê hezîranê, ji ber qêrînên dijminane hat birîn; parlemanê li dijî diduyan ji şêwirmendên wî yên sereke lêpirsîn da dest pê kirin… Serokkomarê îranî Mahmûd Ehmedînecad bi êrişeke berê nedîtî re rûbirû ye ku ji aliyê melayan û rêberê şoreşê Ayetullah Elî Xameneyî ve tê bi rê ve birin.

### Rahiştina hev a li lûtkeya desthilatdarîyê

# Serokkomarê îranî li dijî melayan

Farhan Jahanpour *

Qebxwarina navbera rêberê inqilaba îslamî ya Îranê **Ayetullah Elî Xameneyî** û serokê tundrew **Mehmûd Ehmedînejad** di meha nîsanê de dest pê kir. Piştî ku serok Ehmedînecad wezîrê xwe yê îstîxbaratê **Heydar Moslehî** ji kar avêt, **Rêber Xameneyî**, wezîrê îstîxbaratê paşê li ser wezîfeya wî vegerand. Di destpêkê de ev bûyer dikaribû wekî cudatîyên navbera serekên *Cumhurî Îslamî* were paşguh kirin. Lê belê lihevnekirina aşkere ya navbera rêber **Xameneyî** û serok **Ehmendînecad** teşeya pevçûneke mezin girt ku ev yek jî veguherî yek ji mezintirîn dijwarîyên li pêşîya rejîma Îranê.

Pirsigirêk bi awayekî basît ne destkişandina wezîrekî diyarkirî ye, lê belê digihîje heta kakilka têkilîya navbera *serok* û *rêber*. Wekî encam, ev lihevnekirin rê li ber krîzeke mezin a destûrî vekir.

Destûra *Cumhurî Îslamî*, di nav xwe de gelek têgihên nakok dihewîne ku pêşî li ne-ahenghîyê vedikin. Ji alîyê din ve jî ji pergala Îranê re dibêjin komar, lê belê pergal li ser *Welayetê Feqî* anku li ser wesayeta meqama olî ya birêveber hatiye ava kirin, ku ev meqam li ser navê *Îmamê Wenda* deshilatdar e. (1) Destûra bingehîn hêzeke weha gelek mezin dide wî ku ji hemû dîktatoran zêdetir e. Ji ber ku her gotina *Welîyê Feqî* wekî gotina Xwedê tê qebûl kirin û dijberîya li hember wî wekî dijberîya li hember Xwedê tê dîtin, kesê ku li dij wî muxalefetê bike, layiqî girantirîn cezayî ye.

*Welîyê Feqî* xwedîyê wî mafî ye ku parlamentoyê belav bike û serokê dewletê erê bike yan ji kar bigire. Herweha ew serokê kar û barên dadî tayîn dike û bixwe jî serfermandarê artêş, *Zêrevanên Şoreşa Îslamî* (*Sûpay Pasdaran*) û polîsan e. Ew hemû meleyên înê yên bajarên mezin wezîfedar dike û bi vî awayî jî serkêşîya hemû rêxistina olî ya welêt dike. Hemû endamên Lijneya Çavdêrîya Destûrê (*Şûrayê Nîgahbanê Qanûnê Esasî*) ji alîyê wî ve tên hilbijartin. Hemû meleyên (*muctehîd*: meleyên ku li gor şerî'atê dikarin ictîhadê bidin) endamê Lijneya Bisporan (*Meclîsê Xebreganê Rehberî*) jî alîyê wî ve tên tayîn kirin, ku peywira vê meclîse ew e ku bi dorê çavdêrîya *Welîyê Feqî* bike û piştî mirina wî, yan jî heger *Welî* êdî nikaribe wezîfeya xwe bi cih bîne, xelefê wî hilbijêre.

## Dilsozîya bi pêşandana mezin re

Di pergalê de hilbijartinên serokatîyê û parlamentoyê guncan in, lê belê Lijneya Çavdêran divê ehîlbûna hemû namzedan ji bo wezîfeyê erê bike û lewma Lijne li dij namzedan xwedî mafê vetoyê ye û dikare biryarê bide ka kî dikare bikeve hilbijartinan û kî nikare. Di pergalê de parlamentoyek heye, lê belê dikare bi tenê di çarçoveya şerî'atê de qanûna derxe û divê hemû biryarên meclîsê ji alîyê Lijneya Çavdêran ve were erê kirin, ka ew li gor şerî'atê û destûrê ne yan na. Serokê meclîsê jî heye, lê belê xwedî hêz nîne ji ber ku Welîyê Feqî dikare biryarên wî biguherîne û pir caran dike jî.

Bi vî awayî, her çend pergal xwedî hemû rêgezên demokrasîyê ye jî di rastîye de pergaleke teokratîk a girtî ku li jêr serkêşîya *Welîyê Feqî* de ji alîyê meleyan ve tê bi rê ve birin. Di encamê de, ji dema **Ayetullah Xumeynî** û vir ve, hemû serokan wekî baskê birêvebir ê *Welîyê Feqî* tev gerîyan û serî li ber fermanên wî tewandin.

Ev pergal bi awayekî rêk û pêk ev sî sal in berdewam e. Di 1997ê de ji bo guherîneke mezin teşqele derket û hemû muxalefet ji **Muhemed Xatemî**, ku di kabîneya **Haşimî Refsancanî** de wezîrê çandê bû, xwest ku di hilbijartinên serokatîyê de bibe namzed. Wê demê **Xatemî** çû cem **Xameneyî** û jê pirsî ew dê li dij namzedîya wî derkeve heger ew bikeve hilbijartinan. **Xameneyî** jî, ku dixwest hilbijartinan har bike û nîşan bide ku di hilbijartinan de pêşbazîyeke adilane heye, îcaze da ku **Xatemî** namzedîya xwe deyne. Berevajîyê bendewarîyan, **Xatemî** piştgirîya piranîya xelkê wergirt, nemaze yên ciwan û jinên perwerde, û di 23ê gulana 1997ê de (2yê xordada salnameya îranî) wî piranîyeke berbiçav bi dest xist. Bi vî awayî, bi wî navî ku piştî vê serkeftinê lê hat danîn, *Tevgera **2yê Xordadê*** dest pê kir.

Xatemî û alîgirên wî hewl da ku pergalê ji nav wê bixwe de biguherînin û heta dereceyekê demokrasî anî pergalê, ku otokrasîyeke mutlaq bû. Wî bang kir ku li dij 'civakeke olî' 'civakeke sîvîl' were ava kirin. Wî herweha li hember '*desthilatdarîya şerî'atê*' parêzvanîya *'desthilatdarîya hiqûqê'* kir û li hember '*Welatê şîîyan Îran'* slogana *'Îran ji bo hemû îranîyan'* qîrîya. **Xatemî** wekî din siyaseta derve ya Îranê jî vekir û banga 'dîyaloga şaristanîyan' kir û ji bo normalkirina têkilîyên digel Rojava hin gavên piçûk avêtin.

Kêfa **Xamaneyî** û alîgirên wî yên tundrew ji van tiştan re nehat. Bi dehan rojnameyên alîgirên reformê ji alîyê dadgehan ve, ku li jêr bandora meleyan bûn, hatin girtin û wezareta îstîxbaratê dest bi kuştina rewşenbîr û siyasetmedarên reformîst kir, ku wekî *'rêzekuştin'* navdar bû. **Xatemî** bi awayekî gelek serkeftî gilî û gazin kir ku tundrew hema hema serê her neh rojan ji bo wî krîzekê çêdikin.

Piştî serokatîya **Xatemî** ya du serdemî, **Xameneyî** biryardar bû ku wî xetayê dubare neke û nêhele ku hikûmeteke din a reformîst were ava kirin. **Xamaneyî**, di hezîrana 2005ê de digel alîkarîya tundrew, zêrevanên şoreşa îslamî û besîcan (komeke xortên tundrew ên çekdar, wekî cil-reşên faşîstan) piştgirîya namzetekî kir, ku pir nedihat nas kirin. Ev namzet şaredarê berê yê *Tehranê* û endamê berê yê zêrevanên şoreşa îslamî **Mahmud Ehmedînejad** bû û wekî serok hat hilbijartin.

## Ehmedînejad li dij reformîstan dest bi kampanyayeke tund kir

**Ehmedînejad** dest bi bernameyeke populer kir û derameda petrolê di nav xelkê xizan de belav kir û soz da ku civakê vegerîne 'safbûna' wê ya dema **Xumeynî**. Li dij reformîstan kampanyayeke tund dest pê kiribû ku gelek reformîstên girîng û rewşenbîr ji ber tewanbarîyên sexte hatin destgîr kirin, zindanî kirin û her çi ji medyaya reformîst mabe ew jî hatin girtin. Çalakvanên jin, hunermend, muzîkjen, fîlmsaz û parêzerên mafên mirovan hatin tepisandin û piranîya wan hatin girtin û kar û barên wan hatin qedexe kirin.

Berîya hilbijartina dawî yên serokatîyê ya 2009ê reformîstan hewl da ku xwe dîsa bi rêk xin û ji **Mîr Huseyn Musavî**, ku di dema şerê *Îran* û *Iraqê* de wezîrekî populer bû, xwest ku wan di hilbijartinan de temsîl bike. **Musavî** gelek sloganên **Xatemî** vejandin û ji çînên perwerde û refomîst deng xwest. Li gor hemû nihêrînên serbixwe **Musavî** bi awayekî berbiçav bi ser ket. Lê dîsa jî di şevekê de her tişt guherî û roja din hat ragihandin ku **Ehmedînejad** bi rêjeyeke bilind, ku mirov nikare pê bawer bike, bi ser ketiye. (2) **Ayetullah Xamaneyî** ji nişkan ve derket holê û hetta berîya ku encamên hilbijartinan hatin pesend kirin jî piştgirîya xwe ya ji bo **Ehmedînejad** diyar kir û hilbijartina wî wekî *"xêreke pîroz"* ragihand.

## Bi mîlyonan îranî: "Ka dengê min li ku ye?"

Bi mîlyonan îranî, ku xwe wekî xapandî hîs kirin, rijîyan kolanan û aqûbeta dengên xwe pirsîn: ***"Ka dengê min li ku ye?"*** Bi vî awayî *Tevgera Kesk* dest pê kir û kuçe û kolanên Îranê ji serkeftina şoreşê û vir ve şahidîya mezintirîn xwepêşandanan kir. Hêzên ewlekarîyê, besîc û cerdevanên bi cilên sîvîl êriş bir ser xelk, bi dehan kes kuştin, bi sedan kes birîndar kirin û bi hezaran kes jî destgîr kirin. (3)

Çawa ku rejîma Îranê îddîa kir ku şoreşa îslamî îlham daye raperînên li welatên ereb, **Musavî** û hevbendê wî yê reformîst **Mehdî Karrubî** bang li gelê Îranê kir ku di 12ê sibata 2011ê de di xwepêşandên li ser kolanan de beşdar bibin, da ku raperînên li *Tûnis* û *Misirê* silav bikin. Ji ber wê tirsê ku xwepêşandan dikarin hêzdarîya ***Tevgera Kesk*** nîşan bide, rejîm xwepêşandan qedexe kirin. Dîsa jî, li gor hin raporan, zêdeyî 350, 000 kesan li bajarên cur bi cur derketin kolanan û rastî gulle û lêdanê hatin. Du kes hatin kuştin, gelek kes hatin birîndar kirin û bi sedan kes hatin girtin. Roja din rejîmê him **Musavî** û him jî **Karrubî** digel jinên wan destgîr kirin û ji wê demê û vir ve ji wan tu xeber nehat stendin. Heta destûr nehatibû dayîn ku Musavî di cenazeya bavê xwe de beşdar bibe, ku bavê wî piştî destgîrkirina **Musavî** jîyana xwe ji dest dabû.

Her tişt ji bo **Ehmedînejad** û alîgirên wî yên tundrew baş diçû. Lê dîsa jî **Ehmedînejad** ji bîr kiribû ku wî li jêr fermana **Xamaneyî** desthilatdar bû, ku *"kê dabe dikare paş de bistîne"*. Ehmedînejad rewşa selefên xwe tev de ji bîr kiribû û bawer dikir ku dikare ji piştgirîya populer sûde werbigire û bi awayekî serbixwe riya di riya xwe de here.

## Îranî li dij Îslama ereb

Daku piştgirîya hin kesan, ku piştî hilbijartinên bi dek û dolaban bawerîyên xwe ya ji bo rejîme wenda kirine, **Ehmedînejad** û hogirê wî yê nêzîk **Esfendîyar Rehîm Meşayî**, ku pêşî wekî alîkarê serok û paşê jî serfermandarê artêşa serokkomarîyê hatibû tayîn kirin, dest bi pesndana dîroka qedîm a Îranê kir û qala *"îslama îranî"* kir. Meşayî *"ekola îranî ya îslamê"* bi lêv kir û diyar kir ku Şiîtî, ku di rêberîya Îmaman de ye, mukemmeltirîn şiroveya Îslamê ye. Jê wêdetir, îranîyan her tim bawerîya xwe bi monoteîzmê (yek xwedayî) anîye û bi riya tevkarîkirinê wan Îslam dewlemendtir kiriye. Li gor wî, îranî xwedî *"têgihiştina herî saf a eqîda îmanê û wahdeta Îslamê"* ne û *"Îran nîşaneya îmanê ye."*

**Ehmedînejad** piştgirî da dîtinên hevkarê xwe yê nêzîk. Dema ku *Sîlîndira Melikê Îranî **Kûrûş*** ji alîyê *Muzexaneya Brîtanyayê* ve ji Îranê re bi deyn hatibû dayîn, Ehmedînejad di axaftina xwe ya li *Muzexaneya Arkeolojîyê ya Îranê* him wekî damezirînêrê Împaratorîya Îranê û him jî wekî yek ji mezintirîn rêberên etîk ên mirovahîyê pesnê **Kûrûş** dabû. Di hevpeyvîneke yek saatî de wî peyva ***Îranê*** 45 caran bi kar anî.

Ev derblêdana li ser Îranê, muhafazekar aciz kirin, ku wan gotinên **Ehmedînejad** wekî xurufî bi nav dikir. Şêwirmend û alîgirê wî yê berê **Ayetullah Misbah** bi awayekî aşkere li dij fikra wî ya Îslama



Şilan Donderalp (12 Salî)

Îranî peyivî. **Ayetullah Misbah Yezdî** hetta fikrên Ehmedînejad wekî bêfedî bi nav kir û ev mesele, piştî fitneya tevgera reformîstan wekî fitneya duyem ragihand.

## Îmamê Wenda li dij meleyan

Mijareke din ku muhafazakar aciz kirin kehanetên **Meşayî** û **Ehmedînejad** ên li ser vegera ***Îmamê Wenda*** ya demeke nêzîk bû. Di destpêka îsal de, rêzebelgefîlmeke bi zimanê farisî ya bi navê ***"Veger Nêzîk e"*** hat weşandin. Belgefîlm îddîa dikir ku hemû bûyerên li cîhanê, ên wekî karesatên xwezayî, şer, raperînên li welatên îslamî, krîza aborî û hwd. nîşane ne ku ***Îmamê Wenda*** dê di demeke nêzîk de vegere. Fîlmên ku bi berfirehî hatin belav kirin serok **Ehmedînejad**, bi navê wî, wekî **Şuaîb bin Salîh** bixwe radigihand, ku yek ji şexsîyetên pîrozwer e û dê digel **Îmamê Wenda** were.

Ev bawerî wekî dîtinên mîllenerîyan ên cihû û mesîhîyan e, lê li vê derê ferq ew e ku serok **Ehmedînejad** wekî yek ji refîqên ***Îmamê Wenda*** tê bi nav kirin. Her çend **Ehmedînejad** û **Meşayî** nikaribûn zora **Ayetullah Xamaneyî** û meleyên din bibin jî hatina ***Îmamê Wenda*** dê hemû muesseseyên olî bêkêr bihiştana û serok Ehmedînejad dê di avakirina nîrê aştî û adaletê ya seranserî cîhanê de alîkarîya ***Îmamê Wenda*** bikiraya. **Ehmedînejad** sebaret bi dilsozîya xwe ya ji bo ***Îmamê Wenda*** hertim şoveke mezin nîşan dide. Hemû axaftinên wî yên ji bo gel bi du'ayên ji bo vegera Îmamê Wenda dest pê dikin û hetta wî carekê hemû kabîneya xwe bir ser bîrekê li *Mizgefta Cemkaran* a li bajarê *Qûmê,* ku tê bawer kirin ku ***Îmamê Wenda*** jê peyda bibe.

Têgiha vegera ***Îmamê Wenda*** ya di demeke nêzîk de ji bo meleyan ji têgiha Îslama Îranî jî xerabtir bû ku pê bidebirin. Ayetullah **Misbah Yezdî** bi awayekî tund diyar kir ku ne heddê kesên asayî ye ku 'adet û toreyên sebaret bi Îmamê Wenda şirove bikin û dema vegera wî guman bikin. Bi tenê mele dikarin tefsîra pirtûka pîroz bikin. Meleyekî din ê payebilind **Xolam Reza Misbahî-Muqaddem** li dij **Ehmedînejad** derket: *"Heger, Xwedê neke, Ehmedînejad dixwaze bibêje ku **Îmamê Zeman** [Îmamê Wenda] piştgirîya kiryarên hikûmetê dike, ev yek ne rast e. Îmamê Zeman tu car bi enflasyona 20 dersedî razî nedibû û ne vêya ne jî gelek xetayên din, ku niha li welêt hene, qebûl dikir."*

## Kesên ne-mele li dij îslama meleyan

Ehmedînejad û Meşayî dest bi kampanyayekê kir da ku meleyan qels bikin. Wan, mele wekî ji dinyaya nûjen bêxeber nîşan dan. Di 2008ê de **Meşayî** li Tehranê mazûvanîya merasîmekê kir ku tê de gelek jin li tembûran dixist, dema ku yeka din ***Quran*** di destê wê de derket kursîyê da ku hin ayetan jê bixwîne. Meleyan, vê hawîrdora şahîyê û lêxistina muzîkê wekî bêhurmetîya li hember Quranê bi nav kir û li gor şerî'atê merasîm qedexe kirin. Meşayî jî mele bi nezanî û bêhestîyarî tewanbar kirin. Wî got muzîk manewîyatê qewî dike û ruhê însan paqij dike û kesê ku vê yekê taqdîr nakin ji heywanan xerabtir in.

Ehmedînejad û **Meşayî** di esasê xwe de dibêjin ku pêwîstîya xelk bi meleyan tuneye ku Îslamê hînî wan bike. Her çend serokên berê digel ayetullahên (meleyên şiî) mezin ên li ***Qûmê*** xwedî têkilîyên baş bûn jî **Ehmedînejad** û hevkarên wî ji qestan mesafe danîn navbera xwe û ayetullahan. Seredana wî ya *Qûmê* çendîn car hat paş de avêtin û di dema seredana wî ya 25ê gulana 2011ê de wî bi tenê çend heb wezîr digel xwe birin û neçû seredana tu meleyan.

Lê belê, bi ser van hemû pirsgirêkan de têkoşîna ji bo desthilatdarîyê ya navbera **Ehmedînejad** û alîgirên wî û **Ayetullah Xamaneyî** û meleyên payebilind heye, ku xuya ye fermandarên sereke yên zêrevanên şoreşê jî piştgirî didin wan. Êrîşên alîgirên **Xamaneyî** yên li dij **Ehmedînejad** û hevkarên wî gelek xerab bûn û ji alîyê hawîrdorên oldar hatin. Heval û hogirê serok **Ehmedînejad, Meşayî** bi efsûnkarî, "ruhanîyet" û têkilîya wî ya bi cin yan pêrîyan hat tewanbar kirin. Zêdeyî 20 alîkar û şêwirmendên serokatîyê jî ji ber efsûnkarîyê hatin girtin.

Meclîs ji bo kêmkirina burokrasîyê bang kir ku hin wezaret werin yek kirin. **Ehmedînejad** jî wezaretên rê û ragihandinê digel wezareta avadanî û geşedana bajaran, wezareta enerjîyê digel wezareta neft, wezareta sanayî û madenan jî digel wezareta bazirganîyê, wezareta karan û ewlekarîya sosyal digel wezareta kedê gihandin hev. Lê belê **Ehmedînejad** bêyî ku ji *Meclîsê* ji bo hin wezîrên nû destûreke pêşîn werbigire, ev yek encam da. Jê wêdetir, xwe wekî wezîrê berpirsîyarê kar û barên petrolê ragihand, ku wê demê Îran piştî 36 salan bûbû seroka demî ya OPECê û wezîrê neftê yê Îranê divê serokatîya kombûna OPECê ya li *Viyanayê* bike.

## Demeke wezîfeyê ya di tehlûkê de

Lijneya Çavdêrîyê, karê **Ehmedînejad** wekî neqanûnî ragihand, lê belê serok jî dîyar kir ku ew vê biryara lijneyê qebûl nake. Di huzûra ***Welîyê Feqî*** de her sê serokên erkan hatin cem hev û ***Welîyê Feqî*** diyar kir ku biryara Lijneyê nîhayî ye û hikûmet divê bi ya vê biryarê bike, lê belê serok enyata xwe berdewam kir. Di destpêka hezîranê de Meclîs gaveke nedîtî avêt û serok **Ehmedînejad** hawaleyî dadgerîyê kir ku ji ber binpêkirina qanûnê were darizandin. Roja din, **Ehmedînejad** neçar ma ku ji bo wezaretê şêwirmendek tayîn bike ku ji alîyê Meclîsê ve rexne lê hat girtin.

Pevçûna navbera **Ehmedînejad** û **Xamaneyî** hîna jî berdewam dike û weha xuya dike ku di demeke nêz de jî bi dawî nayê. Hemû alternatîf li ser masê ne. **Ehmedînejad** dibe ku dest ji kar bikişîne yan were tewanbar kirin û darizandin, yan jî bi îhtîmala herî baş jê re destûr were dayîn ku wekî serokekî qels û bêtaqet karê xwe berdewam bike.

Di 2ê hezîrana 2011ê de **Muhammed Reza Bahuner**, ku peyvdarê *Meclîsa* yekemîn e got: *"Bîstek berê em gihaştin wê biryarê ku **Welîyê Feqî** amade bû ku dawî li hikûmetê bîne, lê belê me dît ku **Welî** hîna jî dixwaze ku hikûmeta niha heta dawîya serdema qanûnî bi sikûnet karê xwe berdewam bike û hikûmeta dehemîn bi awayekî xwezayî bi dawî bibe."* Lê belê wî herweha bang li hikûmetê kir ku xwe ji *"tevgera xurufî"* ya nav kabîneya xwe dûr bixe.

Lê belê, têkçûna reformîstan û herweha têkçûna hewldanên tundrewan ji bo reforma navxweyî nîşan da ku rejîm nikare xwe ji nav de biguherîne û pêwîstîya wê bi pergaleke sekuler û demokratîk heye.

* Kevnedekanê Unîversîteya Îsfehanê û li Oxfordê mamoste.

1 Nîşeya Wergêr: Li gor bawerîya şiîyan, piştî ku Îmamê Yanzdemîn ***Ebu'l Qasim Muhammed*** di sala 874ê de çû rehmetê, kurikekî 7 salî xwe wekî Îmamê Duazdemîn ragihand û xwe li şikeftekê binê mizgefta ***Samarra*** veşart. Weha tê bawer kirin ku dergehê vê şikeftê bi derîyekî, ku şiî jê re ***'Bab-al Xeyba'*** dibêjin hatiye girtin. Şiî herweha bawer dikin ku xwedê îmamê duazde ji mirovan veşart da ku jîyana wî biparêze û îmam heta niha jî di jîyanê de ye ku dê rojekê wekî ***Mehdî*** vegere û mirovatîyê rizgar bike.

2 Binihêrin: "Iran's Stolen Revolution" (Şoreşa Îranê ya ku hatiye dizîn), Open Democracy, (Demokrasîya Vekirî) 18 hezîran 2009 http://www.opendemocracy.net/article/iran-s-stolen-election-and-what-comes-next

3 Binihêrin: "Iran: What happened, where now" (Îran: Çi qewimî, niha li ku ye), Open Democracy (Demokrasîya Vekirî), 16 sibat 2010, http://www.opendemocracy.net/farhang-jahanpour/iran-what-happened-where-now

Wergera ji îngilîzî Celîl Kaya

# Desthilata Îranê serdestîya xwe ya li ser medyayê winda dike

SHERVIN AHMADI *

Duşemî ye, meha adarê, kolanên ***Tehranê*** vala ne. Ji ber betlaneyên Newrozê, sersala îranê û pîrozbahîya hatina biharê, şênîyên vî bajarê mezin, nêzî 14 mîlyonan bajar terikand. Li bazara ***Tajrîşê***, li bakurê ***Tehranê***, afîşeke karton a destnivîs bala mirov dikişîne: DVDya *Qehweya tahl* hatiye. Ji bayîyên rojnamefiroşan heta bi dikanan, qismên nû yên vê komedîyê li her derê bajêr peyda dibin. **Mehran Modîrî** yê gelekî bi nav û deng derhêner, produktor, hevsenarîst û aktorê vê rêzefîlmê ye.

Ji du dehsalan ve ye ku ew li ser ekranên televîzyonê xuya dike û bi rîtma guherîna civakê re ew jî guherî. Ew laqirdîyên sivik û tinazî pêşkêş dike û tu cara xeta sor a rexnegirîya desthilatê derbas nake. Wî carcaran hewl da ku bi pêşkêşvanên kanalên televîzyonê yên ji derveyî welêt weşanê dikin, bikene, lê belê li qada siyasî cihê wî yê lêbanînê nîne.

## Her DVDya *Qehweya tahl* ji mîlyon û nîvek kopyayan bêhtir tê firotin

Her DVDya *Qehweya tahl* ji mîlyon û nîvek kopyayan bêhtir tê firotin, sê qismê rêzefîlmê di DVDyê de hene û bihayê wê ji 2 euroyan kêmtir e. Ev bihayê pir erzan li gor çîna navîn e û teşwîqî korsanîyê nake - li vî welatî, ev kirineke berbelav e. Rêzefîlm xwedîya malpereke ***Înternet***ê, rûpeleke ***Facebook***ê, hesabeke ***Twîtter***ê û nivîsarên ***Wîkîpedîya*** yên bi farisî û ingilîzî ye. Çîrok di rabihorîyeke dûr de derbas dibe û henekê xwe bi nedîmên şahî her weke despotîzmê, dike. Li pişt her karakterê, temaşevan dikare rêzeke berfireh a kesayetîyên dîrokî bi bîra xwe bîne, yên ku têkildarên desthilata berê (mînak ***Reza Şah***, bavê Şahî) an jî îqtîdara heyî ne.

Di çapa xwe ya 2yê nîsanê de, rojnameya rojane *Shargh* dabû xuya kirin ku DVDya bîstemîn a rêzefîlmê dê ji hêla wezareta çand û rêberîya îslamî ve bê qedexe kirin. Bi fermî, ev prosedureke îdarî bû ku ji bo ferzkirina hin guherandinan dihat meşandin, lê belê rojnameya li ser xetê *Aftab*ê diyar kir ku biryar ji ber şibha nêzîk a karakterekî di gel birêveberekî payebilind ê hikûmetê hatibû dan. Çi dibe bila bibe, DVD bêyî guherandinan derket pîyaseyê û bi hêman serkeftina bazarî ya DVDyên berê hat pêşwazî kirin.

Ji van meylên sansûrê yên dudil wêdetir, tevneke paralel ji hêla desthilatê ve tehemûl û heta teşwîq jî tê kirin, da ku rêzeke berfireh a produksîyonan biweşîne; ji fîlmên aksîyon yên amerîkî û korsan, ku li welêt jêrnivîs li wan tên zêde kirin, heta bi fîlmên îranê yên ku destûra belavkirinê nestandin -weke *Alî Santoruî* yê **Darîuş Mehrjuî**, fîlmeke ku behsa narkotîk û nebûna perspektîvên ciwanan dike, di civakekê de ku nirxên xwe winda kirine. Rêzefîlmên televîzyonê yên ku kanalên fermî berê weşandin lê temaşevan dixwazin dîsa bibînin jî hene. Tadeyên têkçûyî li ser medyayan ên dehsala pêşî ya şoreşê rê da siyaseteke nermtir li hember berhemên çandî yên ku civak û ciwan ji wan hez dikin. Ji niha û pê ve, desthilatê dev ji meyla xwe ya kontrolkirina zemîna medyayê berda, lê armanca wê ew e ku vî zemînê tijî berhemên weha bike ku "kêmtir xeternak" tên hesibandin, di heman demê de serdestîya mutleq a li ser zemîna siyasî di dest xwe de bigire.

Bi vî awayî, du qadên paralel bi pêş dikevin: Qada yekem, ya fermî û wek dengê Komara Îslamî tê dîtin û qada duyem ya kêmtir kontrolkirî û rayedar dikarin berpirsîyarîya xwe li ser înkar bikin û bi vî rengî, neahengîya vê qadê ya di gel rêbazên siyasî û exlaqî yên desthilatê rave bikin. Ev qada ha destpêkê weke amûreke li hember tesîra çanda Rojavayê bi pêş ket. Gelek stranbêj derketin ku destpêkê bi şermokî awayê muzîka pop a Los Angelesê -bajarê ku civata îranî ya herî mezin a li derveyî welêt lê dijîn – dikir û ev stranbêj dişibîyan reqîbên xwe yên li bajarê *Kalîforniya*yê. Tona dengê hinan ji wan mîna stranbêjên navdar ên koçber bû, lê wan helbestên tesewufî dixwendin. Gava ku pêla duyem a hunermendan hat, kompleksên wan kêm bûn û asta wan bilindtir bû. Bi wextê re, muzîk û gotin bûn tam mîna yên li derveyî welêt çêkirî, ku desthilat weke nîşanên "jirêderketîyên erdê" (*Mofsedin fil arz*, biwêja ku rejîm ji bo kesên "rojavayîbûyî" bi kar tîne) şermezar dike. Her çi muzîka pop û rok ku berê derzagonî bû û bi qaçaxî dihat çêkirin, ew jî kêmtir, lê bi riya vê tevna nîv-fermî, belav bû.

Zemîna medyayê ya fermî bixwe cihêreng bû. Kanalên dewletê pir bûn û naveroka wan cuda cuda bû. Ji bilî bernameyên malbatê û yên zarokan jî, ew bi saya rêzefîlmên televîzyonê temaşevanan bi xwe ve dikişîne, ku ev rêzefîlmên xwecih gelek caran bi budceyên pir mezin tên çêkirin û ji versîyoneke gelekî rengê ***hollywoodî*** pê dikeve; çîroka ***Ûsiv û Zuleyxa*** heta bi bûyerên dîroka siyasî û rêzefîlmên komîk jî, bernameyên cihê dihewînin. **Mehran Modîrî** yek ji wan aktoran e ku para wî di van guhertinan de hebû.

Îstasyonên radyoyê bi heman riyê de çûn û hin ji wan, weke ***Peyam***, ku di destpêkê de agahîyên trafîka *Tehran*ê didan, ji salên 1990ê ve dest bi weşandina muzîkên berê qedexebûyî kir. Muzîka pop a ku ji Şoreşê ve ji holê rabûbû cihê xwe dît û weşandina wê ya ji hêla kanalên fermî ve jî, ew li ber çavên çînên kevneperest ên civakê meşrû kir. Di salên 2000ê de, heta hin *Nohehs* (lîturyayên dînî yên ku qetla îmam **Husên** ê nêvîyê pêxember, li ***Kerbala***yê, di 680ê de, bi bîr tînin) di gel muzîka bi vî rengî hatin strandin.

Bi destpêka weşandina kanalên satelît re, şerê medyayê xurt bû. Li gel qedexeya fermî ya li ser sêlên antenên satelît piranîya malbatên bajarî û gundî xwedîyê anteneke bi vî rengî ne; lewre jî, hikûmetê dev ji meylên tunekirina wan berda û stratejîyeke nû bi pêş xist. Di warê agahîyên siyasî de, tiştekî kirinê tuneye: Kanalên neteweyî dê tu cara nikaribin ji hêman azadîya îfade û rexnegirîyê ya kanalên satelîtê sûdê wergirin. Jixwe, li Îranê jî, weke li tevahîya cîhanê, agahîyên siyasî bala temaşevanan nakişîne û desthilat li ser warên din rawestiya. Wê biryar da ku çavên xwe li bernameyên ku rasterast ne siyasî ên kanalên satelîtê bigire, ji ber ku ew wan kêmtir bi xeter dihesibîne, di gel ku li dijî qeydên exlaqî yên rejîmê derketibin jî. Aniha, kanalên ku di resmiyetê de qedexe ne bê navber klîpên mûzîkê yên ne li gor qanûnên îslamî diweşînin û reklamên li gel hejmarên telefonên destan ên îranê jî bi wan re derdikevin ser ekranan.

Encamên boçûneke weha ya ku nakokîyên berçav di xwe de vedihewîne, bi rihatî tên pêşdîtin. Di serî de, têgiha naveroka " kêmtir bi xeter " kêyfî ye. Kî dikare bibêje ku fîlmeke aksîyonê a amerîkî li ser gîyanên fezayê ji dramayeke klasîk "kêmtir bi xeter" e? Fîlmên "ne siyasî" jî dikarin balê bikişînin ser terzeke jîyanê ya rojavayî ku danûstandina bê sînor diparêze. Jixwe, beşeke mezin a çînên navîn ên bajaran piştgirîyê dide van nirxan, heta carina jî bi awayekî mubalexe kirî. Îran weha bû duyemîn îthalatkera berhemên kosmetîk li Rojhilata Navîn û heftemîna cîhanê. Hin cejnên ticarî yên berî sî salan nedihatin nasîn, weke roja dildaran, aniha li bajarên mezin tên pîroz kirin.

Ev sê sal in ku desthilat bi serkeftina kanala televîzyonê ***Farsi One*** re, ya xwedîyê wê *News Corporation* a **Rupert Murdoch** e, rû bi rû dimîne. Ev kanal bê navber rêzefîlmên amerîka latînî diweşîne û beşeke mezin a temaşevanên gelêrî bi xwe ve dikişîne. Rojnamevanê amerîkî *Dexter Filkins* diyar dike ku ***Farsi One*** bi awayekî lezgîn navdar bû (1), heta bi wê radeyê ku serkeftina wê ya li cem çînên xizan hikûmetê jî bixe xeterê.

Desthilata ku hewl da temaşevanan bi xwe ve bikişîne da ku rê li ber siyasîkirina zemîna medyayê, ya jî hêla reqîbên wê ve dihat meşandin, bigre, ket davika ku wê bi xwe vedabû: Wê derî li kanalên ku pesnê terza jîyanê ya rojavayî didin, vekir û bê hemdî, weha reqîbên xwe xurt kirin, yên ku helwesta hikûmetê ya "ji serdema navîn hatî" şermezar dikin.

* Rojnamevan, berpirsyara weşana farsî ya *Le Monde diplomatique*.

1 *The New York Times*, 21ê mijdara 2010ê

Wergera ji fransî: Simko Destan



Cotmeh 1986

TIRKIYE

# Ronesansa têkoşîna çekdarî

CHRISTIANE MORE*

Ji dema avabûna Tirkiyeya nûjen ve, tenê mafekî kurdan heye; yê tirkbûnê . Tercîh pir hêsan e: asîmîlasyon an jî zordarî. Enqere wiha dibêje: "Li ser xaka Împaratorîya Osmanî jixwe bîst û çar dewletên serbixwe hene û em ya bîst û pêncemîn naxwazin." Asîmîlasyon hindik mabû bi ser keve. Gelek kurd li bajêr an jî li dibistanên şevê yên ji alîyê artêşê ve tên bi rê ve birin, zimanê xwe ji bîr kirin. Li gel vê yekê jî, ev înkara nasnavê deh mîlyon kesan, ji bo piranîya kesên di rewşeke paşvehiştî ya aborî (1) û çandî de tên ragirtin, nekarî bibe asteng li pêşîya vejîna tevgera neteweyî ya ku ji alîyê deshilata navendî ve di 1938ê de hatibû perçiqandin. Partîyên kurd ên îlegal ên ku bawer kirin ku tiştek ew êdî ji "hêza kolonyal" hêvî bikin tuneye, hemû, bi ferqên piçûk be jî, xwedî heman armancê ne: Serxwebûna Kurdistanê.

12ê îlona 1980yê, esker deshilatê digirin. Armanca diyarkirî: Berteref-kirina terorîzmê, perçiqandina tevgera kurd. Rêxistinên kurd bi girtinên girseyî û penaberkirinê tên pelişandin. Nakokîyên di navbera rêxistinên kurd de jî nahêlin yekîtîya kurdan saz bibe: Di 1986ê de, ne kêmî deh partîyên kurd hene. Ji nav wan du derdikevin pêş. Yek jê Partîya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyeyê (PSKT), û ya din jî Partîya Karkerên Kurdistan (PKK). Bi tenê PKKê karî derhal xwe ji nû ve bi rêk bixe û xwe bigihîne asta meşandina şerekî çekdarî.

Piştî ku Rêxistina Rizgarîya Filistînê di 1982yê de ji Libnanê vegeriya, mîlîtanên PKKê yên li kampên filistînîyan ên Beyrûdê perwerde dibûn, ji bo "bibin pêşengên tevgerên rizgarîya Rojhilata Navîn" vegeriyan Kurdistanê. 15ê tebaxa 1984ê, li vê herêma di bin nîrê rêveberîya eskerî de ku ji siséyan duduyê artêşa tirk lê bi cih bûye, PKK avakirina rêxistineke çekdarî îlan dike: Hêza Rizgarîya Kurdistan (HRK) (2), û şerê gerîla dide dest pê kirin. Tevî sirgûn, tehcîr, biserdegirtin, êşkence,û cezayên îdamê jî, PKK çalakîyên xwe yên li dijî artêş, polîs û hevkarên kurd ên hukûmeta Enqerê yên weke axa û "parêzvanên gundan" (3) zêde dike.

21ê adara 1985ê, roja cejna Newrozê (4), PKK avabûna Enîya Rizgarîya Neteweyî ya Kurdistanê (ERNK) îlan dikir, lê belê heta îro jî ti partîyeke din – hemû têkoşîna çekdarî berîya wextê xwe û zû dinirxînin – tevlî enîyê nebûye, û di ser de jî ew PKKê weke "provokator û ajan" dinirxînin. Hevalbenda taktîk a PKKê, PDKya Iraqê jî ku di baregehên xwe de cih dabûyê, ji havîna 1985ê ve nema derîyê xwe jê re vedike. Ji bo pêkanîna kembereke sînor û felçkirina PKKê, rayedarên tirk û Mesût Barzanî bi îhtîmaleke mezin wê li hev kiribin. Vê gavê, yekane serkeftina mutleq a PKKê ew e ku çapemenîya tirk li dijî wê be jî, dema der barê wê de dinivîsîne, gotina "kurd" a bi awayekî fermî ji 1974ê ve qedexekirî, bi kar tîne.

Pêşqereqola NATOyê ya li Derya Spî ya Rojhilat, baregeha hêzên desttêwerdana bilez a amerîkîyan û pira girîng a du alîyên şerê Kendavê, Tirkiye xwedî artêşa herî bi tesîr a herêmê ye. Ew weke jandarmeyan nêzî tevgera neteweyî ya kurd dibe, maf di xwe de dibîne ku Aştîya Tirk lê ferz bike. Di cotmeha 1984ê de, di navbera Iraq û Tirkiyê de peymanek hat îmze kirin û ev peyman dihêle ku bi armanca lipeyçûna sabotajkaran artêşa her yek ji van welatan, bi qasî pênc kîlometre ji bo sê rojan bikeve nav xaka yê din. Peymaneke bi heman rengî wisa xuya ye bi Îranê re jî hatiye îmze kirin.

1 Li himberî sîxdana pirsgirêkên li "herêmên Rojhilat (bi awayekî fermî, li Tirkiyeyê, Kurdistan tuneye), rayedarên Enqerê giranîyê didin wîlayetên vê herêmê biserûber bikin. Avakirina bendava Ataturk li ser çemê Firatê wê herêm bixêrûber bikira û di encamê de bişaftina kurdên serhildêr û serhişk jî wê pêk bihata"

2 HRK rizgarkirina Kurdistanê ji "dagîrkerîya faşîst" ji xwe re dike wezîfe, û bi wan têgehan deshilata tirk û axayên kurd dest nîşan dike

3 Hêzên mîlîs ên kurd ên bi qanûna 26ê hezîrana 1985ê li dijî êrişên 15ê tebaxa 1984ê hatin saz kirin

4 Roja nû: Sala nû ya kurd û îranî, destpêka biharê. Salvegera serkeftina Kawayê hesinkar ê efsane li dijî zordestîyê, ku di heman demê de sembola têkoşîna gel a ji bo serxwebûnê ye



BERFÎN HÎVDA BARAN (8 Salî)

## ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Christiane More, di nivîsa xwe ya yekem a vê hêjmarê de têkoşîna çekdarî mîna ronesanseke çekdarî dinirxîne, balê dikişîne ser helwêsta Tirkiyeyê ku ji avabûna xwe ve bi tenê mafekî dide kurdan ku ew jî asîmilekirin û berterefkirina wan e û naxwaze tu mafekî netewî, mirovî û çandî bide wan û behsa vê yekê jî nake. Kurd jî li hember vê yekê radibin û xwe organize dikin û şerekî dijwar didin. Tirkiye hewl dide ku bi riya nîfaqa nav kurdan hêza wan parçe bike û wan bê taqet bihêle, lê dîsa jî nikare li hember pêşketina hêzên wan ên çekdarî raweste.

More, di nivîsa duwem de ku bi sernivîsa "Li bin siya pevçûna Îraq û Îranê" nivisandî de analîzeke berfireh li ser têkoşîna hezên kurd dike û rewşa dijwar ya di navbera dewletên dagirker de tîne ber çavan. Hêzên kurd carna li hember hev bin jî, bi yek armancê tevdigerin; dixwazin Kurdistaneke serbixwe ava bikin. Dewletên derdorên kurdan hemû dagîrker in û kurd ji bo berdewamîya jîyanê û berdewamîya têkoşînê carna tên hember hev. Wiha mînak YNKya Talabanî bi Iraqa Sedam Husên re dikeve têkilîyê û PDKya Barzanî bi Îranê re, PDKya Rojhilat disa bi Bexdayê re û PDK-Iraq bi Enqereyê re; kurd li ser pira siradê dîplomasîyê dikin û gava di tengasîyê de dimînin, dîsa jî dikarin xwe bispêrin çîyayên xwe yên asê û ji wê derê şer û jîyana xwe berdewam bikin.

Nivîs dengvedaneke melodîk li ser têkoşîna kurdan tîne holê; herçiqas rewş neder be jî, ew xwe bernadin, nakevin û li ser pîyan dimînin, wekî din dê di herêmeke wisa de nikaribûna xwe biparêzin. Salên 80yê heta 90ê şiroveya xwe di nav nivîsa xanima More de li ser bingeheke real diguncîne û agahdarîyên hundirîn radixîne ber çavên xwendevanan, bi metodeke mûzîkal digihîjîne guhên wan.

LMdkurdî

# LI BIN SIYA PEVÇÛNA IRAQ Û ÎRANÊ

Di îlona 1986ê de, Îranê li enîya başûr êrişa Kerbela 2 dida dest pê kirin, ev êrişa topyekûn ya li dijî Iraqê ku Tehranê berê jî gelek caran îlan kiribû, ji alîyê çavdêran ve jî weke êrişa dawîyê dihat nirxandin. Heman meh, dema ku hêzên wê bersiv didan hin dij-êrişên Iraqê, Komara Îslamî li enîya bakur jî operasyona Kerbela 3 dixist dewrê. Çapemenîyê ji bo vê bûyera ku weke çalakîyeke hedefşaşkirinê xuya dikir, wê demê bi tenê bi qasî çend rêz cih veqetandibûn. Ev di heman demê de dihat wateya ku çapemenîyê nedixwest behs bike ku enîya bakur li dilê Kurdistana Îranê ye. Ev herêma ku bi hilweşîna textê Şah hêvîyek pê re peyde bû, dema ku nîzama nû ya îslamî ji alîyê îmam Xumeynî ve hat ferz kirin, di demek kin de hêvîya xwe jî winda kir. Kurdistana Iraqê xwedî herêmeke xweser e, ji baregehên wê şerê çekdarî xwe digihîne heta bakurê Kurdistanê ku ji siséyan yekê axa welatê cîran Tirkiyeyê pêk tîne. Hêjayê gotinê ye ku ev cîrana xurt hin dilbijîna xwe ya ji bo bidesxistina herêmê venaşêre. Têkoşîna kurdan bi giştî tê ji bîr kirin. Xaka wan bixwe dibe yek ji karta sereke a ku alîyên şerê kendavê li himberî hev bi kar tînin. Gelo kurd wê bikaribin dijberîya navbera xwe bi dawî bînin û ji vê tofana ku dikare herêmê serûbin bike, sûdekê wergirin?

Yek li pey yê din, kalaşnîkov li mil, navteng bi kembereke fireh a rext li ser raxistî, girêdayî sed û pêncî pêşmergeyên (1) Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) berê xwe didin girên Sûrikêyo yên ku Iraqê ji Îranê diqetînin. Ew ji hêla başûr tên, ji deverên bêxwedî yên Iraqê -ku piştî peymana Cezayîrê ya di 1975ê de hat afirandin- yên ku niha êdî ketine bin destê Yekîtîya Niştimanî Kurdistan (YNK)ya Celal Talabanî ku rêxistineke dijberî rejîma Bexdayê ye. Piştî êrişên Îranê yên 1983yê PDKÎ li wir biryargehên xwe yên navendî bi cih kiribûn. Li wir mirov li nûnerên rêxistinên kurd ên Îranê yên ku li dijî Komara Îslamî ya îmam Xumeynî şer dikin, rast tê: Abdurrahman Qasemlû, sekreterê giştî yê PDKÎyê ya xwedî deh hezar pêşmergeyan; Ibrahim Alizadeh, sekreterê giştî yê Komala, a xwedî sê hezar pêşmergeyan; Şêx Ezedîn Huseynî, zanyarê olî yê sûnî yê xwedî îtîbar û birayê wî Şêx Celal, serokê rêxistina Xebatê; xwedîyê çar sed pêşmergeyan. (2)

Dijwar e ev riya ku diçe ber bi herêmên rizgarkirî yên Kurdistana Îranê yên ku ji dema Şoreşa îslamî (3) ve bi awayekî fiîlî ji alîyê PDKÎ û Komala ve tên bi rê ve birin. Pir hindik berî ku şev bikeve erdê em sînor diqelêşin; em digihîjin Dûnis, gundikê li ser xaka Îranê. Beşek pêşmerge virde wirde li ser eywanên xanîyên weke silmeyan li nav singên çîyê hatin saz kirin, belav dibin. Yên din jî diçin malên gundîyên ku bi kêfxweşî wan pêşwazî dikin.

Çîya kurdan digihîne hev -ew aîdê wan e– lê belê herwiha wan ji hev vediqetîne jî. Alfabe bendeke din e li pêşîya yekbûna wan: Heman ziman ji alîyê kurdên Iraq û Îranê ve bi tîpên erebî-farisî, ji alîyê yên Tirkiyê ve bi tîpên latînî, ji alîyê yên Yekîtîya Sovyetê ve bi tîpên krîlî tê nivîsandin. Wekî din, bi daxwazên xwe jî kurd ji hev vediqetin: Mesela kurdên Iraq û Îranê daxwazên serxwebûnê yên kurdên Tirkiyeyê pir xeter û utopîk dibînin û bi daxwazên xwe yên xweserîya hundir a di çarçoveya dewleta ku ew di nav de dijîn, bi awayekî ji awayan parçebûna Kurdistanê dipejirînin.

Li derveyî merasîma çayê -ya ku bênavber heta wextê razanê tê îkram kirin- dema guhdarîkirina li radyoyê



dema herî girîng e ji bo wan. Divê mirov guh bide adetan. Li vê herêma ku lê têgeha demê bi temamî aîdê şerqê ye, divê mirov rêzê ji dema hatin û çûyînê re bigire. Herkes guh dide radyoya rêxistina xwe, ya dijberê xwe, ya Komara Îslamî, bi taybetî jî ya Dengê Îsraîlê û hemû radyoyên bîyanî yên bi farisî û kurdî weşanê dikin.

PDKÎ, ya ku gelek caran weke sosyal-demokrat tê nirxandin -ew xwe wisa nabîne- û şaxê Partîyeke Komunîst a Îranê ya di 1983yê de ava bû, rêxistina marksîst-lenînîst a bi navê Komala, bi kûrahî û heta bi awayê jîyana xwe ya rojane jî ji hev cuda ne. Dema ku pêşmergên PDKÎyê digihîjin gundan dawî li roja xwe tînin, her çi şervanên Komala ne, ew ji nû ve dikevin nav liv û tevgera jîyana rojane: Divê ew roja xwe binirxînin, civînan pêk bînin û perwerdê bibin.

Kurdên hê bi tementir li şûna Komalaya "dij-ol" a ku li ser navê doktrîneke pak û hişk olê red dikin, PDKÎ ya ku rêzê ji nirxên kevneşop re digire, tercîh dikin. Li himberî vê yekê, ciwan û jin bêhtir xwe nêzî îdeolojîya şoreşger û yeksangir a Komalayê dikin. Dijberîya navbera PDKÎ û Komala gelek caran diqulibe pevçûnên çekdar û ev yek bi kêrî Îranê tê. Ji bilî kuştin û birîndarkirina bi sedan şervanên hev, ev dijberîya wan herwiha dibe sedemê xirabûna sazûmana wan a rêxistinî û kêmbûna çalakîyên wan ên gerîlatîyê jî.

Di dema "şerê bajaran" ê di navbera Iraq û Îranê de weke piranîya bajarên din ên li Rojavayê Îranê, di adara 1985ê de, wargeha xwedî çil hezar şênîyan, Baneh ji neçarî hat vala kirin. Niştecîyên bajêr xwe li gundên derûdorê girtin, li dibistanên kavilbûyî an jî di nav erebeyên xirbende de li dirêjahîya riya Serdeştê bi cih bûn. Li bajaran, ji bilî esker, pastar, bassicî (4) û "xayînan" kes nema. Bi şevê, dema ku dijmin xwe digihîne baregehên xwe, pêşmerge jî dest bi çalakî û êrişan dikin. Rêvebirîyên partîyan xwe li deverên ji mirovan xalîkirî digirin, lê belê şervan hertim li Kurdistana Îranê çalakîyan pêk tînin, derbeyên mezin li artêşa îslamî didin û gel fêrî teknîkên berxwedanê dikin.

Tevî hêzên xwe yên qirase û lêçûnên bêhedûhesab ên şer, rejîma îslamî nekarî dawî li serhildana kurd bîne. Li himberî artêşa îslamî ya ku herêmê qet nas nake, pêşmergeyên hertim li nav çîyayan dijîn, jîyana gerîlatîyê ji xwe re kirine awayê jiyanê. Wekî din, li dijî kurdên ku weke birayê xwe yê nijadî û çandî dibînin, pastar qet hez nakin şer bikin. Û şênîya kurd, bi giştî, destekê dide pêşmergeyan.

### Dijminên dijminên min…

Lê belê şer li holê ye. Û divê bikevin nav şer li dijî hêzên Komara Îslamî (artêşa nîzamî û hêza mîlîsan) û carna hetta li dijî rêxistinên kurd ên raqîp yên weke PDKya Iraqê ku dijberîya rejîma Bexdayê dike û bi şerkirina li tenişta pasdaran (5) desteka Tehranê hêvî dike. Di axaftinan de ev mijar heta radeyekê nerihetîyê dide û PDKya ku bi "eşîrtîyê" tê sûcdar kirin. Lîderê wê, Mesud Barzanî, hemû hêz û giranîya xwe dide hilweşandina textê Saddam Husên, dijminê sondxwarî û amadekarê –bi şah re– têkbirina bavê wî, Mustafa Berzanî yê navdar di 1975ê de. Ew hevalbendîya bi Tehranê re "bingehîn " û "stratejîk" dinirxîne û li himberî deshilatîya îranî xwe pir hişyar dihesibîne, ji ber ku li gor bawerîya wî "Xumeynî wê ti caran bi Saddam Husên re li hev neke".

Danûstandinên navbera Komara îslamî û PDKÎyê di havîna 1984ê de pêk hatin; danûstandin wê veguheriyana muzakereyan eger Komara Îslamî şertên kurdan qebûl kiribana (muzakereyên li Kurdistanê, bêyî agirbestê, li ser bingeha daxwazên kurdan). Ew danûstandin bûn sedem ku PDKI di 1985ê de ji Konseya neteweyî ya berxwedana Îranî (KNB)ê were avêtin ya ku her cure muzakereyên bi rejîma îslamî re (6) red dike.

Xeyala PDKÎyê niha ew e ku ji bo lihevkomkirina tevgera komarger a îranî, a ku îro ji hev belav bûye, enîyeke dij-emperyalîst ava bike. Qasemlû vê xeyalê wiha îzah dike: "Me gelek hêvî xwedî kirin ji bo KNBya ku me di 1984ê de digot ew yekane çareserîya demokratîk e ku dikare şûna rejîma Xumeynî bigire. Lê belê siyaseta hişk ya Mucahidînên Xelk nehişt ku KNB rêxistinên din jî bigre nav xwe. Eger rejîma Xumeynî dikare xwe li ser lingan digire, sedem ew e ku muxalefet qels û perçebûyî ye. Tew! Xwezî li Îranê du an jî sê Kurdistan hebûna..."

Abdurrahman Qasemlû wisa bawer dike ku Iraq di qada psîkolojîk de bi ser ketiye û wiha dibêje: Herkesî bihîst ku Saddam Husên teyîd kir ku ew dixwaze di çarçoveya rêzgirtina serxwebûna her du welatan de, aştîyê pêk bîne, hem jî di demeke wisa de ku îmam Xumeynî ji bo şkandina pişta Saddam Husên behsa gurkirina şer dikir." Gelê kurd der barê siyaseta Bexdayê de bi temkîntir diaxive; helbet ew di heman demê de ji ber du şeran şeperze dibe, ji şerê ku Îmam Xumeynî dimeşîne, û ji şerê di navbera Îran û Iraqê de. Û kurdên Îranê êdî hindiktir dudiliyê dikin ji bo xwe bigihînin birayên xwe yên tirkiyeyî yên li Komara Federal a Almanyayê û Fransayê bûne penaber.

Gelo wê rêveberên kurdên Îranê bibin xweşmêrên Iraqê? Ew vê yekê înkar dikin. Berî hertiştî ji ber ku alîkarîya Iraqê tenê heta cihekî ye: Ew ji mafê derbasbûna di ser axa wê re û fînansekirina "buroyan" pêk tê; pêşmerge bi taybetî çekên şexsî yên peydekirina wan li bazara fireh a Rojhilata Navîn mumkin e, bi kar tînin. (mîtralyozeke malê rûs bi hezar û pênc sed dolaran, yeke çînî bi pênc sed dolaran e). Dûre, ji ber ku otonomîstên kurd ne li ser hesabê Bexdayê (têkoşîna wan berê şerê Kendavê dest pê kiriye), lê belê li dijî rejîma Tehranê ya ku bi gurkirina şer bersiv da daxwazên wan, şer dikin. Ev rewş vê hevokê bi Abdurrahman Qasemlû dide gotin: "Bi sîwana şerê li dijî Iraqê, îmam Xumeynî plana xwe ya qirkirina kurdan dixe dewrê". Ji ber vê yekê siyaseta Partîya Demokrat a Kurdistana Iraqê kurdên Îranê dilteng dike. Baş e, tevgereke otonomîst çawa dikare bibe hevalbenda rejîmeke ku têgeha otonomîyê bi bahaneya ku li "dijberî îslamê" ye, înkar dike? Ew wisa difikirin ku ev hevalbendîyeke li dijî xwezayê ye..

Hevalbendîya kurdên Îranê ya bi Bexdayê re jî gelo ne li dijî xwezayê ye? Ew, herçendî bawerîyê bi rejîma baas neynin jî, wisa hîs nakin. Li gor çavdêrîya wan, li alîyê din ê çîyayan, li Iraqê, kurdan dît ku di 1974ê de tevî herêmeke xweser, mafên wan ên neteweyî hatin nas kirin; tevî ku pir sînorkirî be jî, parastina mîrasa çanda kurd dibe deskeftek ji bo wan. Bi vê bîrbirinê, kurdên Îranê bi tevahî destek dan –herçendî der barê encamê de gumanbar jî bûn– navbeynkarîya Abdurrahman Qasemlû ya navbera Bexda û YNKê ku bi xwe re di kanûna 1983yê de îmzekirina agirbesteke anî. Ji bo tiştekî wisa wext jî pir maqûl bû, lewre diviyabû ku Iraq li enîyên bakûr û başûr bersivê bide êrişên Îranê. Celal Talabanî vê yekê wiha îzah dike: "Em wisa difikirîn ku Saddam Husên dixwest pirsgirêka kurd çareser bike. Ji bo biserûberkirina hêzên me yên pêvajoya salên dirêj ên têkoşînê ji hev ketibûn, pêdivîya me bêhnvedanê jî hebû. Tehdîda Îranê li himberî Kurdistana Iraqê êdî ji tehdîda Iraqê dijwartir bûbû. Têkbirina Saddam Husên êdî ne hedefa sereke bû."

### Tevî ku li nav çîyayan asê maye, Celal Talabanî dişibe yek ji lîderên herî zêde mirov xwezîya xwe pê tîne

Bi qebûlkirina muzakereyan, Talabanî li tenişta Iraqê cîyê xwe digirt. Lê belê dema ku her du partîyan li hev dikir ku xalên aloz çareser bikin, an jî guftugoyan bikin, bi daxuyanîyeke kurt di 17ê cotmeha 1984ê de xirabûna muzakereyan dihat ragihandin. Bi zimanekî bi temkîn, Talabanî ji vê têkçûnê ne bi tenê Saddam Husên berpirsîyar digire û wiha dibêje: "Muxelefeta partîya kurd a alîgira hukûmetê, zexta hukûmeta tirk a ji berbelavbûna têkoşînê (7) ditirse û têkçûna êrişên îranê bûn sedem ku Saddam dawî li muzakereyan bîne, tevî ku pir hindik mabû ku xalên aloz çareser bibin." (8) Di çileya 1985ê de Talabanî careke din vedigeriya rewşa xwe ya qaçax û çalakîyên gerîlatîyê didan dest pê kirin: Êrişên li dijî karwanên eskerî yên Iraqê, destdanîna ser amûrên karûbarên gelemperî, erebe, çek û dermanan, gerewgirtin (ji bo ku şirketên bîyanî "bacê" bidin wan). Ji ber vê yekê di 1985ê de li gundekî nêzî biryargeha navendî ya Yekîtîya Niştimanî Kurdistan (YNK)ê bi qasî sî bîyanî hatin "pêşwazî kirin", an jî weke ku bi kurdî tê gotin, bûn "mêvan".

Tevî ku li nav çîyayan asê maye, Celal Talabanî dişibe yek ji lîderê herî zêde mirov xwezîya xwe pê tîne. Têkilîyên wî yên pir baş li gel hemû rêvebirên kurd ên Îranê hene. Biryargeha wî ya navendî li ser sînorê Kurdistana Iraqê ye. Tevî bombebaran û kêmbûna berhemên bingehîn, ku Bexdayê ji bo bersivdayîna jinûve destpêkirina şerê gerîla xistin dewrê, hê jî kontrola herêmên berfireh di destê wî de ye û li van deran jîyan di bin venêrîna YNKê de tê bi serûber kirin. Elektrîk hat saz kirin, nexweşxanok hatin ava kirin, qadên perwerdeyê hatin sererast kirin. Xizmeteke anîna qeşayê jî hat eyar kirin: Karwanê hêstiran bi şev hildikişin serê girên bilind û di berbanga sibê de qeşayê tînin. Eynî mîna demûdewrana Hezar û Yek Şevê… Li her gundekî stargeh hene, û hetta mirîşk bixwe jî fêrî xweparastinê hatine kirin.

Hukûmeta Îraqê ji her tiştî haydar e, lê belê naxwaze rewşeke ku nikaribe ji binî derkeve biafirîne. Pirên navbera Saddam Huseyîn û Celal Talabanî hê jî ne hatine rakirin: Her du jî hev re rêzê digirin. Û eger rêvebirê kurd bi dijwarî Partîya Baas a desthilatdara Bexdayê rexne dike, dîsa jî di nirxandinên xwe yên der barê serok de xwedî helwêsteke pir nerm e. Ji bo pirsa: "We yê çi bikira eger artêşa Îraqê êriş biribana ser Kurdistana Iraqê?" Talabanî vê bersiva şîlo dide: " Qûran ji me re dibêje: Bihêlin bila zordar li dijî zordaran şer bikin! Eger îranî êriş dibin ser qereqolên Iraqê, em ê pêşî lê negirin. Wekî din ma em dikarin alîkarîyeke çawa bidin artêşa iraqê ya ku ji me baştir techîzkirî ye? Lê belê, eger îranî êriş bibin ser herêma di bin kontrola me de, em ê herêmê biparêzin". Di êrişên demên dawîyê de, YNKê ev siyaset meşand û hêzên wê, çalakîyên xwe yên li dijî artêşa îraqê ya bersiv dida artêşa îranê, berdewam dikirin.

Baş e, Talabanî wê karibe careke din bi Komara Îslamî re hevalbendîyê bike? Ew vê înkar nake: "Rast e, ji 1982yê, dema jihevçûna me û Tehranê ve, hemû rêyên me yên bi cîhana derve re qut bûn. Lê belê bi ti halî, çi dibe bila bibe em ê li dijî serxwebûna xwe nekevin nav ti danûstandin û muzakereyan.". Li ser pirsa der barê pêwendîyên xwe û PDKya Barzanî de jî bi zimanekî zelal wiha dibêje: "Em amade ne, bi wan re li hev werin, bi şertê ku pêşmergeyên wan vegerin Kurdistanê û rêzê ji serbixwebûna tevgera kurd re bigirin".

Koza şerekî bêdawî, an jî peyayê ser setrencê, kurd êdî ji xala qels a tevgera xwe ya neteweyî ya ku ji bo ku dawî li tenêbûna xwe bîne, haydar in; divê bi awayekî taktîk li gel dijminên dewleta ku ew xwe li nav sînorê wê digire, hevkarîyê bikin. Eger derfetên wan ên peydekirina çareserîyê tinebin jî, qet nebe rêvebir hewl didin êdî bi ti awayî nebin dûvikên dewleteke û ji bo berjewendîyên wê tevnegerin.

Netîceya şerê Îran û Iraqê kîjan dibe bila bibe, kurd dizanin ku ji bo sazkirina demokrasî û xweserîya ji bo hemû gelên li vê herêmê, hê gelek wext heye. Lê belê hêvîyeke nepenî di dilê wan de heye: Ev şer, yê ku kes nikare encamên wî ji niha ve texmîn bike, dikare dengeyên herêmê serûbin bike û sînorên di 1923yê de yên ku bi Peymana Lozanê hatine dest nîşan kirin, bike mijara guftugoyan.

Û eger dîsa aştî li ser pişta kurdan were saz kirin? Kurd di vê yekê de hevdeng in: "Em ê ti caran dev ji têkoşîna xwe bernedin. Wê şoreşeke nû bi gewde bibe".

1 Pêşmerge: Wateya ferhengî "li pêşîya mirinê", navê ku ji dema Komara Mehabadê (1946) û vir ve ji bo şervanên kurd tê bi kar anîn.

2 Rêxistinên din ên muxelefeta îranê, ku gelek ji wan sembolîk in -carna hejmara endamên wan kêmî bîst kesan e– konên xwe li heman wargehê vegirtin, lê belê çalakîyên wan ji polemîkan, ji wergerandina weşanan an jî ji pêkanîna weşanên radyoyê û kêm caran jî ji hin çalakîyên li Iranê pêk tên (Fedayin-Minorité, Fedayin-Achraf, Fedayin-Hoviate, Dengê Karker, Partîya Karkeran, Artêşa rizgarîya gelê Îranê, Fedayin-Hormozgan). Her çi Rêxistina Mucahidînên Xelk e, wê jî biryargeha xwe ya navendî li herêmeke di bin kontrola artêşa iraqê de ava kir.

3 Mijûmorana mehên pêşî yên şoreşê rê dide otonomîstên kurd ku tevahîya Kurdistanê kontrol bikin û saziyên xweser ava bikin: Konseya gundan, dibistan, nexweşxane, dadgehên ku hê jî bi awayekî nepenî çerxa wan dizîvire. Di bin hîmayeya wan û bi alîkarîya wan, gundî dibin xwedîyên zevîyên xwe yên ku heta niha ji bo maldarên mezin (axayan) diçandin, ku ji meha hezîrana 1979ê ve dibin sedemê pevçûneke çînî. Axa û serokeşîr wê destekê bidin hukûmeta îslamî ya ku ew ê jî alîkarîyê bide wan ji bo ku ji xwe re artêşeke bi pereyan (weke cehş tên bi nav kirin ji alîyê kurdan ve û ev peyva tê wateya xayînên li dijî tevgera neteweyî ya kurd) saz bikin.

4 Pasdaran: Parêzvanên şoreşê; kesên ji alîyê pasdaran ve tên wezîfedar kirin û bi rê ve birin.

5 Şerê navbera PDK-Irak û PDK-Îranê hê ji salên 70yê ve dest pê dikin. Wê demê Mustafa Barzani li Kurdistana Îranê wezîfa jandarmatîya Şah girtibû ser xwe..

6 KNB Konseya Neteweyî ya Berxwedanê bi pêşengîya serokê Rêxistina Mucahidînên Xelk a Îranê (RMGÎ)yê Mesûd Radjavî di tîrmeha 1981ê de hat saz kirin. PDKÎ di 27ê cotmeha 1981ê de tevlî navê bû û di nîsana 1985ê de jî jê hat avêtin.

7 Cotmeha 1984ê wezîrê tirk ê karûbarên derve, li gel alîkarê serfermandarê giştî, diçû seredana serokê Iraqê. Peymaneke hevkarîya ewlekarîya sînoran di navbera her du welatan de hatibû îmze kirin. Gelek caran artêşa tirk êriş birin ser xaka Iraqê. Herî dawî di tebaxa 1986ê de balafirên tirk kozik û çeperên kurdan ên li Iraqê dan ber bombeyan.

8 Berevajîya tiştê ku gelek caran divinivîse, çapemenîya rojava ya ku bal dikişand ser analîzên rexneyî yên lîderê YNKê, îmzekirina peymana ku ne behsa pirsgirêka Kerkûkê (bajarê kurd e? bajarê arab e?) dike, ne jî bêçekkirina cahşan. Talabanî li ser xala pêşî gavek bi paş ve avêtibû (lewre, Kerkûk semboleke ji bo kurdan) bi qebûlkirina ku Kerkûk bibe bajarê biratîyê, ango bajarê iraqî, Bexdayê jî di xala duyemîn de tawîz dabû.

* Christiane More Fakulteya Hiquqê ya Grenoble temam kiriye, naskirina wê û kurdan di 1974ê de gava Barzanî li dijî zagona otonomîyê rawestiyaye, çêbûye. Di INALCO de li ser kurdan xwendiye û gelek caran çûye herêmên cûda yên Kurdistanê, bi rêxistin û partîyên wan re hevdîtin pêk anîne. Pirtûkeke wê li ser kurdan bi navê "Kurd Îro, Tevgereke Netewî û Partîyên Polîtîk" di nav weşanên L'Harmattan de derketiye. Nivîskara pirtûka Kurdên îro, tevgera neteweyî û partîyên siyasî, l Harmattan, Parîs, 1984.

### Herwiha li van nivîsan binêrin:

- Gelê kurd, dozeke jibîrkirî li Rojhilata Navîn
- Hertim serhildayî û hertim perçebûyî
- Prensîbên rêxistinên siyasî
- Li Fransayê
- Bîblîyografya
- Vejîna têkoşîna çekdar
- Xalên werçerxê

Wergera ji fransî: Baran Nebar

CIVAKÎKIRINA BINGEHÊ GUHERTINEKE SIYASÎ

# Lêkolînerên çînî doza reforman li welatê xwe dikin

SHEN YUAN, GUO YUHUA, JING JUN, SUN LIPING *

Ev tekst rexneyeke bi palpişt a der barê awayê ku rayedar bi tevgerên civakî re muameleyê dikin, radixe pêş çavan. Versîyoneke wê ya dirêjtir di kovarên çînî de û bi awayekî pir berfireh li ser înternetê -ev jî tê wê wateyê ku bi desteka hin rêveberên welêt- tê weşandin. Ev awa li derveyî muxalif an jî neo-lîberalan, balê dikişîne ser hebûna pêleke xurt a rexnegir a ku ronakbîran, lêkolîneran û berpirsyarên siyasî ji bo pêwistîya pêşvebirina qadeke rewa û mafdar a dengên dijber, li hev kom dike. Li vir mesele, ne guftugokirina rewabûna rejîmê, ne jî xurtkirina zexta li ser rejîmê ye, lê hewldana peydekirina rêyeke din a lihevanîna nerazîbûnên civakî û îstîqrara siyasî ye: Civakîkirina bingeha reformên siyasî. Li gor hin xwendevanan ev pêşniyar zêde şêlo ne. Divê li vir em dest nîşan bikin ku li Çînê tengezarîyên li derûdora van pirsan zêde dijwar in û her vegotina di vî warî de pêwîst dike ku ji alîyê xwedîyê xwe ve pir bi tedbîr bê bi kar anîn.

Sî salan piştî geşedana aborî, bi xêra siyaseta reform û vebûnê, Çîn gihîşt pêvajoyeke hesas û girîng a raguherîna civakî. Rewş bi kurtî bi sê tesbîtan dikare were rave kirin: Geşedana aborî bi lez e; îstîqrara siyasî pêk hatiye; nakokîyên dijwar ên civakî xwe nîşan dan, lê belê îhtîmala ku ew rê li bûyer û teşqeleyên mezin ên civakî vekin, pir qels e.

Di encamê de, ji me re wiha xuya dike ku pêvajo ji bo guherîna rêbazên ji bo pêkanîna îstîqrara welêt hatine bi kar anîn, pir guncaw û musaid e. (1) Dem hatiye ku êdî gav ji bo pêvajoyeke *"birêveberîya dezgehî"* ya zêdetir bi tesîr û kêmmesreftir bê avêtin, pêvajoya ku pala xwe bide ser guhdana berjewendîyên civakî yên hevnegirtî. Zêdetir libendêman, dudilî û awiqandin dikarin bibin sedemên şaşîyeke dîrokî.

Bi rastî jî, em ketine nav xelekeke sergêjker û xapînok: Li hemû qonax û pêlpêlokan, hikûmet hê jî ji bo parastina îstîqrarê zêdetir çavkanîyên mirovî, alavî û diravî serf dikin; li gel vê yekê jî, nakokîyên dijwar û pevçûnên civakî, ne tenê kêm nabin, di heman demê de ew bi awayekî berbiçav zêde jî dibin. Hewlên ji bo parastina îstîqrarê bêtir dibin, lê her diçe îstîqrar kêmtir misoger e. Wêdetirî sedemên objektîf ku encamên pergala aborîya bazarê ne (2), zêdebûna pevçûnên civakî ji ber nebûna fikirîna li ser pêwistîya modeleke nû pêk tên.

Li gor statîstîkên fermî, di sala 2010an de butçeya ewlekarîya navxweyî hildikişe 514 milyar *yenan* (54, 25 milyar ewro) û ev yek nisbet bi sala berê tê wateya zêdebûneke ji sedî 16 ku wê salê jî dîsa nisbet sala 2008ê şahidîya zêdebûneke ji sedî 8,9 kiribû. Ev lêçûn niha êdî digihîje asta butçeya parastina neteweyî. Bi vî awayî, berdêla pêkanîna aramî û îstîqrarê sal bi sal zêde dibe û personelê ku dikeve bin barê vê yekê jî herwisa sal bi sal zêde dibe. Ev êdî bû wezîfa pêşî û sereke ya hikûmetên xwecih. Bi taybetî du pîvanên ewlekarîya civakî – "xweşbînîya sifir" û "mafê vetoyê" (3)– bi kêrî nirxandina karîyera kadroyan tê: Encameke xirab di vê qadê de dikare hemûyên din betal bike. Kêlîya ku gav tê avêtin nav vedoreke sala weke hesas destnîşankirî (4) an jî kêlîya ku bûyereke taybet rû dide, her rêveberî an jî her şirket divê hemû qabîliyetên xwe yên parastina nîzamê bi kar bîne. Li hin deveran, ev yek derbê li karûbarên rojane dixe, hemû karûbarên din ên rêveberîyê li ber vê *"wezîfeya pêşekî û sereke ya mutleq"* qiymeta xwe winda dikin. Eger ev şêwazê şuxulînê neguhere, berdêla wê dikare bibe barekî piştşikên ê neyê hilgirtin.

## Statîstîkên tesîrê li mirovan dikin û xapînok

Ya hê xedartir jî: Tevî ku ji bo başkirina aborîya bazarê û sazkirina civakeke biaheng, wê baştir bûya eger guherînên girîngtir bihatana pêk anîn, ev hewldan ji ber tirsa hercarî ya bêîstîqrarîyê hatin asteng kirin. Reforma pergala siyasî bi biryardarî nehat pêk anîn, azadîya derbirînê bisînorkirî ye, tedbîrên ji bo têkoşîna li dijî gendelîyê nagihîjin encamekê, kom û beşên din ên civakî yên eleqedar li ber çavan nehatin girtin, û hemû civak di nav rewşeke bêhêvî de ye ku her diçe mezin dibe.

Bi vî awayî, hin komên civakî an jî hin kesayetî dema xwestin ku daxwazên xwe yên rewa bi şêweyekî rasterast bînin ziman bi carekê hatin asteng kirin; êdî ti rêyeke din li ber wan nema ji bilî serlêdana navgînên ne-dezgehî, carna jî rêbazên şidetê ji bo balkişandina ser daxwazên xwe û nîşandana nerazîbûna xwe –Ev yek jî nerazîbûnê tûj û dijwar dike. Bi carekê, ew raman mezin dibe ku li gor wê *"xirecirên mezin bi kêrî çareserkirina pirsgirêkeke girîng, xirecirên piçûk jî bi kêrî çareserkirina pirsgirêkeke piçûk tên û bêyî xirecir ti tişt çareser nabe"*. Bi awayekî ecêb, zext berê herkesî dide ser rêbaza derxistina xirecirê ji bo balkişandina ser berjewendîyên xwe. Û li gor sucdarîyên fermî, hêdî hêdî, hin ji wan, livûtevgerên xwe dijwar dikin û dibin *"jeneratorên bispor ên bêaramî û bêîstîqrarîyê"*.

Di civaka çînî ya niha de, di navbera "komên menfaetê" ango beşên civakî de, cudahîyên berbiçav hene. Pirsgirêk ew e ku ji bo van newekhevîyan çerxeke sererastkirin û dengeyê ya karibe van cudahîyan li hev bîne jî tuneye.

Ji alîyekî ve, komên civakî yên kêmderfet û xwedî dezavantaj hene, mesela, emeleyên koçber ên ji gundewarîyê hatine û karker an jî karmendên bajaran ên ji karê xwe bûne: Ew ji rê û derfetên dezgehî yên bi kêrî balkişandina ser berjewendîyên wan tên sûdê wernagirin û ti hêza wan a guftugo û muzakereyê jî tine. Ew herwiha ji her cure amûrên bandorkirina li siyasetên ku wan eleqedar dikin, bi yekcarî bêpar hatine hiştin û ji ber vê yekê ji bo wan pir zehmet e ku di çarçoveya muzakereyan an jî prosedurên lihevkirinê de xwe biparêzin. Li himberî wan jî, komên din ên civakî çavkanîyên girîng dixin bin destên xwe; ji wan tê ku dengê xwe bidin bihîstin û bi riyên cûr bi cûr ji bo berjewendîyên xwe giranîya xwe bidin ser amadekirina siyasetên gelemperîyê û heta di pratîkê de bixwe biryara van siyasetan didin.

Modela niha dihêle ku mirov bifikire ku parastina îstîqrarê û îfadekirina daxwazên civakî bi hev re di nav nakokîyê de ne; bi tenê zext û feraxeta ji berjewendîyên derdorên ji derfetan bêparhiştî jî ji bo pêşîgirtina li pevçûnan bes in. Lêgerîna ji bo pêkanîna aştîya civakî ya kurtedem bû armanceke gelemperî. Çareserî ne tenê wextî û sethî xuya dike, di heman demê de bi destekdayîna parastina berjewendîyên bidestxistî, ew zirareke mezin jî dide dad û edaleta civakî:

Bi ser de jî hin hikûmetên xwecih di vê yekê de giranîya pevçûnan mezin dikin û di livûtevgera herî piçûk de jî dikevin nav xem û tirsê. Helbet, di demekurtîyê de, hin nerazîbûn dikarin bibin sedemên pevçûnên navbera berjewendîyên alîyên dijber û dibe ku hin xirecir rû bidin; lê belê di demdirêjîyê de bûyerên wisa wê di navbera berjewendîyên civakî de bibûna zemîna hêsankirina amadekirina siyaset û tedbîrên xwedî qabîliyeta pêkanîna dengeyekê. Lê belê li şûna vê yekê, tedbîr û reformên pêwist baş nehatin meşandin û hetta, mirov dikare bibêje ku jixwe nehatin dest pê kirin jî. Newekhevî û bêdadî ji berê kêmtir nebûn, berjewendîyên bidestxistî yên beşeke civakê hê jî tên parastin û xurt kirin. Tevahîya civakê bi vî awayî vê firseta pêkanîna ji nû ve bidengekirinê ya ku êdî xwe ferz dike, winda dike.

Vê gavê, em dibînin ku pratîka "kampanyayên" *(yundong)* di salên 1960ê jî 1970yê de, li dijî pirsgirêkekê an jî dijminekî destnîşankirî, rêveberîyê hemûyî seferber dikin. Ev awayê pêkanînê, qanûnan li ber çavan nagire, wan ji hev dixe û mirov dikare bibêje ku wan bi temamî tine dihesibîne. Rêveberên xwecîh ji hiqûqê bêhtir desthilatê an jî hêzê tercîh dikin; carna, ew bi bîrbirineke şaş bang li polîs dikin da ku derkeve pêş û ev jî dibe sedemê krîmînalîzasyon û îdeolojîkkirina rewşan û livûtevgeran. Ev rêbaz nakokîyan ne bi tenê kêm nake, wan dijwartir û hartir dike, berê polîsan dide ser gel, karmendan û girseyên gel bera hev dide, û ev rêbaz di encamê de hikûmetê dixe nava rewşeke lawaz û ji derban re vekirî.

Nîhayet, hikûmet û rêveberî *"butçeya ji bo pêkanîna îstîqrarê diafirînin û ji bo kirîna aştîyê bi pereyan dikevin nav hewldana peydekirina çavkanîyên madî. Bi îfadeya gelêrî, ev tê wateya "çareserkirina nakokîyên gel"* bi bikaranîna "pereyên gel" [wergera ferhengî ya diravê çînê, yenê]. Di pratîkê de, karmend biryara texsîskirina pere û butçeyê didin, bêyî ku guh bidin pîvanên eşkere û serî li protokolekê bidin. Ya rastî ji vî şêweyê desttêwerdanê armanc ew e ku piştgirî were dayîn ji bo livûtevgera kesên ku bawer dikin ku ti pirsgirêk çareser nabe eger xirecir neyê afirandin. Ev şêwe herwiha berê hin kesan dide ser rê û daxwazên derqanûnî an jî dînane



BERFÎN YEKTA (7 Salî)

da ku rêveberî li himberî zextan paş ve gav bavêje. Ev yek bi xwe re tevlîhevîyê diafirîne, nirxandinên der barê rewşan de diguherîne, nirxên civakê yên der barê şaş û rast, heq û neheq de jî serûbin dike. Îmaja hikûmetê ya ku dixwaze bibe garantora sincî û nûnera dada civakî, serûbin dibe. Niha êdî divê demek ji ya din zûtir ev têgihîştina zêde hişk a îstîqrarê were terk kirin û ji bo pêkanîna aştîya civakî rêyeke nû bê vedîtin.

Tevî vê yekê, divê hê jî bi têgihîştina ji nakokîyên civakî ev rewş bê nirxandin. Nakokî û pevçûnên di van salên dawîyê de derketin holê, koka wan, bi piranî, digihîje bêparkirinên ji malûmilk, hilweşandina xanîyan, nedana heqdestên karkerên koçber an jî nakokîyên din ên kar. Ev eger hemû jî xwe dispêrin nakokîyên berjewendîyan. Halbû ku, ji mêj ve, gelek berpirsiyar ketina nav hewldana nîşandana sedemeke îdeolojîk ji bo ku pirsgirêkên mijara gotinê zêde veguherînin pirsgirêkên siyasî yên ku wê bingehên pergalê bixwe jî tehdît bikin. Pir girîng e bê qebûl kirin ku hîmekî rasyonel ê wan pirsgirêkan heye. Eger dijberîyên pergala siyasî, olî an jî îdeolojîk pir bi zehmetî tên çareser kirin û hetta, çareserkirina wan gelek caran ne mumkin be jî, pevçûnên girêdayî nakokîyên berjewendîyan ên navbera beşên cihê yên civakê, dikarin bên guftûgo kirin û li ser bingeha lihevkirinê an jî sererastkirinan dikarin jêder an jî çareyekê bibînin. Pir kêm pevçûn û nakokîyên bi vî rengî hene ku digihîjin rewşên ku bi xirecirên mezin ên civakî bi encam dibin.

Ti caran ev cure pevçûn û nakokî wê bi temamî ji holê ranebin. Îca di vê rewşê de ya baş ew e ku ji bo peydekirina çareserîyan rê û rêzik bên saz kirin, rê û rêbaz bên amadekirin û riyên dezgehî bên afirandin. Ji ber vê yekê pir girîng e ku mirov nekeve nav şaşîya reva ji pêdaketina peydekirina koka pevçûnan, û wan veguherîne alozîyên siyasî yên ku aramî û îstîqrarê tehdît bikin.

Welatê me rastî gelek zor û zehmetîyan hatiye û hin ji wan gelek dijwar in: Gendelîya navbera dewlemend û xizanan, hebûna beşên civakî yên ji derfetan bêparhiştî. Eger ev pirsgirêk baş neyên çareser kirin, dibe ku ew veguherin buhranên mezin ên siyasî. Le belê herçendî pirsgirêk mezin be jî, pevçûn negihiştîne asta tehdîtkirina civakê, ne jî tesîrkirina li meyla giştî ya civaka ku êdî pir bêrîya îstîqrarê û hebûna rêveberîyeke baş kiriye.

## Di heman demê de, divê em xwe ji fikra xapînok a bêîstîqrarîyê rizgar bikin

Di heman demê de, divê em xwe ji fikra xapînok a bêîstîqrarîyê rizgar bikin. Ev ramana zêde berbelavbûyî, xwe dispêre hejmarên fermî û lêkolînên di asta neteweyî de têne meşandin. Li gor van çavkanîyan zêdebûneke pir mezin a pirsgirêkan heye; halbû ku di heqîqetê de ev statîstîk rastî û şaşîyê tevlîhev dikin. Gelek departman û rêxistin hesabên xwe dispêrin anketên bi temamî li ser bûyerên jîyana rojane an jî pevçûnên piçûk. Ji ber vê yekê, car caran pevçûnên piçûçik ên navbera kolejîyan an jî xwepêşandanên protestoyî yên xwendekarên lîseyê yên têkildarî xwarin û vexwarinê yên di çarçoveya dibistanekê de jî weke "*faktorên bêîstîqrarîyê*" tên hesibandin. Gava ev diyarde giş li hev tên zêde kirin û kom kirin, mirov digihîje hejmareke pir mezin û tirsnak. Lê belê *"bûyerên girseyî"* û diyardeyên xwezayî yên pir cihêreng tên tevlîhev kirin, gelek caran bêyî ku ti têkilîya wan a rasterast bi pirsgirêka îstîqrarê re hebe. Li alîyê din, nebûna tedbîr û rêziknameyên bi tesîr ji bo hefsarkirina pevçûnan hestîyarîyeke pir zêde diafirîne, bi wî çendeyî ku carna guftûgoyeke jirêzê jî nikare pêk bê. Awayê bi pêşhukum ê bîrbirinê û rêbazên derdemî yên ku hê jî tên bi kar anîn, bi tenê bi kêrî jehrkirina atmosferê tên û dibin sedemên berbelavkirina tirsê. Eger me karibûya xwe ji van "faktorên bêîstîqrarîyê" yên şaş rizgar bikira, rewş ê zelal bibûya; nexasim gelek lêkolîn û anket nîşan didin ku nebûna çerxeke liberçavgirtin û parastina berjewendîyên gel, çavkanîya hejmareke mezin a bûyer û pevçûnên dijwar e.

Di rapora xwe ya 2010ê a ji bo meclîsa gel a neteweyî pêşkêşkirî de, serokwezîr **Wen Jiabao** ev daxuyanî dida: *"Her tiştê ku me kir ji bo wê yekê bû ku gel karibe jîyaneke bextîyartir, birûmettir binase û bigihîje asta civakeke adiltir û biahengtir"* (5) Ji ber vê yekê awayê bîrbirina nû divê di nav destûra bingehîn a ku gelek mafan ji bo welatîyan vedinase, ji xwe re derfeta pêkanînê bibîne. Ancax bi misogerkirina van mafan mirov dikare bigihîje asta dengeyeke navbera berjewendîyên derdorên dijber; tenê bi vê dengeyê mirov dikare aştîya civakî jî pêk bîne. Ev e riya ku divê em bidin ser û bişopînin. Bi awayekî din eger mirov bibêje, parastina mafan, di heman demê de parastina îstîqrarê ye.

Ji bo baş meşandina vê wezîfeyê, wê pêwist be ku berî hertiştî wezîfeyên hikûmeta xwecih bên veguhertin û kêmkirin, neyê hiştin ku ev hikûmet bikeva rêza pêşî gava ku pevçûnên civakî rû didin, û rola wê ya navbeynkar û hakemîyê ya di van pevçûnan de bê xurt kirin.

Dûre divê çerx û mekanîzmayên rêveberîyê bi awayekî wisa werin zexim kirin û baş kirin ku serlêdana li qanûn û hiqûqê bibe rêbaza asayî û bi tesîr ji bo çareserkirina lihevnekirinan; divê rêyên dezgehî yên ku destûrê bidin derbirîna nerazîbûnên di nav civakê de bên afirandin; û herî dawî jî divê pêkhatin û bigewdebûna komeleyên welatîyan bên teşwîq kirin û mekanîzma û strukturên ku xebata çareserkirina pevçûnên civakî ji xwe re bikin armanc bên afirandin.

Bi awayê pratîktir, wê baş be ku şeş mekanîzmayên dezgehî bên sazkirin û şuxulandin (*nivîsa di malikê de bixwînin):*

- misogerkirina mafê bidestxistina agahdarîyeke şefaf û bêkêmasî li ser mafxwestinan, li ser daxwazên civakî û prosedurên ku ji bo çareserîya wan pêwist in.

- sazkirin û biserûberkirina rêxistineke kollektîf a derbirîna beşên cihêreng ên civakê da ku di navbera wan de aheng û hevdengî pêk bên;

- afirandina pergaleke munasib da ku welatî bikaribin xwe îfade bikin û beşdarî pêvajoya wergirtina biryaran bibin.

- amadekirin û sazkirina navgînên zextê bi taybetî ji bo kesên herî zêde ji derfetan bêparhiştî yên ku sermaye û samana wan a civakî tine da ku karibin tesîrê li biryaran bikin.

- biserûberkirina cîyên lihevkombûn û danûstandinan li derveyî hukûmetên xwecihî, destûrdayîna ji bo civakê da ku gavên xwe yên pêşî ber bi xwebirêvebirin û xwesazkirinê ve bavêje;

- afirandina dezgeheke lihevanîn û hakemîyê li bin banê hikûmet û dadgerîyê.

Ev her şeş mekanîzma temamker û zarûrî ne, eynî weke qatên heman avahîyê. Di ser de jî, hebûna rêxistin û komeleyên civakî yên bi tesîr divê xwedî ast û hêzeke wisa be ku ew karibin hem bi kêrî kêmkirina derketina holê ya nakokî û pevçûnên dijwar bên, hem jî bi kêrî çareserkirin û lihevkirina wan bên.

Ferqa navbera gerînendeyîyeke baş û xirab ne girêdayî hebûn an jî nebûna pevçûn û nakokîyan e, ew girêdayî kapasîteya bi xweşbînî pêşwazîkirin û çareserkirina wan e. Di heqîqetê de, pergaleke baş ne ew e ku nakokîyan ji holê radike, lê belê ew e ku dikare xwe li pevçûn û nakokîyan ragire û di çarçoveyeke dezgehî de ji bo wan çareserîyekê peyde bike.

Em baş dizanin ku gava hemû beş û çînên civakî êdî karibin bi rêyên legal û qanûnî daxwazên xwe yên rewa bînin ziman, û nemaza gava berjewendîyên kollektîf jî derfeta xweîfadekirinê bi dest bixin, civaka me êdî wê bi vedoreke fûrîn û pijiqînê *(jingpen qi)* ya pevçûnên civakî re rû bi rû bimîne. Herkes wê bixwaze xwe îfade bike û wê bi vê rewşa nû û nedîtî ve rû bi rû bê mayîn. Divê bêyî ku sivik were dîtin, lê pir jî neyê mubalexe kirin, pirsgirêka hesas ji nêz ve were lêkolîn, bi taybetî gava ku pergala nû were biserûber kirin.

Berî hertiştî, ev diyardeya pijiqînê divê ne girêdayî çerxa derbasbûnê be: Riyên nû yên xweîfadekirinê wê pêşî vekin li xuyabûna pevçûnên civakî yên heta hingê veşarîbûn, û ew ê derfeta çareserîya wan a bi tesîr jî derînin holê. Ji bo bi awayê herî bêderd li pey xwe hiştina vê qonaxê, divê tedbîrên derbasbûneke aqilane û realîst werin girtin. Mirov dikare, li gor prensîbeke besît, sererastkirinên cihêreng pêk bîne: ji bo çareserkirina pirsgirêkên berê, emê serî li awayên berê yên çareserîyê yên ku bûne navendî bidin, û ji pratîkên berê sûdê wergirin; ji bo çareserkirina pirsgirêkên nû jî, em ê çerxên nû yên dezgehî yên çareserîya pevçûnan bi kar bînin.

Dûre, ji bo pêşîlêgirtina şokên zêde dijwar, dibe ku helwêsteke pêşverû were nîşan dan û ji jor ber bi jêr bi taybetî çerxeke xweîfadekirin û zextê were afirandin. Divê hem rêveber hem jî yên tên bi rê ve birin baş bên çavdêrî kirin, da ku bibin xwedî hişmendîya girîngîdana bi çerx û mekanîzmayên nû û bikaribin bi serwextî riyên legal ji bo çareserîya pevçûnên civakî bi kar bînin. Mirov dikare, eger pêwist be, bikeve nav hewldana pêkanîna hin ceribandinên pîlot. Ev ceribandin divê ji nakokî û pevçûnên zêde deng vedidin lê belê yên bêzirar, pêk bên. Ango divê pevçûn zêde zirarê nedin civakê û ji bo vê yekê jî divê li deverên ku tedbîrên pêwist wergirtî ev ceribandin werin pêk anîn. Ceribandinên wisa wê karibin wezîfedarên di hemû qad û pileyan de li tevahîya welêt hestîyar bikin.

Geşedana bilez a aborîya neteweyî ji bo çareserkirina nakokîyên civakî bi riyên dezgehî, çavkanîyên diravî tedarîk dike. Aramîya bingehîn a çarçoveya siyasî jî ji alîyê xwe ve wê bihêle ku zemîna çareserîya pirsgirêkan bikemile. Ji vê jî girîngtir, herçendî struktura civaka Çînê ji neqeb û kûrahîyên mezin ên navbera çînên civakî pêk bê, cudahîyên navbera wan roj bi rojê mezintir bibin û nakokî tevlîhevtir û dijwartir bibin jî, piranîya gelê Çînê dîsa jî naxwaze çareserîya van pirsgirêkan bi teqînên şidetê û pêlên xirecirên dijwar pêk were.

Eger em huqûqê weke bingeh qebûl bikin, di şertûmercên aborîya bazarê de, wê jî me re pêwist be em giranîyê bidin sazkirina demûdezgehên sîstemeke ku girîngîyê bide mafê derbirînê û ahenga berjewendîyan, û bi vî awayî bikevin nav amadekirina xerca hîmekî ku em bikaribin li ser aştîyeke mayînde ya civakî saz bikin.

* Ev tekst xwe dispêre xebatên li ser geşedana civakî yên komeke pir firehtir a beşa sosyolojîyê ya Zanîngeha Qinghua, Pekîn.

1 Têbînîya redaksîyonê: "Îstîqrar" dîrûşmeyeke desthilatdariyê ye û desthilat gelek caran wê bikar tîne

2 Têbînîya redaksîyonê: Bo nimûne, rewşa têkoşîna karker û gundiyan (*mingong*) li dijî kedxwariya karbidestan

3 Ev pîvan weke "mafê vetoyê" tê bi nav kirin lewre ew dikare hemû têbîniyên bikêrî nirxandina kariyera kadroyan tên betal bike

4 Têbînîya redaksîyonê: Ev dibe ku hezîran be û bîranîna bûyerên li qada Tienanmenê di 1989ê de an jî salvegera avabûna Komarê ya di yekê cotmeha 1949ê de be

5 Gotara li pêşberî Meclîsa Gel a Neteweyî, 5 adar 2010

Wergera ji fransî: Baran Nebar

# Şeş pêşniyaz

**Şeş amêrên ku wê karibin bên saz kirin û bi cih kirin; her yek ji wan wê bi serê xwe be, lê belê wê piştgirîya yên din jî bike.**

1/Amêra pêşî wê bibe pirek ji bo derbasbûna nav qada agahdarîyeke vekirî, şefaf, bêkêmasî, objektîf, a ku bi saya wê, welatî wê bikaribin ji mijar û mijûlahîyên derdorên cihêreng ên pêwendîdar serwext bibin û têbigihin û di wextê diyarkirî de bi liberçavgirtina berjewendîyên hemû alîyan, wê biryarên ji bo raya giştî bên dayîn. Ev çerx wê li ser bingeha prensîbên geryana agahîyên têkildarî karûbarên gelemperî û misogerkirina mafê bidestxistina agahîyan bizîvire û bi vê yekê, wê xwegihandina qada xwendina belgeyên ne sinifandî yên ji bo gelemperîyê jî pêk were.

2/ Ya duyemîn wê karibe bibe alîkar û piştgir ji bo pêkanîna hevgirtin û ahenga navbera daxwazên girêdayî berjewendîyên taybet û ji ber vê yekê jî hevnegir. Têkildarî çavkanîyên diravî û navgînên xweîfadekirinê ku her yek ji wan jê sûdê werdigire, heta ku cudahîyeke mezin di navbera komên civakî de hebe, avakirina rêxistineke kollektîf a derbirîn, ragihandin û danûstandinê wê pir bi kêrhatî be ji bo parastina beşên xizan ên civakî yên rewşa wan zêde nazik. Tecrube radixe pêş çavan ku dema di navbera berjewendîyan de ahengek hatibe pêk anîn, bi pêvajoyeke danûstandin û îradî pir hêsantir e xwegihandina çareserîyekê.

3/ Divê pergaleke wisa munasib were pêk anîn ku bi navgîna wê welatî karibin xwe bi awayekî bi tesîr îfade bikin, lez û geşedanê bidin beşdarîya raya giştî ya nav hin qadên weke temaşevanî, derbirîna ramanê, çavdêrî, civînên nirxandina li ser her cure pirs û pirsgirêkên têkildarî berjewendîyên gelemperî. Di heman demê de, wê pir li cih be eger mafê îfadekirina daxwazan di medyaya girseyî de were misoger kirin.

4/ Amêreke din jî wê bicihkirina derfetên ji bo pêkanîna zextê ji xwe re bike armanc. Halê hazir, kom û beşên civakî yên têkildarî çavkanîyên diravî yên girîng ji bo parastina berjewendîyên xwe xwedî derfetên derbirînê ne; kom û beşên civakî yên xizan û hesas jî divê bikaribin ji çerxeke cidî ya zextê sûdê wergirin -di çarçoveyeke qanûnî de, bêguman.

5/ Amêreke şewirîn û danûstandinê dikare were afirandin û bi saya wê, komên civakî wê karibin bi awayekî rast û bitesîr astengî û zehmetîyên li pêşîya xwe çareser bikin. Civak bi vî awayî wê bikeve nav hewldana avêtina gavên pêşî ber bi xwebirêvebirinekê, ber bi xwebiserûberkirinekê. Di rewşeke wisa de, hukûmet wê pêdivî nebîne rasterast dest werde nav van karûbaran, ev yek jî wê hem barê rêveberîya welêt sivik bike, hem jî lêçûnên diravî kêm bike. Ji niha ve, divê bilezûbez prensîba danûstandinên navbera alîyên nûnerîya sermaye û karûbar dikin, were bi cih kirin.

6/ Amêreke navbeynkar û îradî wê were saz kirin ji bo hemû rewşên ku tê de her du alîyên dijber bikaribin xwe bigihînin lihevhatinekê. Û rola îradî ya dawî di van şertûmercan de divê aîdî hukûmet û dezgehên dadgerîyê be. Di çarçoveya pergaleke wisa de, hukûmet, herçendî ji bo sererastkirina hertiştî rasterast xwe nexe nav van karûbaran jî, ji bo hêsankirina danûstandinan dikare dîsa jî roleke dezgehî pêk bîne û di encamê de bibe kefîlê çareserîya herî dawî.

Ji bo ku ev yek bimeşe, pêwist e ku ev şeş çerx bigihin hev û bi hev re di nav têkilî û ahengekê de bişixulin.

Wergera ji fransî: Baran Nebar



Robîn Satik (10 Salî)

Serokdewletê Ûgandayê Yowerî Mûsevenî ku bi nerazîbûnên gel re rûbirû ma, zext û zor tercîh kir: tepisandina polîswarî, kontrola medyayê, çavtirsandîkirina muxalifan. Ya rastî, bilindbûna buhayê tiştên ji bo jîyanê pêwîst û skandalên bertîlxwarinê, rejîma ji bîstûpênc salan ve heyî, qels dikin. Krîzê herweha alozîyên bi monarşîyên ji rêûresmê re ji nû ve zindî kirin, nexasim yên bi meliktîya Bugandayê re ku doza mafên xwe yên li ser milk û erdan dike.

PIRSGIRÊKEKE BI QASÎ SERXWEBÛNÊ KEVNAR

# Li Ûgandayê melik, dewlet û erd

ALAIN VICKY *

*Qîmeta erdên me yên berê, her ku diçe zêdetir dibe. Em dixwazin ku ew li me bên vegerandin da ku em bixwe van erdan bifiroşin an jî bidin bi kirê, lê hikûmet guhdarîya me nake: Ew bi ya xwe dike, weke ku Xwedê be"*, **Charles Peter Mayigayê** berdevkê *Bagandayê,* mezintirîn ji meliktîyên şopewer ên *Ugandayê,* şermezar dike. Baganda şeş mîlyon in û ew li nav peravên *Gola Vîktorîyayê*, Kampala ya paytexta welêt û erdên mayî yên vî welatê sî û didu mîlyon niştecihan belavbûyî ne. Xelkê van deveran *"weha hîs dikin ku kesên din erdên wan desteser kirine û tiştekî kirinê tune*, dîroknas **Phares Mutibwa** şirove dike *û ev jî dibe sedema dijberîyeke kûr. Tansîyon bilind dibe (...). Yên ku îroj xelkê ji xanîyên xwe dûr dixînin, dibe ku ew sibe bixwe ji xanîyên xwe bên dûr xistin"*. (1)

Ugandaya ku ji sisê yekê para erdên cotyarî yên *Afrîkaya Rojhilat* di xwe de vedihewîne, ji bo veberhênerên bîyanî yên *Kendava Fars* û jêrparzemîna hind, bûye cihekî nû, bijarte. Van çar salên dawîn, heşt sed hezar hektar bi awayekî demdirêj hatin firotin an jî bi kirê hatin dayîn.

Kampalaya bi tenê 201 km² fireh û paşxana spekulasyoneke xeyrîmenqûl a bê navber, ji 2 850 niştecihan li 1912ê, îro derbasî 2 mîlyonan bû. Şerê li *Komara Demokratîk a Kongoyê* (KDK) li dawîya salên 1990ê û yê *Başûrê Sûdanê* heta 2005ê, her weke qeyrana hilbijartinê ya zivistana 2007ê li *Kenyayê* rû da, kir ku serokeşîr û patronên pirhejmar pereyên xwe di nirxeke parastî, yanî xeyrîmenqûl, de razandin. *"Ev hêsantirîn awayê şûştina perê ye*, **David Mpanga** yê parêzer rave dike. *Eger hûn pereyê bertîlxwarinê, yê hin efserên ugandî ku beşdarî talanên şerê Golên Mezin an jî jirêderxistina fonên alîkarîya pêşdeketinê li hev zêde dikin, hûn dikarin vê firîna bihayê erdan fêm bikin. Li ser girên paytextê yên herî tên xwestin, nîvakreyek* [% 20ê hektarekê] *bi qasî 500 000 dolaran e. Ev xeleka xirab jî hîn bêhtir pereyan bi xwe ve dikişîne"*. Ew her weha agirê sedsalane yê nakokîya xelkê *Bagandayê* li hemberî dewleta navendî gur dike.

## Hevgirtina şertan li dijî Îdî Amîn Dada

Berî ku di dema serxwebûnê de bibe paytexta *Ugandayê*, *Kampala* paytexta meliktîya *Bugandayê* jî bû. Bi xêra giranîya navendîkirina îqtîdarê û rewşeke coxrafyayî ya têkûz, ev dewleta pêşdagirkerî, mîrnişîneke destûrî ya rasteqîn ku li sedsala 14ê ava bû, ji 1890ê û vir de bûbû hevkara sereke yê dagirkerên brîtanî. Evên ha, yên ji peravên *Oqyanûsa Hind* hatî, bi vî awayî herêma ku **Wînston Churchill** paşê navê *"durra Afrîqayê"* lê kir jî îşxal kiribû. 1900ê, bi peymaneke navbera *London* û *kabaka* (hikûmdar) yê meliktîyê, *Buganda* bû parêzvanîyeke ingilîzî. Ji bo mîqdareke 500 lîrayên sterlîng ji melik re dayî, *Londonê* ji 50 763 kîlometreyên çarçik yên meliktîyê, 23 300 kir malê xwe (2) - erdê *Kampalayê* jî di nav de. Beşeke din a 906 kîlometreyên çargoşe ji bo melik jî hat veqetandin û erdên civatî yên mayî, li nav pêncî û didu serokeşîrên *Bugandayê* lêva bû. Qanûna ingîlîz a bi navê *mailo* jî rê da ku kesên ne bagandayî li wir bi cih bibin: *"Îmzeya li bin kaxizekê tenê bes bû"*, profesor **Mutîbwa** rave dike.

Bi serxwebûnê re, li 1962ê, 23 300 kîlometre çarçik yên erdê li meliktîyê tên vegerandin. Melikê *Bugandayê* jî, **Edward Mutesa II**, dibe serokkomarê pêşî yê *Ugandaya* nû - heta ku serokwezîrê wî, **Mîlton Obote** yê ji bakurê welêt, li 1966ê biryara dawîlêanîna vê dewleta di hindûrê dewletê de bide û Destûra Bingehîn a Federal bicemidîne: Ew **Kabaka** ji text dixe û serokkomarîyê ji xwe re dihêle. 24ê gulana 1966ê, hêzên hikûmetê yên di bin fermandarîya **Îdî Amîn Dada** de qesra melik a li ser girê *Mengoyê*, li *Kampalayê,* talan dikin û nêzî sed parêzvanên wî dikujin. **Mutesa II** mişextî *Londonê* dibe û li wir, li 1969ê dimire. 23 300 kîlometreyên çarçik ji hêla dewletê ve tên zeft kirin û meliktîya şopewer tê betal kirin. Bîst salên dîktatorî, desttêwerdanên bîyanî û raperînên li pey hatî jî dikin ku, di kaosa çûnûhatina koçberîyên bi darê zorê de, ne-bagandayîyên pirhejmar li ser erdên melikên berê bi cih bibin û bi dûre wan erdan bi kirê bidin koçberên meliktîyên din ên welêt.

Bi hatina ser kar a **Yowerî Musevenî** li 1986ê, piştî pênc salên gerîlatîyê, meliktîya *Bugandayê* hêvîyeke nû ji xwe re peyda dike. Desthilatdarê nû yê *Ugandayê* li hemberî wê bi deyn e: Bêyî piştgirîya wê, serîhildêrên *Artêşa Berxwedana Neteweyî* (NRA) dê nekaribûna " şerê devîyê" heta *Kampalayê* bimeşînin û bihêlin ku baskê siyasî, *Tevgera Neteweyî ya Berxwedanê* (NRM), îqtîdarê zeft bike. (3) Ji ber hindê, li 1993ê, **Musevenî** meliktîyan dîsa bi cih dike. ***Kabaka*** yê nû yê Bugandayê, melik **Ronald Muwenda Mutebî II,** bi merasîmeke giregir hildikişe ser text û qesra xwe di gel 906 kîlometreyên çarçik yên jê re veqetandî dîsa vedigre. Lê belê 23 300 kîlometreyên çarçik yên berê di destê dewleta navendî de dimînin û vegerandina wan jî dibe hedefeke têkilîyên nava meliktî û dewleta ugandî.

Ji dawîya salên 1980yê ve, kirêdarên navneteweyî dixwazin ku pergaleke xwedîtîya ferdî cihê rejîmên xeyrîmenqûl ên şopewer -ku zêde kevnare tên hesibandin- bigire. Armanc ev e ku bazareke rasteqîn a li gor qeydên erz û talebê bê vekirin. Serokkomar **Musevenî** yê dixwaze nîşanên "hikumdarîya çê" bide xuya kirin, bi vî hawî siyaseteke ferdîkirina bi lez û bez a erdên welêt dide meşandin. Li tîrmeha 1998ê, zagoneke ji bo hêsankirina van pevguherînan û fermîkirina xwedîtîya erdan tê pesindkirin. Desteyên birêvebirina erdên navçeyan (*District Land Boards*), navberkarên nû yên îqtîdarê, dest bi belavkirina erdê dikin. Weke piranîya reformên ku bi piştgirîya sazîyên fînansayê yên navneteweyî (IFI) hatin meşandin, feydaya qanûna 1998ê bi taybetî ji bo veberhênerên ferdî yên bi quwet tê. Mexdurên wî yên sereke jî niştecihên bê tapo ne, yên ku bi sedsalan e li wir rûdinin û "hemdemkirina" qanûnî ji bo wan vediguhere dizîyê bixwe.

## Lihevnekirinên li ser milk û xeyrîmenqûlan li ber dadgehan dikevin ser hev

Rojnamevana *The Guardian*a brîtanî û yek ji berpirsên bloga *Katine* ya jîyana rojane li gundekî bakurê Ugandayê vedibêje **Anne Perkîns**, şirove dike: *"Guherandina rejîma hiqûqî alîkarîya tu kesî nekir, ji bilî yên ku dixwest şirketên xeyrîmenqûl ên mezin û bazirganî saz bikin,. Merivên xwedî tapo ne, tenê dixwazin pereyan veberînin, lê her weha xwedîyên sermayekê ne, ji bo peydakirina pereyan jî. Di gel kêfxweşîya Banka Cîhanê, vê ya kir ku Musevenî qanûnê 1998ê bide pesind kirin"*. (4) Li 2010ê, ji bo ku tansîyon dakeve, zagoneke nû riya gilîkirina dadê li ber mexdûran vedike. *"Dibe ku niyeta hikûmetê baş bû jî*, **Lîvîngstone Wewanyana** yê serokê *Weqfa Ugandî ya ji bo Mafên Mirovan* (FHRI) rave dike, *lê vê hewldana bicihkirina rengekî qanûnîbûnê di têkilîyên şopewer ên navbera xwedî û rûniştevanan de, yên ku bi xwe kompleks in, bi tenê nakokîyên xeyrîmenqûl zêde kiri"*. (5)

Meliktîya *Bugandayê* ya bi xêra reklamên radyoya xwe û bacên erdên xwe yên mayî budceyekê ji xwe re vediqetîne, bi rîya ***Budanga Land Board*** vê qanûnê bi tundî protesto dike. Her çi hikûmet e, di çapemenîya navneteweyî de weha xwe diparêze: *"Giregirên bugandayî li herêma navendî xwedîyên erdan yên sereke ne, û Kabaka bixwe ji nav wan yê herî di pêş de ye. Reforma cotyarî dê pergala xwedîtîyên wan xira bike"*. (6)

Li ber dadgehên *Kampalayê*, nakokîyên xeyrîmenqûl li hev zêde dibin. Cotyarên piçûk ên herî xizan heta nikarin parêzerekî jî ji xwe re peyda bikin; dozên tapûyên sexte yên bi riya bertîlxwarina memûrek an jî kadroyekî birêvebir bidestxistî, li pey hev tên vekirin. Li ser dîwarên taxên xizan yên paytextê, ku ji nişka ve ji nav erdên avzê yên ber bi gola Vîctoriayê derketin holê, hişyarî zêde dibin: "***This House is Not For Sale***" ("Ev xanî nayê firotin"). Armanca wan ev e ku rê li ber firotina erdan ya bêyî destûra xwedîyên wan bigrin.

Avahîsazan aniha çav berdaye ser taxên xizan ên li kevîya bajaran ku % 21 erda *Kampalayê* digrin. Lojmanên ji çîna navîn a nû re veqetandî jixwe li kêleka van giravên xeyrîresmî yên xizanîyê bilind dibin, ku rûniştevanên wan jî koçberên ji *bakurê aşolî* ne û bi piranî ji bo şirketên ewlehîyê yên ferdî de dixebitin ku mezin dibin. Giregirên meliktîya *Bugandayê* jî di vê leystika nezelal de cihê xwe digirin. Li ser girekî hemberî yê qesra melîkî veniştî, hikûmeta ***Kabaka*** bi vî hawî li du koman dabeş dibe: Muhafezekarên ji xwesteka xwe ya vegerandina 23 300 kîlometreyên çargoşe çarçik yên berê 1966ê danakevin, û guherînerên ciwan ku amade ne bi derdora berjewendîperest a serokkomar **Musevenî** re kar bikin. Qedera 906 kîlometre çarçik yên erda mayî jî, ku ***Buganda Land Board*** aniha bi rê ve dibe, mijarê nîqaşên tund û tûj e.

Destûra bingehîn a 1995ê pêşniyar dike ku melikên *Ugandayê* -welat nêzî deh meliktîyên şopewer di xwe de vedihewîne -dê bi tenê roleke çandî bileyizin. **Apollo R. Nsîbambî** yê serokwezîrê wê demê rave dike: *"Maddeya 246ê siyasetkirinê li serokên şopewer an çandî qedexe dike. Çima? Ji ber ku dema tevlî jîyana siyasî dibûn, wan ne tenê meliktîyên xwe leva dikirin, lê belê wan her weha fikar bi hikûmeta navendî re çêdikirin"*. Lê belê *Bugandayê* li 2007ê cara yekem ev xeta sor derbas kir û çend hezar kes li *Kampalayê* anîn cem hev. Sedema vê xwepêşandanê, veqetandina 7 100 ji 30 000 hektarên daristana *Mabîrayê* ya weke ziyareteke şopewer tê hesibandin, ji fîrmaya şekirçêkirinê ya hindîstanî *Mehtayê* re bû. Fîrmayê dixwest coteke bîyoetanol lê saz bike. Kabaka beşeke ji 906 kîlometre çarçik yên xwe jê re pêşkêş kir, lê hikûmetê ev pêşniyara wî red kir. Li Kampalayê, şerî sê mirî li dûv xwe hiştin, peyayekî hindîstanî yê xwepêşandêran lê xist jî di nav de. Li ser vê, rayedaran qerara cemidandina projeyê da. Li navbera Buganda û desthilata serokkomarê **Musevenî,** *"şerê sar"* dest pê kiribû.

Li 10ê îlona 2009ê, xwepêşandaneke nû li paytextê rû da. Vê carê, sebeb



BEDIRXAN DEVECI (7 SALÎ)

biryareke hikûmetê bû ku -bi fermî ji ber sedemên ewlehîyê- ziyaretkirina reîsên wî di devereke meliktîya wî de li kabaka qedexe kir, lewre ku serokê vê deverê yê şopewer ne baganda bû û ji hêla serokkomar **Musevenî** ve hatibû peywirdar kirin. **Yacine Alume** yê profesorê ilmên siyasî li zanîngeha Makerereyê binxêz dike: *"Serokkomar vê taktîka 'dabeşkirina ji bo bêhtir hikmkirinê' pir bi kar tîne"*, Zordestîya polêsî bû sedema mirina nêzî sî kesan.

Dibe ku alozîyên bi vî rengî êdî li herêmên din jî rû bidin, lewre ku ji derveyî Bagandayan, komên nijadî yên din jî eleqedarên dizîya xeyrîmenqûl in. Hê jî % 80yê xeyrîmenqûlên ugandî li gor pergalên şopewer tên bi rê ve birin. Li bakur, li ser erdên giştî yên aşolî ku artêşa ugandî bi hovane *Artêşa Berxwedana Xwedê* ji wan derxist (7), rûniştandina du mîlyon kesên sirgûnkirî dibe pirsgirêk. *Sewayana* piştrast dike : *"Şerê li bakurê Ugandayê ji hinan re bûye fersenda bidestxistina erdên kesên bi darê zorê sirgûnî wargehên pênaberan bûyî"*. Avabûna welatekî afrîqî yê nû, Başûrê Sûdanê, li alîyê din ê sînor, dilbijîna li ser herêma ku heta niha çardorên wê girtî bû jî zêde dike. (8) Riyeke asfalt a ji hêla Ajansa Amerîkî ji bo pêşdexistina navneteweyî (Usaid) ve fînansekirî ku korîdoreke bi rastî ya aborî ya 600 kîlometroyî dirêj e û *Kampala* û *Juba* ya li Başûrê Sûdanê bi hev ve girêdide, li ber temamkirinê ye.

Lê belê rîskên tansîyonê bi taybetî li rojhilata welêt bilind in, li ser erdê şopewer ê *Bunyoroyan* ê ku li dirêjîya gola *Albert*, sînorê xwezayî yê bi KDKê re diçe. Li wir, dibe ku petrol û gazên ku li 2006ê hatin kefş kirin, daneyên xeyrîmenqûl ser û bin bikin. Tê gotin ku devera li bakurê dola mezin a *Rîftê* berfireh dibe, du mîlyar barîlên petrolê di bin xwe de vedihewîne. Fîrmaya îrlandî ***Tullow Oilê*** para mezin ji xwe re misoger kir: Destûreke kefşkirinê ya 150 kîlometre çargoş çarçik li cem parka xwezayî ya ***Murchînsonê***. Fransîyên şirketa ***Total*** û Çînîyên şirketa fermî *Chinese National Off-Shore Oil Company* (CNOOC) jî niha pareke ji sisê yekê di cewherên maddeyî yên *Tullow Oilê* de, her yekê bi 1.5 mîlyar dolaran ve guherandin. Îtalîyên *Ente Nazionale Idrocarbur* (Eni) jî li ser dozê ne. Bikaranîn û sûdwergirtina ji kanî û bîran wê ji niha heta 2012ê dest pê bike. Di nav projeyên cihê de, sazkirina rafînerîyekê jî heye ku dê li asoyê 2016ê, bi xêra rojê derêxistina ji 20 000 heta 25 000 barîlan, serxwebûna enerjetîk a welêt misoger bikin. Barîlên mayî dê ji *Mombasa* ya li *Kenyayê* re bên şandin, bi riya xeteke lûleyan ku çêkirina wê aniha sekinî: Trîpolî pareke fînansmana projeyê dikir û şerê li Lîbyayê tesîra xwe li pêşdebirina xebatê dike.

Soza ku tê dan: "Petrol wê herêmê biguherîne... Ber bi başîyê ve"

*"Dereweke din e! Dema ku petrol hat dîtin, em pir dilşad bûn. Me digot qey Bunyoro wê pêş ve biçe û xwe ji rewşa belengaz a ku dagirkerên brîtanî ew tê de hişt, rizgar bike. Heta îro jî, zanîngeheke me tuneye û bijîşk li nexweşxaneya me kêm in. Lê me dît ku hemû belge hatin îmze kirin, bêyî ku civata me bibe xwedîya mafê axaftinê"*

Tê gotin ku şêst kîlometre çarçik yên erdên civatî yên meliktîya *Bunyoroyê* li 2010ê ji hêla *"kesayetîyên payebilind"* ve hatin kirîn. (9) Tapû bi bertîlxwarina memûrên Komîsyona Erdên Ugandayê (*Uganda Land Commission*) hatin standin. Ji nav van giregirên bertîlxwur, şahqîzeke *Bunyoroyê* ya kevneseroka koma wekîlên NRMê li Meclîsê û wezîra agahdarîyê ya berê jî heye: ***Kabakumba Masîko***. Li Kampalayê, ew vê sozê dide: *"Petrol wê herêmê biguherîne. Ber bi başîyê ve"*. Bê guman lewre ye ku yekîneya elît a zêrevanîya serokkomarî dest bi parastina deverê kir. Fermandarê yekîneyê jî **Muhoozî Kaînerugaba** yê kurê serokdewlet bixwe ye.

**Brian Glover** ê serokê şaxa ugandî ya *Tullow Oilê* di rapora xwe ya 2009ê de xuya dike: *"Li hindik cihên dinyayê, coteke petrolê li nav şêr, fîl, gamêş û zirafeyan tê sazkirin"*. Sazkarê îrlandî jî spasîya *"meliktîya Bandura Petar"* dike ji bo ku rê li ber vê keşfê vekir. Pirsgirêk jî ev e ku li Bunyoroyê hikumdarekî bi vî navî tuneye. Li Masîndîyê, **Kiiza Yaberî** yê muhendîs, "serokwezîrê" (10) meliktîyê, hîn pê ne bawer e: *"Dereweke din e! Dema ku petrol hat dîtin, em pir dilşad bûn. Me digot qey Bunyoro wê pêş ve biçe û xwe ji rewşa belengaz a ku dagirkerên brîtanî ew tê de hişt, rizgar bike. Heta îro jî, zanîngeheke me tuneye û bijîşk li nexweşxaneya me kêm in. Lê me dît ku hemû belge hatin îmze kirin, bêyî ku civata me bibe xwedîya mafê axaftinê"*. (11) Henrî Ford Mîrîmayê berpirsê ragihandinê ji bo meliktîyê hişyar dike *"Dema ku petrol ê biherike, dibe ku ciwanên Bunyoroyê êrîşî xetên lûleyan bikin"*. Yaberî xebera wî piştrast dike: *"Me nedipa ku em ê rojekê bi heman pirsgirêkên niştecîyên deltaya petrolî ya Nîjêrê, li Nîjerîyayê, re rû bi rû bimînin.* (12) *Lê ez niha meraq dikim. Her ku diçe, xelk tê li ber sofra me dixwe lê me dawetî ser sofreyê nakin. Dibe ku piştî ku av bi devê me ket, em jî bên û xwarinê li wan heram bikin"*.

### Petrola di nav şêr û fîlan de

***Betî Olîve Namîsango Kamya*** ya berbijêra têkçûyî ya hilbijartina serokkomarî ya 2011ê pê bawer e ku awayê sekinandina *"bombeya siwarkirî"* ya erdan, ku tansîyonên bi hikûmetê re û navbera meliktîyên şopewer bilind dike, dîtiye: *"Bila Uganda vegere statûya dewleteke federal, ku riya sûdwergirtina çavkanîyên mîneral an jî cotyarîyê dide her herêmê, li şûna spartina van çavkanîyan li hikûmetên herêmî ku desthilata Musevenî bi cih dike. Ev kunên reş ên rastî ne"*. Di gel vegerandina 23 300 kîlometre çarçik federalîzm jî daxwazeke kevin a meliktîya Bugandayê ye. Ev daxwaz hemû di têgiha baganda ya *afye* -bi zimanê bagandî "tiştên me"- de cih digrin. Kamya derdibire ku meliktîyên din jî li *"çareyeke şûngira vê pergala siyasî ku mîrasa dagirkerên brîtanî ye ji bo dewamkirina berjewendîyên elîtekê"* digerin. Jixwe, navê partîya wê Hevpeymanîya Federal ji bo *Ugandayê* ye. Nîşana wê jî zirafeyek e (*"heywanekî dûrbîn"*) û dirûşma wê îqtîbaseke... ***Vîctor Hugo*** ye: *"Ji fikireke wextê wê hatî bihêztir tiştek nîne"*.

*Rojnamevan

1 Phares Mutibwa, *The Buganda Factor in Uganda Politics [Unsûrê Buganda di siyaseta Ugandayê de]*, Fountain Publishers, Kampala, 2008

2 Mîleke çarçik bi qasî 2.5 kîlometre çarçik e

3 Li 27ê tîrmeha 1985ê, Tîto Okello darbeyeke leşkerî bi rê ve dibe û desthilata otorîter a Mîlton Obote dide erdê. Lê belê, Yowerî Musevenî yê muxelîfê demdirêj li gel Artêşa neteweyî ya berxwedanê (ANR) hevkarîyê dike û şerê gerîlatîyê dewam dike. Ew binpêkirina mafên bingehîn a ji hêla serokkomarê nû ve weke sedemê nîşan dide û êrişeke berfireh dibe ser Kampalayê. Li 29ê çileyê 1986ê, ew weke serokkomarê Ugandayê sond dixwe

4 "The politics of land reform" ["Siyasetên reforma erdan"], Katine, 25 tîrmeh 2009, www.guardian.co.uk/katine

5 http://www.fhri.or.ug

6 Jean-Philippe Rémy, "En Ouganda, des émeutes sanglantes fragilisent le président Yoweri Museveni" ["Li Ugandayê, raperînên xwînrêj cihê serokkomar Yowerî Musewenî nazik û hesas dikin"], *Le Monde*, Parîs, 15 îlon 2009

7 *Bnr.* Tim Allen û Koen Vlassenroot, *The Lord's Resistance Army, Myth and reality [Artêşa berxwedana Xwedê, efsane û rastî]*, Zed Books, Londra, 2010

8 Bixwînin Gérard Prunier, "Le régime de Khartoum bousculé par la sécession du sud" ["Desthilata Xartûmê ji veqetîna başûr ne rihet e"], *Le Monde diplomatique*, sibat 2011

9 Margaret A. Rugadya, "Escalating Land Conflicts in Uganda" ["Li Ugandayê, pevçûnên li ser erdan radibin"], hezîran 2009, www.oxfam.org.uk

10 Ev sernavekî anorê ye, lê her meliktî xwedîyê rengekî hikûmetê ye

11 *La Lettre de l'Océan Indien*, Parîs, 18 kanûn 2010, www.africaintelligence.fr/LOI/

12 Bixwînin "Au Nigeria, le pétrole de la colère" ["Li Nîjerîyayê, petrola hêrsê"], *Le Monde diplomatique*, nîsan 2006

Wergera ji fransî: Simko Destan



ROJÎN SARA DEVECI (6 Salî)

## Şerê navxweyî li pey şerê navxweyî

**1900:** Meliktîya Bugandayê -ya ku li ser çend meliktîyên kevneşopî yên cîran serdest e- bi Londonê re peymanekê îmze dike û dibe protektorayeke brîtanî.

**9 cotmeh 1962:** Uganda serxwebûna xwe bi dest dixe û destûreke bingehîn a federal qebûl dike. Melikê Baganda **Edward Mutesa II** heta mirinê dibe serokkomar. **Mîlton Obote**yê damezrênerê Kongreya Gelê Ugandî (UPC) dibe serokwezîr.

**22 sibat 1966:** Oboteyê parêzvanê navendkirina desthilatê, bi alîkarîya serfermandarê artêşê **Îdî Amîn Dada** darbeyekê çêdike. **Mutesa II** ji text tê daxistin.

**8 îlon 1967:** Destûreke bingehîn a nû meliktîyan betal dike û rejîmeke serokkomarî ya yekpartîyî îlan dike.

**25 çîle 1971:** Darbeya **Îdî Amîn Dada**.

**Îlon 1972:** Destpêka şideta etnîkî ya li dijî gelên *Aşolî* û *Langîs*.

**1974:** Zilm û tahde li eşîretên dijber, rewşenbîr û parêzvanên **Obote** tê kirin.

**25 hezîran 1976:** **Îdî Amîn Dada** xwe serokkomarê heta mirinê îlan dike.

**11 nîsan 1979:** Bi raperîneke bi piştgiriya Tanzanyayê, **Îdî Amîn Dada** tê bi dûr xistin. Hikûmetên ji hêla Eniya Rizgariya Neteweyî ya Ugandayê (UNLF) ve îlankirî, di nav bêistîqrariyê de yek li pey ya din tên ser hukum.

**10 kanûn 1980:** Hilbijartina **Obote** wek serokkomarê welêt. Piştî nerazîbûnên ji dengdanê, şerê navxweyî dest pê dike.

**25 çile 1986:** Darbeya **Yowerî Musevenî**, hevdamezrênerê, di gel **Obote**, yê Artêşa Berxwedana Neteweyî (NRA). Tevgera Neteweyî ya Berxwedanê (NRM) ya ku di bin serokatiya wî de ye, desthilatê zeft dike, vekirina siyasî ya welêt dide meşandin û bernameyeke aborî ya lîberal li ser ferz dike.

**1987:** **Joseph Kony** raperîna Artêşa Berxwedana Xwedê (LRA) dide dest pê kirin.

**9 gulan 1996:** **Musevenî** di hilbijartina serokkomarîyê de bi ser dikeve.

**12 adar 2001:** **Musevenî** ji nû ve tê hilbijartin.

**28 tîrmeh 2005:** Pirpartîtî bi riya referandumekê tê erê kirin.

**6 cotmeh 2005:** Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî (DSN) biryarên girtina pênc serokên LRAyê derdixe.

**23 sibat 2006:** Ji bo cara sêyemîn, **Musevenî** wek serokkomar tê hilbijartin.

**26 tebax 2006:** Piştî şerekî xwînrêj ê 20 salan, agirbestek di gel LRAyê tê îmze kirin.

**Îlon 2008:** Zemînekî neftê yê berfireh li rojavayê Ugandayê tê keşif kirin.

**10 îlon 2009:** Li *Kampalaya* paytextê welêt, pevçûnên navbera hêzên hikûmetê û parêzvanên *kabaka* yê melikê *Bagandayan*, bi mirina sê kesan bi encam dibin.

**18 sibat 2011:** **Musevenî** cara çaremîn di hilbijartinên serokkomariyê de bi ser dikeve.

# Cerahîya wezîfeyê

Şer dewam dike. Çar mehan piştî biryara 1973yê ya Konseya Ewlekariyê ya NeteweyênYekbûyî, hêzên Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê (NATO) wezîfeya diyarkirî binpê dikin û êdî daxwaza xwe ya dawîanîna li rejîma Albay Muemer Qedafî venaşêrin. Civaka sivîl berdêleke giran dide vê dirêjkirina şerî. Ibrahim Al-Koni yê li surgûnê, yek ji mezintirîn nivîskarên lîbyayî ye û bi eslê xwe tuaragî ye. Al-Koni êşa xwe ya li beramberî bextreşîya welatê xwe derdibire.

IBRAHIM AL-KONI *

*Gazinan neke, piştgirîyê bike, serê xwe bitewîne, dilnizm be, ji bo hez bikî, bilezîne, bêyî ku ji ber awirên te winda bibe ku tu li ber perê bêserûbinbûnê yî. Ya ku em jê re dibêjin wezîfeya xwe kiriye, ev e".*

Henri-Frédéric Amiel

*"Bi tenê ew kes azad dijî yê ku di pêkanîna wezîfeyê de bexteweriyê peyda dike."*

Cicéron

Ji bo ez behsa rastîya tişta li Lîbyayê niha diqewime bikim, ez hez dikim serpêhatîyekê bibêjim ku mînakeke baş e: serpêhatîya karsazekî ku piştî rûdana bûyeran tevî malbata xwe li welatê cîran *Tûnisê* asê û tecrîdkirî mayî û bi tîhna xwe ya xebata alîkarîya ji bo şoreşa pakkirina şermê, bi tenê yek tişt jê dihat, ew jî ew bû ku barê malî yê dermankirina serhildêrên birîndar bigire ser xwe. Ev birîndar bi awayekî bi dizî ji sînor dihatin derbas kirin da ku nekevin nexweşxaneyên li hundirê welêt, lewra di van nexweşxaneyan de polîsên rejîmê wan bi xwînsarî dikujin.

Lê belê dana pereyan ji bo dermankirina birîndarên rastîyê li gor wî xebateke têrker nebû, nexasim ji ber ku em dizanin ku sêhra şerî bi rengê ku bi têkilîya birîndaran û serhildêrên li dora wan re dikarî bigihîje wî jî, tesîrê lê bike; wî bi çavên serê xwe dîtibû ku van birîndaran bêhna xwe ya dawî ya bextewer dabû, heta li serê herî bilind ê vê teqdîr û şabaşa ku libyayîyan nedîtibû ji dema di destê rejîmeke ew jixwe, ji welatê xwe û ji dinyayê qut û sil kirî de rehîn bûn û vir ve.

Ev zilam carinan telefonî min dike da ku nûçeyên şerî şirove bike û li ser tişta diqewime bide û bistîne. Her carê, ew kerb û azara xwe bi min re par ve dike, ew kerb û azara ji dîtina derengmayîna rizgarîyê peyda dibe. Ew ji min re dibêje, li gor wî, xewnereşk çiqasî dewam bike, ewqasî wê mirovên bêguneh bimirin. Min timî zor da xwe ku jê re sedemeke aşbûnê bibînim, li ber dilê wî xweş bikim. Dema min ev dikir jî min xwe disipart mentiqê tiştan ku fêrî me dike, mueyîdeya çarenûsê çi zû û çi dereng xwe ferz dike. Lê belê vê yekê têra wî nedikir.

Li ser vê yekê, va ye wî berîya çend hefteyan telefonî min kir, da ku ji min re bibêje ku wî biryar daye weke serhildêrên birîndar *bextewer* bibe, û ev yek bi tenê hingî mumkin e, heke bi awayekî qaçax vegere *Lîbyayê* da ku cihê xwe di bereya şer de bigire. Û dema min lê vegerand û got, ji bo dermankirina birîndarên doza rastîyê dana pereyan *jî* bûna li bereya şer e, ew bi min kenîya û wî got, wî sed caran hewl daye xwe bi vê fikrê qaneh bike, lê belê wicdanê wî ango wê mûcîzeya:

Xwedê di dilê mirovî de weke nûner bi cih kiriye, ev arguman qebûl nekiriye; û heke dixwest wê buhuşta wî li ser rûyên birîndaran heta kêlîya wan bêhna xwe ya dawîyê dayî dîtî, nas bike, yekane riya li ber wî mayî ew bû ku here bi rastîyê re rû bi rû bibe. Vê buhuştê ji mirovî dixwest di dilê şerê pîroz de rahêje tivingê.

Min tika jê kir ku rojekê wextê hizirînê bide min.

Sedema ku min doza mohletê lê kir, ne bi tenê ew bû ku ew li ber dilê min gelekî bi qîmet bû, belê ji ber ku tevahîya wan salên ezmûnê ew timî dostekî ruhê min bû ku ji min bêhtir nêzî ruhê min bû û ji ber ku hêsan nebû ku çarenûsa xwe bi carekê welê biguhere, bixe tehlûkê.

Ji bo ku li çirûskê bigerim, ez çûm nav zevîyên hişk û zehmet ên çîyayî. Ez çûm û li cem xwezayê li şîretan geriyam. Min dizanî ku vê dayika zana yek care bi tenê jî xiyanet bi min re nekiriye. Li wir, di nav wê qada bêlez û bêtelaş de, di nav bêdengîya şidîyayî de ji binê bîra min wî hukmê Kant xwe da der; ew hukmê min timî hez jê dikir, lê belê weke tevahîya tilsim û efsûnên ku me hez dikir, li ser me bixwe nivîsandî bin, min ji bîr kiribû. Vî hukmî digot: "em nayên dinyayê da ku bexteweriyê peyda bikin, em tên dinyayê da ku wezîfeya xwe bikin".

Wezîfe! Beşa kêm a efsaneya bexteweriyê ev e; ev e peyva efsûnî ya ku şûşeya mucîzewî vedike; ev e kehaneta kevnar a ku pê ayîna giran a bawerîyê xwe pê têr dike.

Ez lê vegeriyam, min hukmê xwezayê bi rengê ku hevalbendê wê yê fîlozof derdibire jê re anî, lê belê min xweş didît ku diviyabû ez fikir û hisa xwe ya şexsî jî li peyamê zêde bikim da ku ez karibim peyamê razîkertir bikim. Min jê re got, maneya vê ew e ku her bextewerîya bêyî birina serî ya wezîfeyekê bi tenê sefîlî ye, bi heman rengî heke mirov bextewerîya xwe ji bo birina serî ya wezîfeya xwe feda bike, ev jî bextewerîya herî mezin e.

Kêfa wî ji şiroveyê re hat, weke her cara ku me prensîpa Eflatûn mîrê pêxemberan ya digot, ji axaftina bi hevalekî re mezintir ti bextewerî li dinyayê nîne, dixist pratîkê û em ji bo ku bi kêfa sohbetê şa bibin rûdiniştin.

Kêfa wî ji şiroveyê re hat, bi qasî her kesê ku qencîya xwedayî îlhama zanayîyekê daye wan, bêyî ku navgînên herikandina wê ya ber bi gotinan ve bide wan, bi wî zehmet bû ku fikrên xwe derbibire.

Me demeke dirêj behsa wezîfeyê kir, heta ku wî "koçberîya" xwe ya dotira rojê bi min da zanîn; wî ji min re got, ne koçberîya dema mirov di şer de têk diçe, ji welatekî ber bi welatekî din ve diçe, na, koçberîya ku berê me dide derveyî erd û welatên surgûnê da ku ji surgûnê welêt bistînin; koçberî, belkî jî bêhtir fîrara ji guldanka teng a egoîzmê ber bi buhuşta azadîyê, ya rastî bêyî ku min baş bizaniya gelo azadîya wî behs dikir azadîya kirina wezîfeya xwe bû, yan jî azadîya bi maneya xwe ya radîkal, herî dawî, ya ku tê de Hoste (1) radeya herî bilind a azadîyê didît, ango mirin bû.

Wî soz da min ku ew têkilîya bi min re ji navenda dijminahîyan dewam bike, lê belê hefte di nav re derbas bûn ku ez nizanim ka çi pê hat.

Gelo ez li hemberî wî gunehkar bûm, dema ku min teşebusa wî pîroz kir? Ya rastî, ez li hemberî xwe gunehkar bûm, heke ev qasî li peyçûna azadîyê guneh bû! Lewra heke di rewşa qewimîna tiştekî de di vê bûyerê de kesekî ku tehlûkeya ruhê xwe ji dest bide hebû, ew jî ez bûm; wî bixwe, wî yê bi tenê qeyd û bendên xwe ji dest bidana; wî yê bi tenê şerma xwe dana alî ji duaya herî pîroz a mirovî ku wezîfe ye, ji dest bidaya; wî yê bi tenê şerma ketina hundirê xanîyê xwe yê ku li şûna wî ji alîyê kesên din ve hatiye azad kirin, ji dest bidaya; wî yê bi tenê bêliyaqetîya jîyana li welatê siberojê yê ku wê ji dest birayên xwe weke diyarîyekê bigire, li şûna ku bixwe ji bandora hutî xilas bike, ji dest bidaya! Û heke ew venegeriyaya, hingê wê wî ne bes xwe azad kiribe, belê wî yê azad jî kiribe. Lewra ruhê welatan rizgarkerên wan in, ne zindîyên li wan dimînin. Lewra şehîd yekane malbat in ku kurên wan bextewer dimirin.

Gelo min ê cesaret bikira vê serpêhatîyê bibêjim, heke tecrûbeya hevalê min ê delal bi tenê mînakeke ji gelek mînakên din ên li ser tişta îro li Lîbyayê diqewime bûya?

Bi vî rengî ne, lehengên ku jîyana xwe erzan dikin, ne ji bo yekane armanca ji bo tolhildana rewa, yan jî peydakirina rûmeteke jidestdayî, lê belê ji bo vegera ji vê surgûnîya kujer ku ya tevahîya zordestî û zorbazîyan e. Lewra di bin sîya zordestîyê de her tişt diyarî surgûnê tê kirin: Nirx, welat û mirovên dildarên welêt, bawerîya bi tenê di dilê mirovê xwe fedayî welatê xwe kirî de dijî, rastîya ku rûyê din ê azadîyê ye û ne tiştekî din e, yekemîna nêçîrên bêhejmar ên ketî ûrê hûtê nehserî yê bi navê hîdra. Ji xwezayê heta bi ezmanê bixwe ji holê rabûyî, tiştekî ku li hember sîya vî hutê mirovxwur wenda nebe, nîne.

Bi gotina siberoj wê şivanekî bîne dinê ku wê çil salan vî welatê xembar bi rê ve bibe, muxeyela gelê Lîbyayê hatina vê felaketê pêş dîtibû.

Di destpêkê de mirovan zêde girîngî bi vê kehanetê neda û jê bawer nekirin. Piştre, dema ku xewnereşk her dirêj bû, ew li hêvîyê man; paşê ji ber ku hatina rizgarîyê dereng ma, wan xwe lê ragirt; piştre dema ku felaket bi serê wan de hatin, ew li wan bihurîn; piştî vê dema ku mohleta ev demeke dirêj li bendê bûn hat, hêvîya wan nema. Hêvîya wan nema, wan red dikir ku jê bawer bikin ku felekê dikarî bi hejmara xwe ya di kehaneta xwe de ragihandî şaş be û jê bibihure. Lê belê ew ê bibûya hêza wan, dema ku pê hisîyan ku zordestî bi îmtiyaza li dijî daxwaza xwedê û kehanetê bi xwe rabûnê, kêf dike. Lewra va ye şivan red dike ku mîna kahînê kevnar **Sutayh** (2) tev bigere û red dike ku razê da ku li gor daxwaza veşartî bimire.

Ji vê kêlîyê û pê vê mirov qaneh bûn ku tiştek heye ku li gerdûnê rast nameşe û wan wezîfeya rastkirina rewşê girte ser xwe. Ew lê serwext bûn ku di vê dema kelevajî de (çar dehsal!) ew mexdûrên dekûdolabekê bûn, ew mexdûrên pêxemberekî qelp bûn, ew mexdûrên mesîhekî qelp bûn, ne mesihê silametîyê û wan serî hilda. Li ser vê wan çek û sîlehên xwe paqij kirin da ku koka wê girebaya xirab biqelînin, ew girebaya ku çilûdu salan bedena wan keritandibû. Desttêwerdaneke cerahî a kujer, lewma ji bo ku silametîyê bi dest bixin, ji bo ku xwe ji vê qemûşka felekê ya li ser bedena wan firisandî, xilas bikin, diviyabû çerm ji goşt were kirin. Belê vê yekê ew netirsandin û em wan hê li ser meydanên giştî dibînin, nişterên xwe dihejînin da ku vê desttêwerdana cerahî ya dîrokî pêk bînin.

Lewra êdî wext e, em nav lê bikin, Hezretî Dîrok, a ku Rousseau ji boyî gotibû: "wê çi pê bihata, heke ne zordest, ne şer û ne jî komploger hebiyana?" (3)



ROJÎN ÇETINDAG (10 Salî)

* Nivîskarê lîbyayî yê mişext. Pirtûka bi navê ’’Ferîşte tu kî yî?’’ nivîsand. P. Vigreux ji erebî wergerand û di bin navê ’’Nameyên cîhanê’’ de hate weşandin. Parîs, 2010.

1 Ango Emmanuel Kant

2 Kahînê serdema berîya îslamê ku li gor efsaneyê vebirî saeta mirina xwe û jihevdeketina melikîyeta persan pêş dîtiye

3 *Discours sur les sciences et les arts* (*Nîqaşên li ser zanist û huneran*), 1750

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurdi.org

# Pirrengîya mezin a xirîstîyanên Rojhilat

RUDOLPH EL-KAREH *

Êrişa 31ê kanûna 2010ê ya li dijî dêra du welîyan [quddîseyn] a Skenderiyê (21 kuştî) –piştî êrişa li dijî katedrala Dayik Meryem a Alikarîya Ebedî ya li Bexdayê ya 7ê çirîya paşî (46 kes hatin kuştin)– bû sedema şermezarkirineke yekdeng li tevahîya welatên ereb û li tevahîya cîhanê. (1) Întellektuelên ereb behsa "*hestên şermê*" û "*dehşetê*" kir. (2) Li fikarên dêrên rojhilat, dengê şermezarkirinên ku nexasim şêxê el-Ezherê, Erebistana Suûdîyê, Birayên Misilman, giregirên dînî û siyasetvanên sunî û şîa jî zêde dibe. Kevneserokwezîrê Libnanê **Selîm Hoss** ê sunî difikire ku "*şermezarkirinên bi gotin kêm* [dimînin]" û banga "*lidarxistina civîneke ereb a ji bo dana biryara tedbîrên ku hewldanên afirandina pirsgirêkan bi dawî bînin*" kir. Hizbullaha Libnanê hemfikrîya xwe derbirî: "*Li hemberî hewldanên xwînrij ên armanca wan cihêrengîya civakî-dînî ya li gelek welatên ereb û nexasim li Filistînê ye, peyvên ku hêrs û xemgînîyê îfade dikin, bêwate dimînin.*" (3)

Medyaya rojava behsa van nerazîbûnan nekir. Di çarçoveya tevlihevîya întellektuel de, awirên medyayê li ser çarenûsa "xirîstîyanên rojhilat" maye. Îbadetgehên îraqî yên xirîstîyan û misilman, nemaze mizgeftên şîiyan misêwa bûn armanca êrîşan û veguherîn golên xwînê; welat ji dagîrkerîya amerîkî û vir ve şahidîyê li van êrîşan dike.

Peyvên kulturalîzma şerî ji nû ve derketin holê. Dibêjin, hindikahîyên xirîstîyan ji ber bawerîya xwe tên tepisandin, tade li wan dibe, zext li wan dibe, heqaret li wan tê kirin, welêt ji wan paqij dikin. Weke encam jî diviya Rojava pişta doza wan bigire û wan biparêze. Ev mubalexeyên bi derbên têkçûnên hestbarkirî yên neqandî tên mezinkirin, ji bo çareserîya trajedîyên rojane bi tu awayî ne çareserî ne, lê belê desteke didin tezên **Bernard Lewis** û **Samuel Huntington** yên der barê şoka şaristanîyan û dînan de.

Tevlihevîya têgehî ya ku kesayetîya çandî û fikrên sosyopolîtîk tevlihev dike, dike ku mirov xirîstîyanan weke komeke tecrîdkirî a xerîba hawîrdora xwe bibîne. Herweha, nîqaşa esensîyalîzma îslamîst û ya kulturalîzma esensîyalîst a "rojavayî" digihin hev û hevdu xurt dikin. Ya pêşî, xirîstîyanên rojhilat weke gewdeyeke xerîb û nexwecihî, giliya xirîstîyanên rojhilat dike; ya din wan weke nûnerên rojava "li ser erdên Îslamê" dibîne.

Peyva "xirîstîyanên rojhilat" rastîyeke yekreng îfade nake. Ev xirîstîyan komeke civakî a xweser pêk nayînin, jixwe yeke etnîk hîç pêk nayînin. Ji Împaratorîya Bîzansê heta bi Împaratorîya Osmanî, ji dubendîya Roma û Konstantînopelê heta bi împeratorîyên Emewî û Ebbasî, akulturasyon, mutasyon, têkelhevî û jinûveavakirinên civakî, xisleta mirovî ya di nav xelkên herêmê de hevpar bi gewde kirin. Nabe ku dîroka xirîstîyanên rojhilat ji van bê cihê kirin. Çi bajarî, çi gundî, civakên wê li tevahîya Meşreqê belav in, lê bi taybetî jî li Iraq û li Sûriyeya dîrokî hene ku Libnan û Filistîn jî di nav de ne.

### Hîmê têkilîyan: Peymana Silêmanê Duyem û Françoisê Yekem

Qonaxa biryardar a têkilîyên di navbera van civakan û Ewropayê de peymana hevgirtinê ya **Silêmanê Duyem** û **Françoisê Yekem** a li dijî Habsbourgê ya sedsala 16ê ye. Ev peyman komek lihevkirinan ("Kapîtulasyon") qebûl dike ku azadîya îbadetê, mafê bazirganîyê û yê ger û geştê yê welatîyên fransî yên li împaratorîyê digerin yan jî lê dimînin, misoger dike; û erka birêvebirina karûbarên (îxtîlaf, mîras ...) welatîyên xwe yên li ser erda osmanî, dide konsulên fransî. Di demeke kurt de di serî de Ingilîstan, Awûsturya-Macarîstan û Rûsya, van kapîtulasyonan hêzên din jî hewandin. Van peymanan hîmê hiqûqî yê pêvajoyeke dirêj pêk anî û tevneke têkilîyên aborî, bazirganî, siyasî û çandî ya pirreng di navbera hêzên ewropî û civakên esasî yên împaratorîyê de hûnand. Di nav van civakan de xirîstîyanên bi ser dêra katolik ve jî hebûn.

Van têkilîyan wê otorîteya herêmî ya hêzên civakî hilweşanda û di heman demê de bi kêrî projeyên ewropî yên parçekirina împaratorîyê bihata. Di dawîya şerê cîhanê yê yekemîn de piştî erozyoneke demdirêj a ji Balkanan heta bi Misirê, ev proje wê bi encam bibûya. Li London, Berlîn û Vîyanayê îhtîrasên kolonîyal hevpar in, lê belê reqîbên hev in. Di bin navê "pirsa rojhilat" de siyaseteke desttêwerdanê ya bi riya deynên malî yên pir mezin ku Babi Alî [Împaratorîya Osmanî] ji bankayên ewropî deynkirî mumkin dibe, "parastina hindikahîyan" ji xwe re dike bahane da ku kontrola li ser karûbarên osmanî zêde bike.

Li Çîyayê Libnanê sala 1960ê pirsgirêkên civakî veguherîn komkujîyên mezhebî yên di navbera *Durzî* û *Maronîyan* de, piştî ve yekê kuştinên li Şamê qewimîn ku bûn sedema mirina gelek kesên ji civaka xirîstîyanên bi ser dêra ortodoks a yewnan ve. Sefera eskerî ya Napolyonê Sêyem li ser "mutesarrifîyê [walîtîyê]" wê sîstemeke tewazûna civakî ya di bin komdomnîyûmê [hevbirêveberiya] hêzan de ferz bikira.

Karê bi dîzî yê di binî re li herêmên Sûrîyê, nemaze li Filistînê dewam dikir. Li vê derê misyonên bê hed û hesab ên ingilîz, rûs, awûsturyayî, alman hem xwe darî çavên siltên dikin û hem jî "*hewl didin ji meliktîya Fransayê herêmên di parastina wê de bistînin*".

Beşeke elîtên eşîrî vê rewşa girêdanê li gor berjewendîyên xwe dibîne; li hemberî vê, elîtên întellektuel, li alîyê elîtên sûrîyeyî û misirî yên misilman, wê bi roleke mezin di derketina holê ya Nahdayê de rabûna. Nahda tevgera reformator a ronesansa çandî û siyasî ya ereb e ku îlhama xwe ji îdeolojîyên azadîxwaz û tevgerên nû yên fikrî yên zanistperest û pozîtîvîst ên li Ewropayê digirt.

### Daxwaza elîtan û ya London, Parîs û Moskovayê ne yek e

Vê elîtê ji dil daxwaza azadîyeke siyasî dikir û li riyên wê digeriya; lê belê hedefên London, Parîs û Moskovayê ji bo milletên herêmê guhertî bûn. **Soza Balfourê** (1917) ya destek dida avakirina welatekî cihû li Filistînê, li *Peymanên Sykes-Picot-Sazonov* (1916) zêde bû. Van peymanan wê dabeşkirina parçeyan di nav hêzên ewropî de misoger bikira û bibûya destpêka parçekirina rojhilata ereb. Teorîsyenê welatîbûnê, nivîskar **Amine el-Rihanî** projeya meliktîya yekbûyî ya ereb a melik Feyselê yekem diparêze –bi daxwaza London û Parîsê ev proje hat bi bin xistin. Lê belê berîya her tiştî di nav tevgerên neteweperest ên ereb de em pêrgî kesayetên xirîstîyan tên. Ev tevgerên nû derdiketin holê, li dijî parçekirina bi destê hêzên kolonyalîst bûn, ku Cemiyeta Neteweyan (CN) nûnerîya wan dikir.

Hebûna wan di nav tevgera neteweyî ya ereb a laîk, marksîst yan jî dunyewî de girîng e. Mînak pir in: Lîderê filistînî yê herî destpêkê **Fûad Nassar**; damezirênerê Partîya Baasê **Michel Efleq**; damezirênerê Bereya Gel a Rizgarîya Filistînê (BGRF) **Georges Habache**; lîderê Bereya Demokratîk a Rizgarkirina Filistînê (BDRF) **Nayef Hawatmeh**; kevnemetranê Qudsê **Hilarion Cappuci**; sekreterê giştî yê Partîya Kommunîst a Sûrîyeyê **Farjallah Hélou** û hempîşeyên wî yên libnanî **Antoun Tabet** û **Nicolas Chaoui**…

Li cîhana ereb a ku ji jihevketina Împaratorîya Osmanî û paşê ji dekolonîzasyonê peyda bû, bi tenê du dewlet xwedîyên mîraseke kevin a dîrokî û struktureke xurt a neteweyî dîrokî ne: Fasa Maxzen û Misir a ku bi reformên **Mihemed Elî** (4) hêzdar bûyî. Şerê li dijî kolonyalîzmê misilman û qiptîyan ji hev cihê nake. Serokdewlet **Cemal Abdil Nasir** ê ku sala 1952ê li Misirê tevî "efserên azad" bû desthilatdar, wê hesta neteweyî bi girêdana wê a bi neteweperestîya ereb ve, xurt bikira. Li hemberî vê rejîma warisê wî **Enwer el Sedad**, di çarçoveyeke neolîberal a xiraker de, xwe siparte manîpulekirina girêdanên dînî. Ev tesîra xiraker bi kedîkirina partîyên sekuler du qatan zêde bû û tevgera Birayên Misilman ji vê yekê sûd wergirt. Cihêkarîyên xwedî karekterekî dînî yên li pêşberî qanûnê ku warisê wî xwe li wan ragirt, wê tengezarî zêde bikira.

Li deverên din, dewlet di çarçoveya dildarîya şerê ji bo serxwebûnê de ava dibin. Xirîstîyan di wan de cih digirin, nexasim dema ku desthilatdaran îdîaya lipêşbûna welatîbûnê kir, çawa li Sûrîye, Urdun û li komara Iraqê wisa bû. Li Libnanê sîstema destûra bingehîn xwe dispêre mekanîzmaya girêdana dînî û tê de civakên xirîstîyan ên birêxistî bi roleke aborî û siyasî ya navendî radibin –helbet ne bêyî tengezarî. Piştî şerekî navxweyî yê sala 1958ê, bêyî ku bi nasnameyên dînî yên rejîma manda ya fransewî ew bi sazî kirî re were hemberî hev, serokdewlet **Fûad Chéhab** hewl da pêvajoyeke întegrasyona neteweyî û berfirehkirina serwerîya dewletê bide dest pê kirin. Tevî vê jî ji sala 1975ê û pê ve Libnanê wê şahidî li şerekî navxweyî bikira, navberên kêm û zêde dirêj û bêîstîqrar ketin navbera vî şerî. Di pirsgirêkên herêmî û navneteweyî de wê bibûya astengeke mayînde.



ELINDA MARDÎN (6 SALÎ)

### Stratejîya amerîkî ya parçekirinê dişibe ya dewleta Îsraîlê

Zelzeleya dagîrkirina Iraqê ji alîyê Amerîkayê ve, rewşeke nû afirand. Mekanîzmayeke din a parçekirina bi rengê kolonyal, bi dabeşkirina erkan li gor civakan û komên neteweyî, pêk tê. Ev yek jî xwe dispêre sazûmankirina "bawerîyan" weke hîmê sîstemên dewletî. Vê mekanîzmayê di bin bandora şideta bi armanc û tirsê de kir ku kom bêhtir di nav xwe de bimînin. Warisên sekuler ên xirîstîyanîya rojhilat, xirîstîyanên Iraqê diherikin herêma Nînova yan jî bi sedan hezarên wan koçberî Sûrîye, Urdun û Libnanê dibin. Tirs û fikara xelkê zêde dibe, lewra stratejîya amerîkî ya parçekirinê dişibe ya dewleta Îsraîlê ya ku her xwe dubare dike. Li gor vê stratejîyê divê dewletên ereban hemû ji hev bên xistin û li ser yekîneyên piçûk werin parçe kirin (6) (*binêre, rûpel XX, gotara li ser Sûdanê, a ku alikarîya îsraîlî ya ji bo qutbûna başûr derdixe pêş*). Meclîsa Dêrên Rojhilat ên girêdayî dêra katolîk a Romayê, çirîya paşî ya sala 2010ê civiya. Meclîsê îşaret bi çarenûsa xirîstîyanên Filistînê kir û fikarên xwe derbirîn. Xirîstîyanên Filistînê bi cihêkarîyên metodîk re rûbirû dimînin û armanca van cihêkarîyan ew e, wan neçarî koçberîyê bikin. (7)

Ji bo xirîstîyanên rojhilatî, Filistîn diyarker dimîne. Nirxa sembolîk a Qudsê û angajmana siyasî ya filistînîyên xirîstîyan di tevgera neteweyî de vê yekê rave dikin. Lê belê ji taybetîyên çandî û wê de, ya ku mohra xwe li civakên xirîstîyan ên rojhilat xistî, lîstika mezin a siyaseta herêmî ye. Stratejîya parçekirinê ya ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wê bi rê ve dibe, bêguman rêbazên hêzên ewropî yên sedsala 19ê nû kirin, lê belê zemîn kêm homojen e. Parçebûnên siyasî yên rojhilata ereb, bandorê hem li civakên xirîstîyan û hem jî li yên misilman dikin. Felaketên sefera Iraqê kirin ku çi dêr û çi qada dunyewî, xirîstîyanên rojhilat bi xwe bihesin. Papayê *qiptî* **Chenouda III** rexnegirekî biryardar ê nermbûna rayedarên misirî li beramberî dewleta Îsraîlê û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye. Li Libnanê tevgera general **Michel Aoun** yan jî ya **Sleiman Frangié** ku beşeke girîng a civakên xirîstîyan û nemaze yên *maronî* temsîl dikin, hevgirên Hizbullahê ne. Li Filistînê, xirîstîyan di nav şaredarîyan de mane, ku ***Hamas*** piranîya wan bi rê ve dibe.

Lê belê dagîrkerîya amerîkî ya 2003ê herweha krîza kûr a dewletên rojhilata ereb jî careke din îsbat kir. Wê herweha xetimîna tevgerên serdest ên îslama siyasî yên di pêvajoyeke stewr a bi rêyên neqanûnî bi destxistina desthilatdarîya siyasî û ya bîra dîrokî de asê –ku carinan encamên wê kujer in– û qerisîna tevgerên yekperest ên panereb jî nîşan da. Ev konjuktura krîzê ya ku di nav xwe de mayîna komên dînî wê kûr dike, fikra welatîbûnê veguherand xewnekê û encamên vê yekê bi awayekî gelekî giran zirar li erebên xirîstîyan ên pirreng kir.

Bi rengekî xemilandî di qanûnan de bicihkirina "parastina hindikahîyan" û waizên muhafezekar ên misilman, mentiqê sedemên xwe dispêrin heman çavkanîyê. Ew xirîstîyanên rojhilat ji kokên wan qut dikin û wan vediguherînin mêvanên di wir re dibûhurin, û dilrehmî û tolerans ferz dikin mirov wan qebûl bike. Axaftineke teşwîqê ya papatîyê li Vatîkanê, metnekî rê nîşan dide yê Papa, ji sala 1996ê û vir ve qebûl dike ku kok û rehên wan ên rojhilatî xwe pir berdana jêr. Bersivên civakî yan jî dînî yên van pirsgirêkan hemûyan, nînin: Ew tevahîya civakê elaqedar dikin û banga çareserîyeke dunyewî ya hevpar dikin.

* Profesorê zanîngehan, kevneprofesorê li Libnan, Franse û Kanadayê

1 Berevajî êrişa li Bexdayê ya ku şaxê el-Qaîdeyê yê Iraqê berpirsiyarîya wê girte ser xwe, tu kesî êrişa Skenderiyê negirte ser xwe, lê belê heman rêxistinê gef li qiptîyan xwaribûn

2 Fadl Chalak, *As-Safir*, Beyrûd, 8ê çileyê 2011ê

3 As-Safir û Al-Nahar, 4ê çileyê 2011ê

4 Maxzen navê ku li birêveberîya li gor rêûresmê ya fasî tê kirin e, ev birêveberî hîmê dewleta Fasê ya îroj pêk tîne

5 *Cf.* Gérard D. Khoury, *Une tutelle coloniale. Le Mandat français en Syrie et au Liban. Ecrits politiques de Robert de Caix (Wesayeteke kolonyal. Mandaya fransî li Sûrî û Libnanê. Nivîsên siyasî yên Robert de Caix)*, Belin, Parîs. 2006

6 Stratejîya ku nemaze David Ben Gourion îfade kir; rayedarekî payebilind ê wezareta karên derve ya Îsraîlê, şêwirmendê Menahem Begin, Oded Yinon xulaseya wê di belgeyeke girîng de nivîsand û di bin sernavê "Une stratégie pour Israël dans les années 80 (di salên 80yê de stratejîyeke ji bo Îsraîlê)" di kovara beşa propagandayê ya Rêxistina Sîonîst a Cîhanê de weşand, *Kivunim*, hejmar 14ê sibata 1982yê

7 *Cf.* Jonathan Cook, "Israel's purging of Palestinians Christians (Îsraîl filistînîyên xirîstîyan xilas dike). Counterpunch, 9ê çileya 2007ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

### DI NAVBERA XARTÛM Û WASHINGTONÊ DE PEYWENDÎYÊN KU NAYÊN ZANÎN

# Dema ku benîştê erebî dike ku Amerîka li hev bikeve

GUILLAUME PITRON *

**Li alîyekî Başûrê Sûdanê xwe ji serxwebûna xwe û parvekirina hessas a çavkanîyên petrolê re amade dike, li aliyê din bazirganîyeke hindiktir tê nasîn li herêmê xurt û dewlemend dibe: ya benîştê erebî. Ev maddeya ji dara akasyayê di navê de Coca-Cola jî dikeve nav pêkhatina gelek berheman. Lê belê li ser Sûdana ku firoşvana wê ya herî mezin ê cîhanî ye, ambargoyeke bazirganîyê ya amerîkî heye. Ji bo xwe ji vê ambargoyê xilas bikin, lobî, sefaret û muzakerevan dixebitin.**

New York. Li quncika Hanover Square û Pearl Streetê, li navenda Manhattanê, ticaretxaneyeke berê bilind dibe, ku niha bûye klûbeke bazirganan a bi navê India House. Li qata yekem, salonên berê ji bo danûstandinên berhemên ji Hindistanê veqetandî bûn, weke restoraneke bi îhtîşam ji nû ve hatin raxistin. Lê ruhê bazirganên zexîreyên egzotîk hê jî di hewayê van cihan de ye. Weke peyamnêrekî ticareta wan a qedîm, dolabeke baldarîyan ji darê bihadar, li nava rohanîyên sivik û sohbetan radiweste. Di dolabê de, sî dane berkêşkên bi serî ve ji van madeyên xam tijî hene ku ji bo aborîya amerîkî pêwîst in. Di berkêşka yanzdehan de, ji bo reçîneyan veqetandî, komeke daneyan a li gel nivîsa "benîştê erebî" xuya dibe.

Nêzîkî wê derê, li quncika kolana 14ê, 4 Union Square South navnîşana supermarketeke xeleka xwarina biyo Whole Foodê ye. Bêyî ku haya wan jê çêbibe, bikir hejmarên pir piçûk ên vî benîştê akasyayê dikin çanteyên xwe. Bêyî vê emulgatorê (madeyeke kîmyayî ya ji bo emulsiyonê ye) , ku herweha bi koda E 414ê tê nasîn, "boyaxa reş a Coca Colayê dê hilkişiya rûberê şûşeyê", Frederic Allandê patronê şirketa îthalat û guherandina benîştan Alland & Robert rave dike. "Me dê nikarîbûya vexwarinên gazozî vexwara" û ne jî şekir û derman bixwara, çunkî benîşt tebeqeya wan sabit dike, me yê nekarîba mast bixwara, ji ber ku ew tevna wan qalind dike, me yê nekarîba mey vexwara seba ku ew êrişkarîya tanînan kêm dike, ne jî rojnameyan çap bikira ji ber ku ew hibrê li ser rûpelên wan bi cih dike.

"Piranîya merivên dinyayê her roj benîştê erebî bi kar tînin", profesorê sûdanî Hassan Addel Nour rave dike. Beşên berfireh mîna dermankarî, kozmetîk, xwirek, vexwarinên tamdar, qumaş, çapkarî û pîşesazîya herî pêşketî bi vê dewlemendîya ji esmanan hatî ve girêdayî ne. Li gor Incîl û Quranê, ew ji ibranîyên ku li Sînayê digeriyan re bû xwarin û misirîyan jî, 4 500 sal berî nuha, ew ji bo zeliqandina şelîtên mumyayên xwe bi kar dianî.

### "DYA çi qasî mueyîdeyan li ser me ferz bike, em jî ew qas benîştê erebî difiroşin wê"

Serkanîya wê, "kemera benîştê erebî" ye, gerdenîyeke darên akasyayan ku Senegal û Somalîyê bi hev ve girêdide, li nav Sahra û daristana ekwadorî dewisandî ye. Hilberînerên mezin ên wekî Çad û Nîjeryayê li ser bazarên navneteweyî bi cih bûn, lê dînamîzma wan ne bi qasî ya Sûdanê ye. "Welatê reşikan" ixracatkarê nîvê berhemdarîya global e û ew bi taybetî benîştê herî bi kalîte yê bi navê Heşab difiroşe derve; ew ji bo Rojava serkanîyeke tedarîkê ya bivênevê ye. Ev qasî pêwîst e jî ku, tevî ambargoya hişk a Waşîngtonê ji 1997ê ve li ser Sûdanê ferz kir, bazirganîya şîrikê stratejîk li nav peravên Deryaya Sor û kenarê rojhilat ê Dewletên Yekbûyî, bê haya bikirên amerîkî dewam dike.




HAVÎN SATIK (6 SALÎ)

Bazirganê sûdanî Isam Siddig şirove dike: "DYA çi qasî mueyîdeyan li ser me ferz bike, em jî ew qas benîştê erebî difiroşin wê". Sedema vê jî ew e ku benîşt, ji bo çêkirina meşrûbata nîşana herî girîng a kapîtalîzma amerîkî, lazim e. "Exlaqekî me heye, lê Coca Colayê ji me nestînin!", bisporekî amerîkî yê Sûdanê rewşê wisa dinirxîne. Rojnameya Washington Post ji vê kêmanîya siyaseta derve ya amerîkî li Sûdanê re, Soda Pop Dipomacy ("Dîplomasîya Meşrûbatê") dibêje. Ji vê serdestîya xwe haydar, kevnedesthilatdarîya hevbeş a ingilîzî-misirî xeyala hevkarîyeke li gel Çad û Nîjeryayê dibîne, da ku "OPEC"eke benîştî ava bikin. Li hemberî şermezarîyên Waşîngtonê li ser qetlîamên li Darfûrê, kevnebalyozê Sûdanê li DYAyê, John Ukec Lueth, li 2007ê şûşeyeke Coca Colayê li ber desteyeke rojnamevanên matmayî hejandibû û tehdîda rawestandina ixracatkirina benîştî kiribû. "Şerekî meşrûbatan" ê bi vî rengî dikare ji bo pîşesazîya vexwarinên bi gazê, stûna "Amerîcan Way of Life" (Terza jîyanê ya amerîkî), encamên felaketwarî bi xwe re bîne.

Ji New Yorkê 10 000 kîlometre dûr, li duryana Afrîkaya reş û dinyaya ereb, Xartûm li gel şeş mîlyon niştecihên xwe, milên xwe li dora fitl û çevanekên Nîla şîn û Nîla sipî dirêj dike. Meha adarê ye, trafîka paytextê sûdanî bi pêlên puspusên qedîm û Humerên çirîsk asê dibe. Li bin tava ku li zenîtê mîxkirî, rêlên avahîyan, vînç û minareyan li hemberî mij û germa hewayî radiwestin. Li bin sîya dukanên xwe, firoşkarên baharat û kuncîyan li dij guherînên demsala ziwa bi sebr in. Ev serdema çinîna beniştî ye, çaremîn berhema cotyarî ya welêt û herweha mijara serbilindîya neteweyî. "Sûdan bê benîştî nabe!", bazirganek bi bişirîneke ebenozî li bin gelabîyê sipî nixumandî, bang dide. "Ev zêrê Sûdanê ye, ticar Momen Salih bi şairane lê zêde dike. Ji petrolê girîngtir e ji me re!".

### Va ye dinyaya efsaneyî ya benîştê erebî

Ji bo ku bigihîje şeş mîlyon cotkarên ku li çolistanên bi akasyayan yên Kordofan û Darfûrê dixebitin, divê mirov heşt sed kîlometre li ser rêyeke rasterast a ku savanayê li du deverên wekhev yên bê sînor dabeş dike, ber bi rojavayê ve biajo. Li kevîya rê, holikên cûr bi cûr û siwarên bi tenê xuya dibin. Kamyonên rengorengo bi erzaq û mêran barkirî tev li dewarên windayî dibin. Ax sor dibe, darên baobabê li ser asoyê çolê bilind dibin. Li dawîya asfaltê, El Nuhud e, paytextê sûdanî ya benîştê erebî.

Cotkar û bazirgan li wir ji bo derxistin û belavkirina şîrikê dixebitin. Ajab Aldoor dibêje: "Li vir, akasya jîyan e!" Ev çil sal in ku ev bavê pênc zarokan ê zirav û mutevazî, bi palanekê liv û tevgerên ku ji zemanên qedîm ve bav ferî lawan dikin, dubare dike. Danê êvarê, ji bo birîna qalikên akasyayan dema herî minasib e. Panzdeh roj bi şûn ve, herikên beniştê daran dê ji hundir biçin û topikên viskozî/mîna çilmê çêbibin.

Weke bi mîlyonên cotkaran, Aldoor li ser bikaranîna dawî ya benîştî tiştekî nizane. Benîştî di berdêla çend lîreyan de difiroşin bazirganên herêmê û piştî ku ji gemarê tê paqij kirin, ziwa kirin û paşê şkandin, benîştî di kîsên ji tayên kinfê de dişînin bajarê El Obeidê da ku li wir li mazadê bifiroşin. Paşê, ew hê jî du hezar kîlometre ber bi Bendera Sûdanê ya li ser peravên Deryaya Sor ve diçe û li wir li konteyneran tê bar kirin û ji kargehên guherandinê yên rojavayî re tê şandin. Piştî ku hat parçe kirin, berhema dawî dişibe pudrayeke spî ya zirav û dîsa ji çarhêlên dinyayê re tê şandin.

Sala 2011ê, ticarên benîştê erebî xweşbîn in: Bi xêra mezinîya welatên di pêşketinê de, daxwaza cîhanî ji 1985ê ve du qat zêde bû; ew her sal % 3 bi pêş dikeve. "Çavkanîya sereke ya mezinîyê di soda, vexwarinên bi vîtamîn û xwirekên temamker de ye", Paul Flowermanê serokê fîrmaya ticaretê PL Thomas dinirxîne. "Her tişt piştgirîyê dide vegera benîştê xwezayî", Thomas-Yves Couteaudierê nivîskarê lêkolîneke bazarê ji bo Bankaya Dinyayî tehlîl dike, "lewre ku meyla biyoyê li Rojava jî pir bilind e", Salih lê zêde dike. Ew bi bîr tîne ku welatê wî bi xêra şîrikê akasyayê, her sal 40 mîlyon dolaran qezenc dike. "Jê bêhtir, em baştirîn benîştê dinyayê çêdikin!".

### Ji 1992yê ve desthilata amerîkî bi rastî bala xwe daye Sûdanê

Va ye dinyaya efsaneyî ya benîştê erebî... Lê divê em ji bîr nekin ku Sûdan dewletek e ku li ser hemû lîsteyên reş ên dîplomasîya cîhanî qeydkirî ye. Paranoyaya desthilata leşkerî li kolanên Xartûmê yên tijî resmên general Omar el-Beşîr diyar e. Polîs û leşker li derdora avahî û pirên stratejîk bi cih dibin. Rojnamevanekî biyanî dikare ji ber wêneyekî bê girtin. Di paşxana pir zêde ya bilindbûna bihayê petrolê de, Xartûm ber bi dinyaya derve vedibe: Li cem China National Petroleum Corporation, şirketên malayî û hindî derêxistana rojane ya pênc sed hezar barîlan di nav xwe de par ve dikin. Lê ji vekişandina şirketa kanadî Talisman Energy li 2002ê ve, tankerên rojavayî tunene. Li aşxaneyên paytextî, çînî û lîbyayî li ber maseyan in, lê amerîkî û ewropî hindik dibin... Li otela Coral, xizmetkar hemû xerckirinên bi karta bankayî bi heman gotinê red dikin: "Em tenê pereyê pêşin distînin. Em di bin ambargoyeke amerîkî de ne".

Ev dorgirtina ticarî li Waşîngtonê tê rave kirin. Li meha kanûnê, rayên ku bircên zengilan ên zanîngeha Georgetown û Kongreyê bi hev ve girêdidin, ji ber barîna berfê wekî di xewê de ne xuya dikin. Pêlên Potomacê di bin qeşayeke zirav de asê dibin, rohnîyeke qeşayî xwe berdide ser. Lê ji bo lobîst, dîplomat, rojnamevan û siyasetmedarên ku çavdêrîya referandûma li ser serxwebûna Sûdana Başûr dikin, xirecir û liveliv e. Dibe ku meşandina aştîyane ya dengdanê, dawîyê li zivistana dîplomatîk a navbera Sûdan û DYAyê bîne.

Bê şik, Ted Dagneyê di dezgeha xwe ya bêpace de di înzîwayê de ye, vê rewşê ji nêz ve dişopîne. Ji bîst salan ve ye ku ev bisporê strihê Afrîkayê yê bi servîsa lêkolînê ya Kongreyê ve girêdayî, weke mêjîyekî siyaseta derve ya amerîkî li hember Xartûmê tê hesibandin. Têkilîyên navbera her du welatan, piştî darbeya el-Beşîr a li 1989ê xira bûbûn, lê "ji 1992ê ve desthilata amerîkî bi rastî bala xwe daye Sûdanê", Dagne bi bîr dixe. Çawa? Li wê demê, Sûdan weke parêzvanekî îslamperestîya tundrew dihat dîtin; wê ji bo perçiqandina serîhildana nûbî xwîn rijandibû û li ser axa xwe terorîstên bi navê Carlos û Usama bîn Ladîn vedihewandin.

Dagne dibêje ku li heman serdemê, wî li gel heşt memûrên payebilind û siyasetmedarên ji kiryarên Xartûmê nerazî, toreke bidizî ya bi navê The Council (Meclîsa Şêwirê) ava kir. Ji destpêka salên 1990ê ve, vê lobîya nefermî tesîr li hişkbûna gav bi gav a helwêsta amerîkî ya li hember Welatê reşikan kiriye. 1993ê, daxwazên Dagne bi cih dibin dema ku, piştî têkilîyên pênc welatîyên sûdanî li gel êrişa yekemîn a li dij World Trade Centerê piştrast dibin; îdareya Clînton, Sûdanê li lîsteya dewletên piştgirên terorîzmê qeyd dike. Di heman demê de, meylên serîhildêr ên îsyankarên başûrî, ku Dagne dengê wan li Waşîngtonê vedida, bala hilbijartîyên bandordar dikişand û alîkarîyeke fînansî û teknîkî dan wan.

### Benîştê sûdanî a bi kalîteya Heşab, emulsiyona herî baş pêk tîne

Li 1997ê, "bazên" Susan Rice û John Prendergast, alîkara wezîrê karên afrîkayî û bispora Afrîkaya Rojhilat li Desteya Neteweyî ya Ewlehîyê, alîyê reqabeta Sûdanê digirin. Bi naskirina

#### Çend statîstîk

Ji şêst hezar tonên benîştê erebî ku salane tê hilberîn, Dewleta Sûdanê xwediya nîvê wê ye û difiroşe derve. Çad çaryekê wê û Nîjerya ji sedî dehê wê difiroşe. Panzdeh welatên din ên ku vî berhemî difiroşin (Malî, Senegal, Ûganda, Tanzanya, Etîyopya, Kamerûn…) xwediyên beşê mayî yê bazarê ne.

Fransa muşterîya herî mezin e û bi tena serê xwe %46ê hemû hilberînê dikire. Karpêkirin û veguhartin û dîsa îxrackirina bo welatên din –bi taybetî bo Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê– li Fransayê pir baw û pêşketî ye.

Toneke brut a benîştî bi bihayê 2 500 dolaran tê firotin û piştî ku hate palîn (rafînekirin), tona wê li gor keyfîyeta berhemî, bi bihayekî di navbera 8 000 heta 12 000 dolaran de tê firotin.

"tehdîdeke ne ji rêzê û neditî li hember ewlehîya hundirîn û siyaseta derve ya Dewletên Yekbûyî", serok William Clînton li 3ê mijdara 1997ê Executive Order [fermana birêveberîyê] ya 13 067ê îmze dike û mueyîdeyên ticarî yên berfireh dipejirîne.

Di nav deh salên piştê vê, têkilîyên her du dewletan hîn xirabtir dibin: Ji ber 300 000 kuştî û du mîlyon pênaberên Darfûrê, George W. Bush mueyideyên nû li ser Sûdanê ferz dike û Barack Obama wan didomîne. Cemidandina fonên sûdanî li ser erdên amerîkî, qedexekirina itxalat û ixracata tişt an xizmetan, ji an jî bo Sûdanê, qedexekirina danûstandinên fînansî... Dewleta parya ku bi xirabîya mutleq ve tê girêdan, Welatê reşikan ji wê û pê ve li kevîya aborîya rojavayî dijî.

Lê belê, piştî biryarnameya serokî, "laboratuwara American Home Products, a ku dermanê Advîl çêdike, dît ku ev benîşt tunebe, xelk ê bimire", Janet McElligott a lobîst bi bîr dixe. Heman pirsgirêk ji bo vexwarinên gazozî jî pêk hat, ji ber ku "benîştê sûdanî a kalîteya Heşab, emulsiyona herî baş pêk tîne. Ev hêmanekî klît a terîfê ye", Dennis Seisunê serokê Dezgeha Lêkolînên Bazarê IMR International lê zêde dike. Li ser şîrikê biha, kevnewezîra karên derve Madeleine Albright weha gotibû: "Pirsgirêka mueyîdeyan ev e: Em carina nizanin ka kî kê bi rastî ceza dike ".

Ji ber ku şûngirên bi heman kalîteyê tunebûn, misogerîya domdarîya tedarîkkirina benîştê sûdanî bûye pêwîstîyeke jîyanî; çi dibe bila bibe. Li dawîya 1997ê, Flowermanê bazirgan tek noqte bû ku tê re E 414 dikeve nav erdên amerîkî. Dorgirtina aborî, şirketa wî ya li Morristowna New Jerseyê bicihbûyî dixist xeterê. McElligott, ku hingê şêwirmenda balyozê sûdanî yê li Waşîngtonê, Mahdî Îbrahîm Mohamed, bû, vedibêje ku Flowerman çend caran li xanîyê ferdî yê dîplomatan bû mêvan, li 2 800 Woodland Drive li kêleka daristana Rock Creek Parkê û li gel wî muşterîyên cûr bi cûr ên weke American Home Products, Coca Cola û Fanta jî hatibûn...

Mohamedê ku taktîkvanekî jîr e, muafiyeta mihtemel a benîştî weke sindoqa Pandorayê dihesibîne, ku dê guherînên din li ser ambargoyê bi xwe re bîne. Tedbîr ev bû ku pîşesazên amerîkî bi pêş de herin; dîplomatê sûdanî herweha ji bo xurtkirina nîqaşeke baş amadekirî agahî dida wan: Xeter li ser îstîhdamê heye û nemaze rîsk heye ji bo pîşesazîya cotkarî-xwarinî ya amerîkî ku dikare bikeve bin destê bazirganên fransî yên li Sûdanê pir çalak in.

### Hîn mimkin e ku bi her vexwarineke gazozî ya amerîkî ku em distînin, em pereyan ji Bîn Ladin re dişînin

Piranîya itxalatkarên amerîkî li eyaleta New Jerseyê bicihbûyî ne û ji ber vê yekê, ew berê xwe didin parlementerê eyaletê, Robert Menendezê demokrat, yê ku berê xwe dide "Qesra Sipî, desteya ewlehîyê ya serok Clînton û wezareta karên derve", Dagne vedibêje. Telefona Menendez di bîra Albrightê de maye, wê jê pirsîbû: "Hûn çawa dikarin muafiyetekê ji bo Sûdanê bixwazin, dema ku hûn bi tundî li dij çi muafiyetê bo mueyîdeyên me li ser Kubayê derdikevin? [Menendez bi xwe kurê koçberên kubayî ye.] Wî weha bersiv da: "îstîhdam".

Li ber vê pirsa ahengdarîyê, îdareya Clînton nerazîbûnên Albrightê pişt guh dike û biryarê dide: Tîrmeha 1998ê, belgeya Sudanese Sanctions Regulations diyar dike ku ambargo li ser her tiştî heye... ji xeynî benîştê erebî. Menendez jî, da ku ev biryarname bikeve ber qanûnê, du salan bi şûn ve ev muafiyet xist rêznameyeke tevlihev ya têkildarî bazirganîya navneteweyî. Gelo ev tesaduf e? Hesabên kampanyaya hilbijartinê yên demokrat nîşan didin ku di heman salê de, wî hîbe ji Chris Berlîner ê alîkarê serokê şirketa bazirganîya benîştî Import Service Corporation, ji komeleyên nûnerên pîşesazîya sodayan û herweha ji fîrmaya Coca Cola standine. Li gor Steven Glazer, rojnamevanê heftaneya Urban Time News, ku li ser hesabên wî sekinî, Menendez di navbera 1997ê û 2002ê, de 55 669 dolar hîbe bi tenê ji şirketên sektorên sodayan, cotkarî-xwarinî û dermankarîyê wergirtin.

Menendez bersiv nedaye daxwazên me yên liserhev yên ji bo hevdîtinê, lê wî sala 2000ê tevgera xwe bi nameyeke vekirî ji bo Washington Postê wisa rave kiribû: "Bila tu kes bi çeteyan re nekeve têkilîyên bazirganîyê. Lê, eger berhemeke ji me re pêwîst di destê van çeteyan de be, bazar wê riyekê bibîne ku wê bîne ser refên dukanên me". (28ê îlona 2000ê) Bes wê salê, di nav çeteyên behskirî de, Usama bîn Ladin jî hebû... Çar salên berî vê, noteke ji wezareta karên derve ya amerîkî, li ser esasê çavkanîyên Central Intelligence Agency (CIA), jixwe weha dabû xuyan ku terorîstê suûdî "hema hema monopolek li ser piranîya ixracatên benîştê" sudanî bi dest xistibû. "Hîn mimkin e ku bi her vexwarineke gazozî ya amerîkî ku em distînin, em pereyan ji Bîn Ladin re dişînin", senatorê komarparêz Frank Wolf salek berî êrîşên 11ê îlonê (7ê îlona 2000ê) weha li ber Kongreyê şermezar kiribû.

### "Eger Amerîka dev ji mueyîdeyên li ser benîştê erebî berde, dîplomasîya wê ya exlaqî dê bê selahiyet bimîne"

Hikûmeta amerîkî ya berpirsa lêpirsîna girêdanên benîştî û tora El Qaîde, ferman da Paul Flowerman ku navên birêveberên şirketên suûdî yên benîştê erebî digel hîsedarên wan bide wan. Bi gotinên vî bazirganî, ev agahî rasterast ji Albright û paşwerên wê re hatin pêşkêş kirin. Lê belê, benîşt ew qasî girîng bû ku heta wezaret van galgalan pûç derxîne, ixracat jî nedan sekinandin. Her çi vekişandinên balyozan, bombebaranên amerîkî yên ne ewle li dijî kargeha dermankarîyê El Şîfayê li tebaxa 1998ê, tawanbarîyên jenosîdê li Darfûrê û zêdeyîya dijberîyên hevpar in, xem nake... "Amerîka û Sûdan ji hev nefretê dikin, lê belê herweha muhtacî hev in", bazirganek weha dinirxîne. Herçend ferzkirina kotayan wê bişidîne jî, danûstandina şirik xwe li ber hemû guherînên jeo-siyasî girt û îstîqrara wê mirovî matmayî dihêle.

Dîsa jî, lîstika dualî ya amerîkî carcaran jîyana siyasî ya Dewletên Yekbûyî dike jehr. Li alîyekî, Black Caucus (koma parlementerên reş li Kongreyê) hîn dixwaze vê girêdana ticarî ya li gel desthilateke nefretjêkirî xira bike, weke hilbijartîya demokrat Maxine Waters li 2007ê, bi pêşniyaznameya HR 3464 hewl daye bike -lê serkeftî nebû. Li alîyê din, lobîya benîştê erebî, ku Menendezê niha senator rûyê wê ye, dixebite ji bo ku têkilîyên ticarî bi Sûdanê re bidomin û adetên bikirên amerîkî biparêzin. Di serî de, çivên ku yekemîn hêza dinyayê, dide xwe, zirarê dide bawerîya bi xwe ya li ser meseleya sûdanî. "Eger Amerîka dev ji mueyîdeyên li ser benîştê erebî berde, dîplomasîya wê ya exlaqî dê bê selahiyet bimîne", Washington Post hişyar kiribû (10ê îlona 2000ê). Li Xartûmê, her kes bi muafiyetê dizane û reaksîyon di navbera tinazpêkirin û serbilindîya ji vê pêwîstîyê de diçin û tên.

Jixwe, tevî tehdîdên dîplomatên xwe, Sûdan dizane ku ew zêde bi muşterîya xwe yaamerîkî ve girêdayî ye û nikare biryarên bersivdayîna ticarî li hember bigire. Dezgeha wezareta amerîkî ya maliyeyê ya berpirsê bicihanîna ambargoyan (OFAC) dest nîşan dike ku heta niha 25 lîsans hatine dayîn. Li gor OFACê jî, 8 800 tonên benîştî 2009ê û 10 450 ton 2010ê hatine ithal kirin. Flowerman van hejmaran red dike û behsa pênc lîsansan û li ser hev 4 000 tonan dike. Domdarîya vê bazirganîyê xwe dispêre bêdengîya li ser Sûdanê ya ticarên benîştî. Lê ji bo ku rîskên reklama xirab kêm bikin li cem amerîkîyên ku rojane resmên George Clooney û Angelîna Jolie di pênabergehên Darfûrê de dibînin, bazirgan niha li gel Dezgeha Dewletên Yekbûyî ji bo pêşxistina navneteweyî (USAID) kar dikin da ku serêkanîyên tedarîkê berfireh bikin.

### Benîştê erebî "madeyeke xam e ku dikare aştîyê pêk bîne"

Ev jî alîyekî din ê Dîplomasîya Sodayê ye: Dewletên Yekbûyî odeyên bandorê yên bi hêz û têkildarên alîkarîya pêşxistinê bi kar tînin, ji bo ku bersiva pêwîstîyên stratejîk ên pîşesazîya cotkarî-xwarinî bidin. Mîqdarên mezin ên benîştî aniha ji Senegal, Çad an Nîjeriyayê tên ixrac kirin, heta ku Sûdan êdî bi tenê % 50ê ixracatên dinyayê pêk tîne –berîya bîst salan ev rêje % 90 bû. "Pîşesazan herweha berê xwe daye Kenya û Ugandayê", Seisun lê zêde dike. Akasyayên li Fransayê? "Dê qezencker nebe, Alland cewabê dide. Ne zêde germ e û warên çandinê erdekî zêde digrin".

Li gel vê îtîrazê, bazirganên fransî yên benîştî, şîrikê darê yê guherandî bi nivîsa "Made in France" difiroşin. Bi awayekî anonîm, pîşesazekî fransî dibêje ku ew li çardeh welatên Afrîkayê benîştî dikire berî ku wê biguherîne: "Em terîfên xwe li ser bi kar tîninBenîştê xav û berhemên ji kargehên me derketî, ji hev pir û pir cida ne" û ew derdibire ku bi vî rengî, benîşt "eslê xwe winda dike" berî ku dîsa were ixrac kirin, ku taybetî ber bi... Dewletên Yekbûyî ve. Lê belê, amerîkî li pêdivîya xwe ji cem fransî an jî îtalîyan jî tedarîk bikin, "talîyê, ew hîn şîrêza Sûdanê ye!", Siddig dike hawar.

"Pêvajo bi temamî ne dirust e!", kevneserokê desteya birêveberîyê ya Gum Arabic Company, Mansour Khalid, lê zêde dike. Her weha, gotgotên nayên diyar kirin, dibêjin ku benîşt herweha di ser Sûdana Başûr, Erître û Etyopîyayê re, ku mueyîdeyên amerîkî li ser wan tunene, derbas dibe û dîsa difiroşin Rojava. Wê demê, ku benîşt bi riya Ewropayê hatî lê zêde bibe, hejmarên pir bilindtir ên şîrikê darê (li gor hin texmînan 5 000 tonên zêde) digihîjin perava rojhilata a Dewletên Yekbûyî, li gel navberkarîya pîşesazên ewropî ku perdeyeke dûmanê ji mişterîyên xwe re misoger dikin.

Li gel terciha Sûdana Başûr a serxwebûnê di dengdana 2011ê de, dîplomatên sûdanî hêvî dikin ku dabeşkirina aştîyane ya welêt ê digel rakirina mueyîdeyên amerîkî, zêdebûneke matematîkî a ixracatên benîştî jî bi xwe re bîne. Tevî xêzkirina navê Sûdanê ji lîsteya dewletên piştgirên terorîzmê, ev yek ji sozên Scott Gartion, şandeyê taybet ê wezareta karên derve li Sûdanê ye, da ku hin daxwazên Dewletên Yekbûyî bi Welatê reşikan bide qebûl kirin. Her çi bazirganên amerîkî ne, ew çavdêrîya rewşa li Darfûrê dikin, ji bo ku bi vegera istiqrarê çandina akasyayê dîsa dest pê bike û tedarîkkirina E 414 misoger bibe. "Akasya dareke berhemdar e, Jack Van Holst Pellekaa şirove dike, çandina wê kirineke ekolojîk e" ku rê dide şînbûna Sahel a ziwabûyî. Li gor vî bisporê Banka Dinyayî yê berpirsê bernameyeke veçandina daran li Sûdana Başûr, hevkarîya li nav welatên hilberînerên benîştî û mişterîyên wan ên rojavayî "ji bo herdu alîyan qazanc" e. Li gel lîstika jîr a li ser peyvan, ji bo hevpîşeyên xwe yên sûdanî, Paul Flowerman behsa şîrikê biha weke "yekkereke", xwarinekê dike ku ji bo emulsîyona berjewendîyên ticarî yên amerîkî-sûdanî bi feyda ye. Dema ku behsa berhema xwedêdayî ya di berkêşka yanzdehê a dolaba baldarîyan a India Houseyê de tê kirin, çavên Van Holst Pellekaan diçirisin. Ew bi xwe pê bawer e: Benîştê erebî "madeyeke xav e ku dikare aştîyê pêk bîne".

* Rojnamevan

1 Madeleine Albright, Memo to the President Elect: How We Can Restore America's Reputation and Leadership [Not ji bo serokê nû hilbijartî: Em çawa dikarin prestîj û lîdertîya Amerîkayê lê vegerînin], Harper, 2008

2 "Usama Bin Ladin: Islamic Extremist Financier" ["Osama bîn Laden: Fînanskerê îslamperestîya tundrew"], State Department, Waşîngton, 14ê tebaxa 1996ê, dikare li ser vê malperê bê xwendin: http://usembassy-israel.org.il/publish/press/state/archive/august/sd4_8-15.htm

Wergera ji fransî: Simko Destan

## Şirketa Coca-Cola û benîştê erebî

Li pişt benîştê erebî (benîştê akasyayê) hindek nihênîyên muşterî-melik ên bazirganên meşrûbatê veşartî ne: Şirketa Coca-Colayê. Sala 2007ê, arîkarên hilbijartî yên Kongreyê radigihînin ku gava ku **Maxine Watersa** hilbijartîya Demokratan hewl da qanûna *HR 3464* bide qebûl kirin, tûşî rexneyên lobîstên vê sembola kapîtalîzma amerîkayî (Coca Cola) hatine. Vê qanûnê tevahîya bazirganîya benîştê sûdanî qedexe dikir. Û bi ya **Christian Harbulot**, rêveberê ***École de guerre économique***ê, şirketa Atlantayî digel Ajansa Dewletên Yekgirtî bo Geşedana Navneteweyî (USAID- United States Agency for international development) hevkarî kiriye, da ku arîkarîya darayî ji bo rêxistina ne-hukûmî ya swîsreyî ya bi navê **Medair** dabîn bike, ku ev rêxistina navbirî beşdarî avakirina bîrên li rojavayê ***Darfour***ê bûye.

**Harbulot** yê ku serçaveyên xwe aşkera nake, wisa difikire ku "*qonaxa li ber Coca-Colayê pir sade ye: Bi kurtî ew e ku wê potansîyela ked û karî cîbicî bike da ku rê bide hilberîna benîştî*" Bi hezaran caran ji grûpa amerîkayî sebaret bi pêkhateya vexwarina wê ya binavûdeng pirsîne, lê her carê red dike ku îstifadeyê ji benîştê erebî yê li welatên din ên sahilê dike –ku yek ji dabînkerên benîştî yên grûpê, bi şertê parastina nihênîya navê xwe, vê beyana wan pûç dike û îdia dike ku rast e ku grûp benîştê erebî bi kar tîne.

Li ser pirsyarekê, berpirsekî pilebilind ê dabînkirinê yê grûpa navbirî, ji ber tirsa "*ku tûşî probleman bê*" nexwast bersivê bide. Tevî hejmareke mezin a ferzên di wê bareyê de, tu delîlekî berbiçav û resmî nîne ku di vê meşrûbê de, ku li dinyayê herî zêde tê vexwarin, benîştê sûdanî heye. Digel wê hindê, hebûna şirketa amerîkayî li **Sûdan**ê ji bal hemû kes û alîyan ve tê zanîn û bi tu rengî nihênî nîne. Hema li derçûna ji firokexaneya navneteweyî ya **Khartoum**ê bal û awirên mirovî diçine ser reklamên vexwarina binavûdeng ku bi dirêjîya riyên sereke li dû hev rêz bûne. Ji sala 2000ê ve,

***The Coca-Cola Company*** berhemên xwe li welatê reşikan bi riya şirketa *DAL Food Industries* belav dike; li jêr sîwana qanûneke sala 2000ê ku bi rengekî awarteyî destûr dida berhemên çandinê têkevin nav bazarên Sûdanê. Der heq Coca-Colayê, dîplomasîya Coca Colayê hem di karê îthalkirin û hem jî di yê îxrackirinê de bi kêr tê.

G. P.



ZARA KAYRA (10 SALÎ)

# Bi derbên neşterê jinûve çêkirina dinyayê

MONA CHOLLET *



NEWA XWEZA (3 Salî)

Laurie Essiga li Zankoya Middleburryê li Vermontê mamosteya sosyolojîyê, bihara 2007ê, li buroya xwe rûniştî, bi du bankevanan re bi xeta telefonê di hevpeyvînê de ye û ji wan re bi awayekî qet'î radigihîne ku Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê li ber krîzeke mezin e. Lê belê, şarezatîya wê ya di warê aborîyê de bes têra wê hindê dike ku bikare heqê qehweya xwe ya sibehê bide. Lê belê, qada wê ya lêkolînê di sosyolojîyê de, anku cerahîya estetîk, ew anîbû pêşîya dikê da ku berê xwe bide wê diyardeya ku ew jê re dibêje *"krîza deynên-birînê laşî)"*. (1)

Li Dewletên Yekgirtî, heqê qederê % 85ê mudaxeleyên estetîk (cerahî, herwiha lazer û derzî) bi pereyê deynkirî tê dan. Weku li hemû dewletên din ên dinyayê -ji bilî Meksîka û Awustralyayê- ne hewce ye daxwazkerê deynî tu hatinîyeke mînîmûm nîşan bide. Ev rewş vedigere ser du tedbîrên ku **Ronald Reagen** di sala 1981ê de, anku kêm wextek piştî ku bû serokdewlet girtin: Azadkirina reklamên dermanan li alîyekî û rakirina sazkarîya li ser kredîyan li alîyê din. Dezgehên taybet bi warê fînansekirina mesrefên tibbî, ku ji wan ya herî giring ***CareCredita*** endama ***General Electric*ê** ye, kredîyê dide herkesî, hetta ewên herî feqîr û destteng jî. Rêjeya faîzê tê heya bigihe %28ê û tê heye du caran zêde bibe gava ku deyndar pişka mehekê nede (2). Cerahîya plastîk ku caran bes karê dewlemendan bû, bi vî rengî veguherî diyardeyeke berbelav a *"standardkirina rû û bedenan"*. Pratîsyenek [bisporên estetîkê] dibêje ku *"cerrahîya plastîk bi qasî ku jinên kûafor cezb dike, ewqas jî jinên pilebilind ên stafê Wal-Martê cezb dike"*-muşterî %90 jin in û %80 spî ne. Ji sala 2000ê heta 2010ê, amerîkayîyan salane nêzîkî 12,5 milyar dolar bi cerahîya estetîk xerc kirin.

Mezinbûna sektorê –di nav deh salên dawîyê de %465– da pey firehbûna neqeba di navbera dewlemend û feqîran de. Maneya kiryara estetîk ev e: teşebusa çareserkirina nakokîya di navbera xewnên her bişatefattir ku bi berpêşkirina medyatîk a şêwejîyana çînên îmtiyazdar têne avdan û hatinîyên her kêmtir dibin.

Lê belê cerahîya estetîk herwiha beramberî wîzyona lîberal a tebayekî ebedîyen sertewandî ye, tebayekî ku tu biryardarîyek pê re nîne û hazir e daîmî bixebite ji bo mukemelîya xwe. Sektora navbihurî sûdê ji wê bawerîyê werdigire ku belê kêşe û çareserî, têkçûn û serkeftin, giş di cewher de vedigerine ser ferdan, anku meseleyên kolektîf nînin.

Rapêçayîbûna bi mentiqeke wiha jixwe zelal dike ka çima ev endûstrî neket ber tesîra krîzê. **Laura Essig** zû têgihişt ku hevwelatîyên wê ji her demê zêdetir hazir û bibiryar bûn ku xwe dirêj bikin bin çiraya emeliyatê, herçend ev yek bike îpotekeke diduyê jî bête ser xanîyê wan. Li ber çavê wan, laş sermîyanek e ku divê li bazarê –bazara evînê an jî bazara kar– qîmeta xwe peyda bike da ku şansê xwe yê gihiştina bi xewna xwe ya amerîkayî [xewna amerîkayî: Bawerîya ku herkes dikare bi saya hewl û cesareta xwe bigihe serkeftin û dewlemendîyê] zindî ragire. Lewma, destkarî û guhartina laşî da ku zerîftir be, veberhênana herî mentiqî ye. *"Ez dibêjim heke ez evqas pîr û evqas westiyayî xuya nebûma, belkî min dê zêdetir muşterî hebûna"* dibêje ji **Essig**ê re hevaleke wê ku li ser hesabê xwe dixebite û tevî ku pir destteng e –bibûrin: ji ber ku pir destteng e–, hêj nû 800 dolar dan derzîyên tedawîya estetîk da ku kend û kûrên di navbera poz û qeraxên lêvên xwe de tijî û rast bike. Bi vî rengî, dide ser tenya riya ku ew dikare ji bo çareserkirina nehêminîyeke bingehî lê bifikire .

Li Fransayê jî, endustrîya estetîkê xwe ji îstifadekirina ji vê nehêminîyê nade alî, ku dosyeya "Dîsa ciwanbûn"ê ya kovara *Elle* rûyê fransî yê meseleyê radixe ber çavan. Nimûneya "Chloe, 36 salî" yek ji wan gelek nimûneyên din ên dosyeyê bû ku "hizra dermatolog" bêqeyd û şert qebûl kiribûn: *"Dahatûyê, asîda hyaluronîk nîne tiştê lazim ji bo qermîçekan, lê toksîna botulîk e* [made û dermanek e cerahîya estetîk e]. (3) *Heçî şiklê rû yê oval e, her ji îro ve divê xema wê bixwî. Gava dibî 50 salî, heke bi rastî peytîya xwe ji dest dabe, hingê bi tenê lifting* [operasyona vezelandin û vekişandina çermê rû yê çilmisî] *dikare wê 'sererast' bike."* (4)



SERDEST GÖKÇE (9 Salî)

Laura Essig bi bîr dixe ku îdeolojîya lîberal xwe dispêre bawerîya "azadîya hilbijartinê". Lê, tiştê ku mirov pê diheyire, bêçaretîya li axaftina beşdarên anketê veniştî ye: *"Me bivê an me nevê, bes zahir giring e di civaka me de"*; *"Rastî ew e ku post hergav dikeve destê wî/wê yê ku ji hemîyan ciwantir xuya dike"*, hwd. **Lifting** an **Botox** li pêş çavên wan qedera wan e, mecbûr in pê rabin, *"her wekî bacê an jî mirinê"*, dibêje Essig. Bi vî rengî, ew bixwe wê rastîyê diafirînin ku zahiren bes riayetê lê dikin, her weku tesîra giştî ya kiryarên wan, ji ber hatin-redkirinê, li dijî wan vedigere. Ji ber ku herkes dixwaze xwe ji cemaeta asayî û asayîbûnê cuda bike, bilindbûneke bême'ne ya standardan binecih dibe ku li gor wê divê enî hertim bêtir lûs bin, rû her bêtir peyt be, memik her girtir bin. Lehîya wêneyên laşên sûnî, lûs û şayîk, anku yên manken û navdaran, wê meraqê li wan çêdike û dibe sebeb ku beramber laşê rastî, di nav wan de nerihetî, nerazîbûn û nefretek geş bibe.

Îronîya herî mezin: Xewna behra pitir a pratîsyenan, destpêkê tiştekî din bû, bi taybetî cerahîya sererastkirin û çarekirina parçeyên kêm ên laşî bû; Lê belê, piştî ku ew bixwe jî bûne xwedîyên kredîyan ku mehane heqê wê vegerînin, bûne bisporên serûberkirina sîng û beran û lîposûksîyonê [rûn hildan, li deverên laşî hildana rûnê zêde]...

Hindek digihine wê qenaetê ku kar û çalakîya wan ya yeke femînîst e, lewre rê dide jinan ku *"li ser xwe qedr û xwebinîyeke wan a çêtir hebe"*. Bi ya Laurie Essigê, ev boçûn kêşesaz e lewre 'bawerîya bixwe hebûnê têkel dike digel wê rihetîya ku*"îsbatkirina sedaqeta xwe bo nîzama serdest"* dide mirovan û lêkolînera navbihurî vê tehlîla xwe dispêre sentezeke kêrhatî ya berhemên **Michel Foucault** ya li ser sepandin û bikaranîna modern a desthelatê bi dîsîplîna laşî. Dest nîşan dike ku her ji serî ve, projeya cerahîya estetîk projeya normalîzekirina cinsî û ewqasî jî nijadî bû: Armanc dikir wan hemû îşaretan jê bibe ku yek wek "ne-spî" tesnîf dikirin, laşê xwe yê "xerabûyî" jê rizgar bike, lê herwiha Cudatiya cinsan derxe pêş, ku ew bixwe jî wek nîşana raserîyeke nijadî dihate dîtin.

Pratîsyenên ewil dixwastin "pozê cihû an jî îrlandî" durist bikin; îro, ceraheki îranî diyar dike ku *"Disneyê neheqîyeke mezin li pozê îranî kir"*. Heçî şewq û sergermîya jina spî ya bo neşterê ye, ku neşter ruwaleteke bêtir "jinane" lê dibexşîne, ew şewq û sergermî her ku çû zêdetir û xurttir lêhat.

"Bêtir jinanebûn", "bilindkirina bawerîya bi xwe": Li Fransayê, armancên wiha di navenda "Rojên Hewlên Relookingê" [relooking: Guhartina ruwalet û zahirê xwe] de ne ku *Pôle Emploi* (Merkeza Karpeydakirin û ya Bêkaran) ji bo bêkarên ji-mêj-ve bêkar, bi hevkarîya *Fonds Ereelê* bi rêk dixe. Di nav endamên rûmetê yên vê bizava xêrxwazîyê de du cîgirên şaredarê navçeya 16 ya Parîsê, şefê metbexên *Hotel Matignonê*, hetta feylesof **Cynthia Fleury** jî hene; "dapîra rûmetê" ya bizavê *Penelope Fillon* e. Ku rayedarên pilebilind û hevsera serokwezîrî, ya ku qanûna mertalê darayî [qanûna kêmkirina bacê ku ji karên mezin tê wergirtin û zêdetir bi kêrî dewlemendan tê] binecih kirî, hatin rojeke xwe dane axiftinên nazikane û dilrehetker, beşek ji mexdûrên wan ên rasterast ji şêl û elaqeya wan gelek muteessîr bûn. Weku rojnameya *Le Canard Enchaîné* bi xinizî diyar dike, *"li ser devera 'buroya îmajê' ku derîyê rû-guhartina bêkaran vedike* [ku berê jî li ser bernameya bi navê "ça se discute" ya France 2yê xuya bûbû], *her çi kesê an kesa ku bi porekî girj tê, piştî çend saetekan xwe bi porekî lûs an jî lûle vedibîne ."* (5)

Heynê destpêka medyatîk a çalakîyê, meha çileyê (6), aktrîs **Marie-Anne Chazel** ji bo nehêlana bêkarîya berbelav, bawerîya xwe ya bi "kar û kiryarên keçane" derbirî. Herçend zêde li pêş çavan nebe jî, hebûna xanim **Fillon**ê li wê derê derfet da me ku em têbigihin ku bêtir hez ji cilûbergên reş û gewr dike; belkî divê ew jî rengên germtir û birqoktir tercîh bike û jinaneyîya xwe bêtir bide pêş çavan: Boyaxekê li porê xwe ke? Biwêre dekolte li xwe bike, mucewherek, soreke sivik, rûjek bi ser lêvên berçav? Parlamenter **Bernard Debréyê** serokê rûmetê yê *Fonds Ereelê* û mudawîmê stûnên hefteyî yên *Valeurs Actuellesî*'ê, ku li wê derê derbarê "paradoksa wekhevîparêzîyê" de diaxive (7), bi hêrs pê de diçe: *"Meh bi meh carinan bo wextekî zêdetir, ji xwe re nekirine 'edet ku bi duristî serê xwe bişon, serê xwe şe kin, makyajekê bidine ser rûyê xwe."* Makyozê ji keçeke feqîr a bi navê **Latifa** re pêşniyaz û nesîhetên xwe rêz dikirin –navek ku belkî pêwîst be ew jî di seanseke *relooking*ê re derbas bibe: *"Jêra çavên xwe baş mist din da ku çermê we neqermiçe."* Gelo dibe ku heta wextekî kurt, heqê liftingeke taybet bidine wan kesên ku alîkarîya dahatên herî kêm werdigirin?

* Rojnamevan û nivîskar

1 Laurie Essig, *American Plastic. Boob Jobs, Credit Cards, and Our Quest for Perfection* (Cerahîya Plastik a Amerîkî. Karên Memikan, Kartên Kredîyê, û Daxwaza Me ya Bêqisûrbûnê) Beacon, Boston, 2010. Heke referanseke din nehatibe nivîsandin, ji bo jibergirtinên din jî heman çavkanî

2 Tebaxa 2010ê, dozgerê giştî yê wîlayeta New Yorkê derbarê CareCredit û dezgehên din ên kredîya tibbî de dest avêt lêpirsînekê ku bi xapandina muşterîyên xwe dihatine tawanbar kirin

3 Derzîyên toksîna botulîk qermîçekên li ser rû bi riya sabitkirina masûlkeyên rû ji bo demekê jê dibe

4 "Spécial Rajeunir (Dosyaya Taybet a ji nû ve Ciwanbûnê )", *Elle*, 4 reşeme 2011

5 "Penelope "soigne son look" à Pôle Emploi (Penelope "li look [peyva ingilîzî ji bo *zahir*]a xwe miqate ye" li Pôle Emploiyê) ", *Le Canard Enchaîné*, 26 çile 2011

6 "Opération relooking pour des chômeuses (Ji bo Bêkaran Operasyona Relooking) ", www.nouvelobs.com, 11 çile 2011

7 *Valeurs actuelles*, 16 kanûn 2010

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

www.arsivakurd.org

# ÇAND Û HUNER

## "Meryema" Sebrî Silêvanî

### KEJO BAJAR


Dîroka serhildana mê û mêyîneyan di nav kurdan bi reh e, rehek jê digihîje **Zelîxe Xanimê**, yek jê digihîje **Leyla Qasim**, yek jê digihîe **Eyşe Şana** ku dengê wê têra xwe serhildêr e, rehek din jê digihîjje **Meyremxanê** ku dizane ji refê xwe biqete û bikeve pey guran. Lehenga romana **Sebrî Silêvanî** *Meryema* jî ji heman rehê û eşîrê ye. Lê jinxasîya **Meryema** ne ji serhildêrîya çekdar ya li hember dijmin tê, ji serhildêrîyeke mêyane ya li hember civaka kurd, dewleta kurd bi xwe ye. *"Me ji bo pir tiştan şehîd dan, ez jî amade me bibim şehîd, şehîda rastîyê."* Di civaka yewnanî de ji rastgoyan re dibêjin ***parrhesia***. Ji ber ***parrhesiya*** dike ku mirov cêlî bibe, têkeve girtîgehan an jî dike ku serê mirov bifire, lê yê ku bi êşa parrhesiyayê ketibin zû bi zû dev jê bernadin. Ew ***"Sêva bi Dara Rût ve"*** ye; jinxasên ku jê xwaribin tim kurmên wê tê wan.

Meryema di civaka mêr û kurd de rastî gelek neheqîyan tê. Di zarokîya xwe de dê dimire û li ber destê dêmarîyê (***Mencol***) dimîne, piştî mirina bavê xwe, bi nav lepên ***Mehemedê Meyrê*** dikeve da ku *Zarê Mezin* (cin) ji nav wê derxîne. Lê ji dêlva ku *Zarê Mezin* ji nava wê derxîne, bi tecawizê ***semyanekî*** di malzaroka wê de dihêle ku ew ê heta hetayê mirî bimîne. Wê ew di nav romanê de heta hetayê sax bimîne . Navê tabloyeke Meryemayê ***"Semyan"*** e.

*"Ez bûnewereke mê me, barê min giran e, çunkî hemû bi carekê ber bi nêrbûnê ve diçin…"* Meryema derzên ruhê xwe bi tabloyan dide der. Ew bi xwe wênesazek e. Îstegeha jîyana wê ya duyemîn **Hejarê Pêşmerge** ye. Meryema bi tabloya xwe ya bi navê ***"Şûnwar"*** tevlî pêşangaheke hunerî dibe û li wê derê rastî Hejarê Pêşmerge tê. Di encama têkilîyê de ev dîyaloga Hejarê Pêşmerge ya watedar derdikeve: *"Pere ji bo xerckirinê ye, neyar ji bo kuştinê ye û jin jî tenê ji bo ganê ye."* Di îstegeha evînê ya duyemîn de **Îslamê komunîst** derdikeve pêşberî Meryemayê. Îslamê komunîst di pêşangehê de pêrgî Meryemayê tê û qonaxeke evînê ya nû dest pê dike. Îslamê komunîst ê ku xwe li ser rastîyê kiriye, rastîya wî di axaftineke telefonê ya bi Meryemayê re xwe weha der dibe: *"Tu hez dikî ez ji pêşîyê ve bêm te, da ji keçînîyê bikevî û li dawîyê bi ser min de bimînî."*

Tîrmeha sêyemîn -ku bûyerên bi serê Meryemayê de tên, giş di meha tîrmehê de dest pê dikin- **Hawarê Îslamî** tevlî tevna romanê û qedera **Meryemayê** dibe. Di talîyê de Hawarê Îslamî yê ku dixwaze Meryemayê vegerîne ser dînê Îslamê dev ji dînê xwe berdide û ji dêlva navê Xwedê û pêxemberan zikir bike, li nexweşxanêyê navê Meryemayê bi lêv dike.

***Parrhesia*** nahêle mirov li tu derê bisitire. Ew der Kurdistan bi xwe be jî. Talîya talî **Meryema** biryarê dide ku derkeve Ewropayê. Lê ji bo wêneyên pasaportê bikşîne diçe studyoyê û li wir rastî serpêhatîya xwe ya dawîn tê. Belê rastî **Kirmanc** tê. **Kirmanc** ji welatê ***Swêdê*** vegeriyaye û hatiye li welatê xwe bi cî bûye. Piştî evîndarîyê mukirhatina





Kirmanc dawîyê li romanê tînê: *"Got, ez nikarim te mehr bikim, ji ber ku ez bi kêrî te nayêm. Ez birîndar im, di şerê birakujîyê de fîşekek li nav lingên min ket û damara mêranîyê qetand!"*

Her ku em çîrokekê ji romanê dixwînin, em dibînin ku pêşmergeyên me mafyatîk, komunîstên me feodal, dîndarên me terkîsela û wênekêşê me jî ji mêranîyê ketiye. Meryema bi hebûna xwe, rika ser takekesîya xwe û tabloya xwe, rûmetên civaka xwarovîçkî bi çavên xwe yên tabloyî radixîne ber çavên me.

Ji dengê Meryemxanê heya rengên tabloyên Meryemayê, derzên civakê dibin qelîştek da ku li zelzeleyên xwe rast bên.

Nivîskar: Sebrî Silêvanî
Çeşn: Roman
Weşanxane: Lîs
Buha: 10 TL
ISBN: 978-88130-9-0




## "Mirina Bêşî"

### AMED KANÎ

Romana ku ji bo Wedat Aydin hatiye diyarî kirin, li ser sêyînîyê ava bûye. Perdeya yekem bi birina Hogir ya ji malê dest pê dike. Hatina sê kesên ku wî ji malê derdixin, ne weke hatinên berê ye, Hogir lê diheyire û berê xwe dide hevjîna xwe Xangulê, ew û Xangulê her du jî dixwazin hestên xwe yên neyînî ji hev veşêrin. Nivîskar jî weka nepenîya wan sê kesan, ji wan re Keledirêj, Kej û Kintir dibêje. Ev sê kes jî Hogir radestî sê kesên din dikin. Yek ji wan sê kesan berpirsîyarê Jîtemê Acem e. Beşa yekem ya Ayê jî bi ji xewrabûna Narînê dest pê dike. Narîn, lehenga duyem ya romanê ye.

**Karakterên Romanê:** Karakterê herî girîng ê romanê Hogir (bi navên din Mîrze, Merwan û Aydın) e. Teknîkeke serkeftî tê bi kar anîn, Hogir di nav şoreşa gelê xwe de bi xortanî tê bi cî kirin. Li Silîva (Farqîn) yê di komeleyekê de cî digre, herdem pêşengekî bi xwe bawer e, ew û Narînê dildarên hev in. Li Farqînê navê wî bi piranî Mîrze ye. Narîn bi xebatên fêrbûna ziman li komelê ku ji layê Mamoste Filît ve ders dihatin dayîn, Mîrze dinase. Roja ***Serê Gulanê*** ku keç û kur li seyrangehê bi azadî hev dibînin û dildarên xwe hildibijêrin, di dîlanê de Cindî dikeve destê Narînê, devê xwe dibe ber guhê wê, dibêje ez ji te hez dikim, bi vê gotinê Narîn tengezar dibe, ji dîlanê dertê, lê, di heman rojê de Mîrze bi nivîseke wiha hestên xwe pêşkêşê wê kiribû: *"Çi gava ez dikevim nav behra hingivînîya çavên te û bi çêj û elesa kana dilê te ditamijim, di kûrayîya wan de tofan li dilê min radibin..."* (r.36). Mîrze, Narîn û Cindî sê karakterên sereke ne. Malbata Narînê birayê wê Nadir, dotmama wê Perîza, pismamê wê Ferman, diya wê û bavê wê di nav feodalîyê de ne, ji metirsîya derdorê ne be, bi feodalî nafikirin. Derdora Narînê keçeke weka Laleş, Seyran, Zêrîn zêde derbas nabin, bes Laleş jî weka dildara Mîrze ye.

**Honana Rûdawê:** Bûyer bi revandina Hogir dest pê dike. Jîyana Hogir wek teknîka paşvegerînê jî têr û tije ji bo vê bûyerê nehatiye honandin. Di perdeya duyem de li Navedêzê di tengeha taybet de îşkenceyên giran li Hogir tên kirin û agahîyeke ensîklopedîk tê dayîn, lê agahî bi bûyerê ve xweş nehatiye honandin…

**Şêwe:** Vegotina çîrokê li ser devê lehengan tê pêşkêş kirin. Vebêjer dema niha jî bi kar tînin. Dibe ku bê gotin çîrok bi gîyanê xwe li ser derd û kula ava buye, lê di Serê Gulanê de teswîr kêm e. Di beşa Gyê ya duwem de û di beşa Byê ya sêyem de li ser bedenan (Kela Amedê û Kela Farqînê) agahîyên ensîklopedîk tên dayîn. Zimanê romanê ne herikbar e, poetîka wê kêm e, wek mînak di tevahîya romanê de, strana ***Ey Bilbilê Dilşad***, du caran tê zimên. Ji bo nivîskarekî ku ferhenga biwêjan amade kiriye, têra xwe çêja biwêjan di pexşanê de ranexistiye.

**Zeman û Mekan:** Roman ji hêla zeman ve bi bûyerên wekî 12ê Îlonê ve hatiye girêdan, yanî têra xwe dem diyar kiriye. Ji hêla mekan ve ji serkeftî ye. Rûdaw li Amed û Farqînê bi agahîyên dîrokî xwe dihone. Tevî ku mijar dîroka nêzîk e jî.

**Cîhana Romanê:** Roman li ser gîyanê leheng Hogir û Narînê ava bûye. Di romanê de niqaşên siyasî, wek helbijartina dirûşman didin xuya kirin ku jîyan bi her layên xwe tê jîyîn. Mîrze kesekî kurdewar e, dixwaze di belavokê de zimanê kurdî jî bê bi kar anîn, lê Cindî jî ji hesûdîya xwe dibêje, "Ka kî yê kurdî fam bike?" yanî ji xelqê dûr ketiye an ji evîna Mîrze û Narînê dibehece, mirov dikare bêje ku her du layên wî jî hene. Lewma tê guman kirin ku muxbîrîya Mîrze jî wî kiriye. Hogir serokê partîyeke kurdan e, ji ber dirûşmên siyasî lê tê gerîn.

**Nasnameya Romanê:** Pirsgirêka nasnameya romanê heye. Li ser çewtîya nasnameyê nivîskar **Omer Dilsoz**, gotarek bi ser navê, *"Zeraq"ê Daye Mirina/Kuştina Bêşî" nivîsî* û di malpera *Diyarnameyê* de weşand. Bi rastî jî weka me li jor jî gotibû, pirsgirêka nasnameyê zêde ye, tenê lehengekî romanê bi çar navan tê pêşkêş kirin. Mirov dikare bêje roman xwe dispêre bûyerên dîroka nêzîk, ew jî dikare bala xwendevanan bikişîne.

## "Kurdên Nejibîrkirinê"

### SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Ji tevahîya nivîsarên wî –çi helbest, çi kurteçîrok, çi pexşan, çi jî şano-kurdistanîbûn û kurdewarîya wî bi awayekî zelal û eşkere xwe dide der. Tevî ku di 5-6 salîya xwe de ji serxetê binxet bûbe jî, heta dawîya temenê xwe devera ku bi neçarî terikandiye bi awayekî zindî daye vejandin. Li Şamê, li Beyrûdê, li Swîsreyê û li Lozanê, heta roja ku serê xwe datîne jî kul, derd, merem û daxwaza wî her serfirazî û serbilindîya gelê kurd bûye.

Kitêba "Kurdên Nejibîrkirinê" vê yekê bi me dide selmandin û portreyeke edebî, hunerî, gelperwerî û civakî ya **Dr. Nûredîn Zaza** pêşkêşî dêhn û bala me dike. Di kitêba navbihurî de, hemû berhemên edebî yên Nûredîn Zaza, yên çapkirî û neçapkirî hatin civandin û di nav weşanên Avesta de derketin.

"***Kurdên Nejibîrkirinê***" hemû nivîsên Nûredîn Zaza, bi taybetî nivîsên wî yên edebî di nav xwe de dinimîne. Xwedî û edîtorê weşanxaneyê **Abdullah Keskin** derbarê xebatê de diyar dike ku hin beş ji nivîsên di kitêbê de, ji arşîva jinebîya Nûredîn, **Gilberte Favre-Zaza**; beşek jê ji nameyên ku wî ji **Kendal Nezan** re şandine û yên din jî ji nivîsên wî yên ku di kovara Hawarê de hatine weşandin, hatine deranîn û amade kirin.

Em hinek bala xwe bidin nivîsarên di kitêbê de. *"Nûredîn Zaza: Çapa kurdî li Ewropa"* ew nivîs e ku wekî pêşgotin ji bo "Hêvîya Welêt, Dengê Komela Xwendekarên Kurd li Ewropayê, hejmar 1-3 hatiye amade kirin. Sala nivîsa ku di rûpela duyem de cih digire, 1976 e.

Di heman kitêbê de bi navê ***Newrozeke Xemgîn, Derketî li her derê bi tenê ye û Newroza 1979*** sê helbest cih digirin. ***Xurşîd, Gulê, Keskesor, Stêrk, Perîşanî, Hevîna Perîxanê, Xatûn an piling, Dê an xwişk, Şerê mêşa û Stêrk*** navên 9 kurteçîrokên di kitêbê de ne. "*Şerê Mêşa*" û "*Stêrk"* ne tê de, tevahîya nivîsan di navbera 1941-1942yê de di ***Hawar***ê de hatine weşandin ku li Şamê derdiket.

Herçî beşê bi navê ***"Kurdên Nejibîrkirinê"*** ye, navê xwe daye kitêbê bixwe jî. Di beşê navbihurî de, di 4 nivîsan de, portreyên 5 navdar, alim û lehengên kurd hatine nivîsandin. **Cemîlê Seyda, Hemze Begê Miksî, Evdirehman Axayê Elîyê Ûnis, Qedrî Can** û **Reşîdê Kurd.** Nûredîn Zaza piranîya van camêr û maqûlên kurdan li Şamê nas dike, têkilîyên baş bi wan re datîne û di dawîyê de jî li ser wan dinivîse.

Hemû portreyên di beşê ***"Kurdên Nejibîrkirinê"*** de, ji hev balkêştir in û xwedîyên agahîyên hêja ne ku em ji wan bêpar in. Bo nimûne di nivîsa **Evdirehman Axayê Elîyê Ûnis** ku mêrxasê *Serhildana Sasonê* ye, em pê dihesin gava ew terkeserê binxetê dibe û tê Şamê 50-55 salî ye, xwendin û nivîsandina wî tuneye, paşê **Osman Sebrî** wî fêrî xwendin û nivîsandina kurdî dike. Demek derbas dibe **Evdirehman Axa** zarokên xwe jî fêr dike û nameyan ji serxetê re dişîne.

**Dr. Nûredîn Zaza** di sala 1919ê de, li Madenê tê dinyayê. Zarokatîya xwe li Bakurê Kurdistanê derbas dike. Piştî 1925ê, ligel kekê xwe **Dr. Ahmed Nafîz** derbasî binxetê dibe. Ligel temenê xwe yê biçûk jî, di rêxistinên kurdî de berpirsîyarîyên girîng werdigire û gelek nivîsên wî di ***Hawar***ê de –bi navê




**Nûredîn Ûsiv-** çap dibin. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, li Swîsreyê bi cih dibe û li ***Zanîngeha Lozanê*** dest bi xwendina bilind dike. Di dema xwendekarîya xwe de, ***Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewropayê*** ava dike. Di sala 1957ê de navberê dide çalakîyên xwe yên Ewropayê û vedigere Sûriyê û ji bo yekîtîya kurdên başûrê-rojavayê Kurdistanê dixebite. Di avakirina ***Partîya Demokrat a Kurdistanê*** (Suriye) de roleke girîng dilîze. Di salên 1960ê de gelek caran tê girtin û di zindanên Sûriyê de dimîne. Di sala 1969ê de vedigere *Lozanê* û li ser zimanê kurdî dixebite. Di sala 1983yê de dibe yek ji damezrînerên ***Enstîtuya Kurdî ya Parîsê*** û berî mirina xwe bi salekê *Mem û Zîna* **Ehmedê Xanî** werdigerîne fransizî. Di sala 1982yê de ***"Ma vie de Kurde***" li Lozanê diweşîne. 7'ê Çileya 1988ê li Lozanê, ji ber nexweşîya pençeşêrê koça xwe ya dawîn dike û xatirê xwe ji me dixwaze.

*Kurdên Nejibîrkirinê, Nûredîn Zaza, Weşanxaneya Avesta, 132 r, kurdî, Stenbol*

www.arsivakurd.org

# Pirtûkên Zarokan

JAN BADA

Gelek beşên pirtûkên zarokan hene. Hin ji wan ji bo perwerdeya dibistanê ne, hin ji wan ji bo xwendin û guhdarîkirinê ne û hin jî, ji bo fêrbûna helwest, rewişt û tevgerê ne. Pirtûkên wêjeyî ji destpêka xwenasîn û têgihîştina zarokan, wan li ser giyana asteke bilind ji bo gihîştinê amade dikin. Wêjeya zarokan ji helbest û metelok heta çîrok û romanan berfireh e.

Wekî din pirtûkên hînbûnê hene ku ji dibistanê heta fêrbûna livbaziyên rojane, ji lîstikan heta naskirina çandên cîhanê yên cûrbicûr, alîkariya zarokan dikin ku di jîyana mezinan de ciyê xwe kifş bikin.

Zarokên kurd, bi taybetî yên **Bakurê Kurdistanê** heta roja me jî, ji dibistanên kurdî bêpar in. Ew ne xwediyên pirtûkên dibistanan, ne jî xwediyên pirtûkên wêjeyî ne. Dezgeheke fermî ya li ser vê bingehê dixebite tuneye. Heta salên dawî pirtûkên zarokan bi zaravê kurmancî tunebûn, ji ber vê sedemê piranîya zarokan, ne xwediyên pirtûkan bûn û xwendin û nivîsandina kurdî jî nizanibûn. Dibistan bi çi zimanî be, zarok jî, wî zimanî fêr dibin; di rewşa zarokên kurd yên **Bakurê Kurdistanê** de zimanê **tirkî** zimanê wan ê xwendin û nivîsandinê bû, ev yek hîn jî berdewam e.

Di civata kurdan de kevneşopîya berhemên devkî xurt e. Zarok ji dê û bavên xwe çîrok, efsane, helbest, fabil û stran, hemû bi devkî guhdarî dikirin û zimanê xwe yê dayikê wisa hîn dibûn. Nifşe bi nifşe ev rewş heta roja îro hat û ev rewş hîn jî serdest e. Deh heta bîst salên dawî ne tê de, wêjevanîya zarokên kurd hemû devkî bû. Dê û bavên ku di metropolan de mezin dibûn, zimanê xwe fêr nedibûn û ji vê kevneşopîya kurdî feyde nedigirtin, nikaribûn vê yekê bidin zarokên xwe jî. Lê di salên dawî de li ser însiyatîvên kesayetîyên kurd, stranbêj, dengbêj, rewşenbîr û nivîskarên kurd gelek çîrok, helbest, stran û metelokên kurdî yên ji bo zarokan hatin berhevkirin û nivîsandin, hin pirtûkên din jî, ji zimanên din hatin wergerandin bo kurdî. Bi vî awayî nivîsandina wêjeya zarokan dest pê kir. Niha hejmarek ne kêm, pirtûkên zarokan ên bi zimanê kurdî hene, li tenişta wan hejmareke berhemên dibistanê jî, ji bo zarokan hatine afirandin.

Wergerên destpêkê yên ku bi taybetî ji **Swêdê** dest pê kiribûn, alîkariyeke baş bû ji bo hezkirên zimanê kurdî; dê û bavên kurdîhez bi xwandina van pirtûkan karibûn zarokên xwe hîn çêtir fêrî kurdî bikin. Bi taybetî pirtûkên bi navê **Rindo** û çendên din ji bo zarokên beriya dibistanê roleke bi kêr anîn holê. Lê ev yek piranî li welatên Ewropa feyde dida zarokan, gelek zarokên li Kurdistanê jê dîsa bêpar bûn.

Niha êdî rê vebûye, gelek weşanxaneyên kurdî pirtûkên zarokan jî dixin bernameya xwe û nivîskarîya kurdî ya pirtûkên zarokan ber bi xurtbûnê ve ye. Ji alîyekî hin pirtûkên dibistanan tên amade kirin, ji aliyê din jî, nivîskarîya wêjevanîya pirtûkên zarokan çêdibe.

Pirsa zarokan tenê bi amadekirina pirtûkan çareser nabe, pirsgirêk li vêderê ne zarok in, lê dê û bav in. Perwerdeya zarokan di bingeha xwe de perwerdeya dê û bavan e. Dê û bav perwerde bibin, zanibin pêwîstîya zarokan ji zayîna wan gelek wêdetir e û gerek ew vê yekê bi xwe hîn bibin û bînin cî, wê demê zarok bi giyaneke bilind, hebûneke tendurust mezin dibin. Perwerde û wêje, perwerde û xwedîkirin û mêzekirina zarokan bi hev girêdayî ye; birçî û tazî nemana zarokan pêwîst e, wezîfeya dê û bavan e, lê têr nake, divê mejî û giyana zarokan jî mijara pirsê be. Têrkirina giyan û gihîştandina mejî, giyaneke azad jî, ji zarokan re pêwîst in ku ew karibin bibin mirovên mezin ên azad û giyanberzên duwarojên xwe.

Rê li ber lêgerîn û lêkolînên zargotina zarokan vekirîye, materyal pir in, teknîk heye; berhevkirin, neqandin û sadekirina wêjevanîya zarokan li benda nivîskarîya kurdî ye. Dê û bav jî di vî beşî de dikarin bibin alîkar. Li her deverên Kurdistanê hîn jî kesên ku gelek çîrok, metelok, lîstik, helbest û stranên zarokan dizanin hene, tomarkirin û nivîsandina van berhemên devkî karekî ne giran e. Di vî warî de malperên înternetê jî dikarin alîkar bin, heta malperek dikare li ser vê bingehê xwe wezîfedar bike û hemû agahîyên ji bo zarokan bicivîne, biweşîne û bigîjîne wan.


Zarok bi xwe jî dikarin pirtûkên ku xwendine û li gor dilê wan e, ji bo wergerê, yan jî belavkirinê pêşniyaz bikin, daku zarokên din jî bixwînin û feyde jê bigirin.




www.arsivakurdi.org

## NAVEROK

TÎRMEH 2011




Encamên hilbijartinên 12ê hezîranê
ISMAIL BEŞIKÇI
▶ R. 1

Hilbijartinên li Tirkiyeyê û piştî wan
RIZA DINÇ
▶ R. 1

Piştî hilbijartinên Tirkiyeyê yên encam ne surprîz
WENDY KRISTIANASEN
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Gelo divê em pareyê deynan bidin?
DAMIEN MILLET Û ERIC TOUSSAINT
▶ R. 5

"Bi xwestina hîvê bila rûyê we sor nebe: Ew e ya ji me re pêwist"
SERGE HALIMI
▶ R. 6

Tevgera bêtevgeran
MAX ROUSSEAU
▶ R. 8

Hunera erebî a hemdem: Ji Charybdeya parêzvanîya dewletî ber bi Scyllaya bazarê ve
YVES GONZALEZ-QUIJANO
▶ R. 9

Serokkomarê îranî li dijî melayan
FARHAN JAHANPOUR
▶ R. 10

Desthilata Îranê serdestîya xwe ya li ser medyayan winda dike
SHERVIN AHMADI
▶ R. 11

Lêkolînerên çînî doza reforman li welatê xwe dikin
SHEN YUAN, GUO YUHUA, JING JUN, SUN LIPING
▶ R. 14

Li Ûgandayê melik, dewlet û erd
ALAIN VICKY
▶ R. 16

Cerahîya wezîfeyê
IBRAHIM AL-KONI
▶ R. 18

Pirrengîya mezin a xirîstîyanên Rojhilat
RUDOLPH EL-KAREH
▶ R. 19

Dema ku benîştê erebî dike ku Amerîka li hev bikeve
GUILLAUME PITRON
▶ R. 20

Bi derbên neşterê jinûve çêkirina dinyayê
MONA CHOLLET
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23


## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB